




## Memozîn



**EHMEDÊ XANÎ**  
**Memozîn**

Transkripsiyon  
**ARIF ZÊREVAN**

Aras  
Hewlêr  
2007

## Ehmedê Xanî: Memozîn

Weşanxane: Aras  
Şeqamî Gulan  
Hewlêr – Kurdistan

Çapxane: Aras

[www.nefel.com](http://www.nefel.com)  
[info@nefel.com](mailto:info@nefel.com)

© Arif Zêrevan

Çapa yekê: 2007

Çapa dîjîtal: 2004




Grafîka pirtûkê: Nefel




Ev çapa »Memosîna« Ehmedê Xanî  
bi hevkariya Nefelê û Arasê hatiye amade kirin.

Bêyî destûreka nivîskî ti kes nikare vê pirtûkê ji nû ve  
bi ti awayî çap bike, kopî bike yan li ber wê zêde bike.

Çênabe ko ti kes fayla vê pirtûkê kopî bike  
û di Internetê de bêxe malpera xwe.

*Ji bo herdu milyaketên min  
Lara, Lava û Bînahiya çehvan*  
**Arif Zêrevan**





## Nêverok

---

Pêşgotin ..... 9

1. Sernameyê name, namê Ellah ..... 23
2. Ey şukrê te cewhera zebanî ..... 27
3. Eşya bi heseb delîl û burhan ..... 33
4. Ey wasîteyê wucûdê kewneyn ..... 40
5. Saqî tu ji bo Xwidê kerem ke ..... 43
6. Xanî ji kemal-i bêkemalî ..... 48
7. Saqî bike cam-i asimanî ..... 53
8. Neqqaşê şehîfeyê hikayet ..... 61
9. Hindî ko di qeyşerê di dinya ..... 68
10. Da bêne bi ser hikayeta piş ..... 70
11. Xellaqê cihan ji feyqê fiştret ..... 73
12. Dewra felekê ji bextê feyrûz ..... 76
13. Qendîlê munîrê dêrê ezreq ..... 78
14. Wan herdu kurê di came tebdîl ..... 80
15. Ew dûxteçesh herdu şahîn ..... 87
16. Ew jî vegerin bi wî libasî ..... 92
17. Dayîn hîeyirî ji macerayê ..... 97
18. Wê delleyê bêfeşal û muhtal ..... 101
19. Ew warisê ‘ilmê daniyalî ..... 103
20. Bîmarê bi derdê işqê bedhal ..... 108
21. Ew herdu nihalê ‘er’era şeng ..... 111
22. Xweş weqt e ji bo ‘elîlê müştaq ..... 115
23. Weqtê weko nû‘erûsê Xwîşid ..... 123
24. Daman-i ‘erûsê pakê gerdûn ..... 131
25. Zava bi edeb ko çû ji der dan ..... 135
26. Gava ji ‘edem Xwidê kir îcad ..... 140
27. Tacdîn û Sitî ko bûn bi hev şad ..... 148

28. K'ey hemnefesê di bênewayan .....	154
29. K'ey rûh û rewanê qelbê Zînê .....	156
30. Dem şemi <sup>c</sup> dikir ji bo xwe demsaz .....	158
31. Perwa nedikir bi ateşê xem .....	160
32. Mem jî ji xeyal-i rûyê dildar .....	162
33. K'ey şubhetê eşk-i min rewane .....	164
34. Geh behîş dikir digel şebayê .....	166
35. Geh ceng dikir digel dilê jar .....	169
36. Şeyyadê şikar-i hûsn-i exbar .....	175
37. Başek we hebû Emîr Zeydîn .....	179
38. Ew ahûyê şeydgah-i wehşet .....	181
39. Herçî bibitin ji xêr eger şer .....	186
40. Saqî mi bigir ko ez bi dest im .....	192
41. Tacdîn fekirî ko bezme boş e .....	197
42. Sultanê wilayet-i mehebbet .....	201
43. Salarê mewakibê kewakib .....	205
44. Mihra felekê ezel 'edîm e .....	212
45. Zîna ko bi derdê hecrê xemgîn .....	218
46. Eczayê kitabê 'îşqibazî .....	223
47. Serşubhe, ko şehsiwarê efleq .....	227
48. Teqrîr-i ko kir temamî qaşid .....	230
49. Evarê ko asimanî menqel .....	234
50. Tedbîrkunende pîrê 'aqil .....	238
51. Zînê ko nimane wan keramat .....	246
52. Zînê kobihîstin ev tekellum .....	253
53. Ew matemiyê ko baxeber bû .....	262
54. Weqtê weko çûne ser mezaran .....	266
55. El-qışşe şehîdê 'îşq-i cellad .....	269
56. Hikmet ew e ew ji darê dunya .....	277
57. Agah ji ھalê dewrê eyyam .....	279
58. Ey mustemi <sup>c</sup> ê mişal û teswîl .....	285
59. Saqî were bêje mîn ci lewn e .....	288
60. Ey rakibê waqi <sup>c</sup> ê peyade .....	297

## »Memozîna« Ehmedê Xanî

Mîrê kirmanciya modern mîr Celadet Alî Bedir-Xan ji bo Ehmedê Xanî dibêje ew ne tenê pêxember e, lê belê ew xudankitêb e jî. Pêxemberê ola kurdan ya nijadî û neteweyî, û xudanê kitêba »Memozînê«.

Ev pesnekê payebilind e û kurd »Memozînê« wekî qur'aneka kurde-wariyê datînin ber serê xwe û heta hinek kurd û oryentalîst dibêjin fikra dewleta neteweyî û neteweperestiyê berî ko li Ewropayê belav bibe li nik Ehmedê Xanî pir vekirî hebû.

### Jiyan û eserên Ehmedê Xanî

Di heqê çêbûna Ehmedê Xanî de qenaeteka hevbeş heye ko ew sala 1061-ê hicrî (1650–51-ê mîladî) hatiye dinyayê ji ber Ehmedê Xanî bi xwe di »Memozînê« de dinivîsîne:

Lewra ko dema ji ҳeybê fek bû  
Tarîx hezar û şêst û yek bû

Îsal gihişte çill û çaran  
Wî pêşrewê gunahikaran

Ji beyta didoyê diyar dibe ko Ehmedê Xanî »Memozîn« di 44-saliya xwe de xelas kiriye ko dibe 1105-ê hicrî û mîladiya wê jî dibe 1693–94. Ehmedê Xanî kengê miriye ne diyar e û heta niho ti belgeyên piştrast ji bo tarîxa mirina wî nînin. Lê belê Elaedîn Secadî di kitêba xwe »Mêjûy edebî kurdi« de dinivîsîne ko Ehmedê Xanî sala 1118-ê hicrî miriye û ew jî dibe 1706–07-ê mîladî.

Ehmedê Xanî behsa roj û meha çêbûna xwe nekiriye û herwiha behsa roj û meha temamkirina nivîsandina »Memozînê« jî nekiriye. Vêca gava ko mirov sala 1061-ê hicrî vediguhere bo mîladî bersiv dibe 1650 û gava ko mirov sala 1105-ê hicrî jî vediguhere bo mîladî bersiv dibe 1693. Hinek kes dibêjin ji ber ko ji sala 1061-ê hicrî tenê hefteyek dikeve ber sala 1650-yê mîladî hingê baştir e ko mirov bihesibîne ko Ehmedê Xanî

sala 1651-ê mîladî hatiye dinyayê. Bi baweriya min ev hesabekê şas e û mimkin e ko Ehmedê Xanî di hefteya yekê ya 1061-ê hicrî de çêbûbe û ew jî dikeve hemberî 1650-yê mîladî. Ji ber hindê jî pêwist nake ko em behsa rojan û hefteyan bikin û divêt em tenê xwe bispêrin salan û hingê jî sala çêbûna Ehmedê Xanî bi mîladî dibe 1650, sala temamkirina nivîsandina »Memozînê« dibe 1693 û sala mirina wî jî dibe 1706. Ji bo zelalkirina ferqa di nêvbera salên hicrî û mîladî de ez dê şes tarîxan li vê derê binivîsînim da xwendevan baştir problemê fêm bikin.

#### I. Sala çêbûna Ehmedê Xanî

hicrî	mîladî
1/1 1061	24/12 1650
30/12 1061	14/12 1651

#### II. Sala temamkirina nivîsandina »Memozînê«

hicrî	mîladî
1/1 1105	2/9 1693
30/12 1105	22/8 1694

#### III. Sala mirina Ehmedê Xanî

hicrî	mîladî
1/1 1118	14/4 1706
30/12 1118	4/4 1707

Ehmedê Xanî, her cardî li gor piraniya serkaniyan, ji devera Hekariyan e û xelkê eşîra xaniyan e. Ji ber nisbeta xwe ya bi eşîra xaniyan ve nasnavê xwe kiriye »Xanî«. Hinek kes dibêjin navê gundê wî jî »Xan« bûye û jê re dibêjin »Xana sê gundan«. Di zimanê kurdî de navên hemî eşîran bi parkîta »an«-ê xelas dabin û ji ber hindê heger rayeka bêjeyê »xan« jî be navê eşîrê »xaniyan« e. Bo nimûne ji mirovekê bi ser eşîra »botan«, »beh-dînan«, »zêbariyan« û »barzaniyan« ve mirov dibêje »botî«, »behdînî«, »zêbarî« û »barzanî«. Vêca heger Ehmedê Xanî ji eşîra xaniyan be yan jî ji devera Xaniyan (cihê ko eşîr lê dijît) be, di herdu rewşan de jî divêt paşnavê wî bibe Xanî ko nisbeta wî bi eşîrê yan bi cihê eşîrê ve diyar dike.

Ehmedê Xanî li bajarê Cizîrê jiyyate û wî jî wekî melayên dema xwe û melayên piştî xwe di berhemên xwe yên nivîskî de – îstisna ne tê de – de-

voka Botan bi kar ankiye. Mele Mehmûdê Bayezîdî jî herçend serhedî bû di tekstên xwe de devoka Botan bi kar ankiye ji ber zimanê kurdî yê edebî bi wê devokê dihat nivîsandin.

Çar berhemên naskirî yên Ehmedê Xanî hene: 1) *Memozin*, 2) *Nûbihara biçûkan*, 3) *Eqîda îmanê* û 4) *Eqîdeya îslamê*. Ji bilî van herçar berheman bi rîya Mele Mehmûdê Bayezîdî û Alexander Jabayî dor 25 helbestên Ehmedê Xanî hene ko li S:t Petersburgê, li Rûsyayê, hatine parastin. Celadet Alî Bedir-Xan di »Hawarê« de dinivîsîne ko kitêbeka Ehmedê Xanî ya li ser coxrafayê jî heye lê belê wî ew nedîtiye.

#### **Navê kitêba Ehmedê Xanî »Memosîn« e**

Heta niho piraniya kurdan, ez bi xwe jî di nêv de, navê kitêba Ehmedê Xanî xelet dinivîsînin. Celadet Alî Bedir-Xanî sala 1942-yê di »Hawarê« de (hjm. 45) behsa navê kitêba Ehmedê Xanî kiriye û nivîsandiye ko navê wê »Memosîn« e, û ne »Mem û Zîn« e:

»Ji esera Xanî re *Memosîn* dibêjin. Ev gotin ji du bêjeyan bihevketî ye. Mem û Zîn; navê qehremanên çîrokê. Lê melayêن kurdan ew xistine şikilê *Memosîn* û iro jê re ji »Mem û Zîn« bêtir »Memosîn« tête gotin.«

Sebeba vê xeletiya berbilav ew e ko di çîrokêن piraniya miletan de, ko ji navê du kesan pêk têن, navê berhemê û yê herdu qehremanêن sereke yên berhemê wekî êk têne nivîsandin. Bo nimûne »Ferhad û Şîrîn«, »Leyla û Mecnûn« û hwd. Ez bawer dikim her bi vê mantiqê piraniya kurdan jî navê kitêba Ehmedê Xanî wekî »Mem û Zîn« dinivîsînin. Rastiya wê ew e ko »Mem« û »Zîn« du qehremanêن çîroka »Memê Alan« in û di heman demê de du qehremanêن kitêba Ehmedê Xanî »Memosînê« ne. Navê çîroka folklorîk jî »Memê Alan« e û ne »Mem û Zîn« e. Wekî ko Celadet Alî Bedir-Xan jî dibêje hemî melayêن kurdan navê kitêba Ehmedê Xanî bi awayê »Memosîn« bi lêv dikan û çawa Ehmedê Xanî ji çîroka folklorîk ya kurdî berhemeka xweser afirandiye wisa jî navekê xweser ji bo berhemâ xwe afirandiye ko »Memosîn« e.

#### **Ferqa di nêvbera »ko«, »ku« û »kû« de**

Di »Memosînê« de û herwiha di zimanê kurdî de sê bêje hene ko bi alfabeşa erebî ji hev nayêن vavêr kirin û hemî jî bi »kaf« û »wawê« yanî wekî

»kw« têne nivîsandin. Ev hersê bêje hem dengên wan ji hev cida ne û hem jî maneyên wan ji hev cida ne ji ber hindê jî damezirênerê alfabeşa kurdî ya latînî Celadet Alî Bedir-Xanî sê herfêن cida ji wan sê dengên cida re payda kirine û ew ji hev vavêr kirine. Piştî mirina Celadet Alî Bedir-Xanî hinek kurdêن ko bi alfabeşa latînî dinivîsin ferqa di nêvbera gihaneka »ko« û hokera »ku« de nedîtin û herduyan jî wekî »ku« dinivîsin.

Ez dê berê behsa maneyên van bêjeyan yêن cida bikim û ji »Memozînî« nimûneyan bidim:

ko: heger      ku: çi, çawa      kû: kîjan dever

Yê ko alfabeşa kurdî ya latînî amade kiriye û dengên kurdî li wan herfan siwar kiriye Celadet Alî Bedir-Xan e. Wî ji bo gihaneka »ko«-yê herfa »o« bi kar anîye û bi zanebûn »u« bi kar neaniye û »Hawar« hemî bi wî awayî derxistiye. Herçî »ku« ye ew bêjeyeka serbixwe ye û maneya wê yekcar ci-da ye. Ev bêje li devera Hekariyan û Goyan pir belav e û di cihê »çi« û »çawa« de têt bi kar anîn û Ehmedê Xanî jî ew bêje gelek caran di »Memozînê« de bi kar anîye:

We zû şemirand ji bo çi sersal  
Hon rast bibêن ku [çi, çawa] bûye ehwal?

Hon bêjine min ku [çi] bû qediyye?  
Kengê li me xef dibit xebiyye

Mecnûn ko [heger] nebit ¨edîlê Leylê  
Leylê ku [çawa] dikit bi Leyl meylê?

Go ez ku [çi] bibêm bike tu bawer  
Dawer bi mi ra ko [heger] bûye yawer

Em dê ku [çawa] heqîqetê ¨eyan kin?  
Serrişteyê tuhmetê beyan kin

Ger fewt bikim cemî ¨erdan  
Tacdîn ku [çawa] didim ji dest xwe erzan?

Jixwe minaqeşe li ser »kû« nîne ji ber ko hemî kes dizane wê kusan (çawa) bi kar bîne lê belê cardî jî ez dê nimûneyekê ji »Memozînê« binivîsînim.

Wan go tu ji kû ve tê, çi pîr î  
Xalib tu ji ̄ilmekê xebîr î

Piştî gelek lêpirsînan jî min nezaniya ka çima kurdên bakur piştî mirina Celadet Alî Bedir-Xanî gihaneka »ko« guhortin û kirin »ku«. Texmîna min ew e ko kurdên bakur ji tesîra »o«-ya qelew ya tirkî rabûn û »ko« wekî »ku« nivîsîn da wê wekî »o«-ya tirkî qelew bi lêv nekin. Heger wisa be ew sebebekê bêbingeh e ji ber herfa kurdî »i« jî wekî herfa tirkî »i« tête nivîsandin lê belê dengê wan ji hev cida ne.

Vêca ji ber maneyêن cida û ji ber denganiya cida ya hersê bêjeyêن kurdî divêt ew wekî »ko«, »ku« û »kû« bêne nivîsandin. Ez jî hem di nivîsar û berhemêن xwe de û hem di berhemêن ko ez amade dikim de xwe dis-pêrim metoda Celadet Alî Bedir-Xanî û wekî wî dikim.

### **Transkrîpsiyona nû**

Celadet Alî Bedir-Xanî sala 1942-yê di »Hawarê« de (hjm. 45) dest pê kir û 16 beş ji »Memozînê« bi alfabeşa latînî belav kir. Mihemed Emîn Bozarslanî jî sala 1968-ê »Memozîn« bi alfabeşa latînî û wergera wê ya bi zimanê tirkî belav kir. Di wê transkrîpsiyona Mihemed Emîn Bozarslanî de kêmasiyêن vekîte û kêmasiyêن xeletfêmkirina teksta orjînal bêhesab in. Mihemed Emîn Bozarslanî sala 1995-ê »Memozîn« bi transkrîpsi-yoneka nû û wergera kurdiya nû careka dî belav kir. Transkrîpsiyona wî ya 1995-ê gelekê ji ya 1968-ê serasttir e lê belê cardî jî ji kêmasiyan ne berî ye ji ber hem ew devoka Botan û Hekariyayê baş nizane û hem jî wî her-fêن trasnkîpsiyonê ji bo nivîsandina dengê erebî bi kar neanîne.

Bi vê transkrîpsiyona nû min xwest, heta ko ji min bêt, bi hevkariya melayêن botî û kesêن erebîzan, transkrîpsiyoneka serast bi alfabeşa latînî amade bikim da xwendevan gava ko »Memozînê« dixwînin wê rast fêm bikin yan jî bi kêmayî wê rast bixwînin.

Ji bo rastxwendina »Memozînê« jî qenaetek bi min re çêbûye ko alfabeşîn kurdî yêن ko iro hene têra rastnivîsandina »Memozînê« nakin. Lewra jî min ji bilî herfêن normal yêن alfabeşa kurdî-latînî hinek herfêن transkrîpsiyona erebî bi kar anîn. Di bin sernivîseka xweser de ez dê

hinekê berfirehtir behsa problemên alfabeyên kurdî bikim.

Bikarneanîna herfîn transkrîpsiyonê wisa dike ko xwendevan hinek bêjeyên erebî û kurdî tevlihev dike, ji ber herf û wêneyên bêjeyan dîbin wekî hev û xwendevan dikare bêjeyeka erebî wekî bêjeyeka kurdî fêm bike ko yekcar xelet e. Çend nimûne:

Herçî te divê bibî *delalê* [ne delalê]  
Pabend dikî bi zulf û xalê

Insan bi xwe hem *zelam* [ne zelam] e hem nûr  
Adem ji te hem qerîb e hem dûr

Ew rehmet-i cumle <sup>‘</sup>alemîn bû  
Adem di meyan-i ma <sup>‘</sup>û *tîn* [ne tîn] bû

Bêjeya »delal = jirêderketin«, »zelam = tarîtî« û »tîn = herî« heger bi herfîn transkrîpsiyonê neyên nivîsandin xwendevan dikare wan wekî bêjeyen kurdî »delal«, »zelam« û »tîn« fêm bike.

Min metnê transkrîpsiyonâ nû ya »Memozînê« li ser metnê »Memozîna« çapa Stenbolê ya sala 1919-ê ava kir. »Memozîn« wekî kitêb cara pêşiyê hingê hatiye çap kirin û belav kirin lê belê gelek destnivîsên wê yên cida hene. Ev çapa Stenbolê jî ji ber destnivîseka ji sala 1165-ê hicrî (1751-ê mîladî) hatiye nivîsandin. Xweseriyeka »Memozînê« jî ew e ko di destnivîsên cida de ferqên mezin wekî yên di »Dîwana« Melayê Cizîrî de nînin. Yek ji sebebên wê jî ew e ko »Memozîn« hem nûtir e û hem jî fêmkirina tekst û bûyerên teksta wê hêsanîtir e.

Min pêşiyê metnê »Memozînê« ji alfabeşa erebî transkrîbe kir bo alfabeşa latînî. Paşê jî ez û Selam Niman, mamostayê zimanê erebî, bi hev re careka dî bi ser de çûn û me ew serast kir. Sala 1998-ê jî ez çûm Kurdistanê û min pirsî ka kîjan mela heye ko »Memozînê« baş fêm bike û bizane serast bixwîne.

Piştî gelek lêpirsînan min Mele Evdilkerîmê cizîrî peyda kir. Mele Evdilkerîmî hem farisî dizanî û hem jî erebî û osmanî dizanî. Mele Evdilkerîm niho 76-salî ye û şexên mala Şêx Seydayî jî got ti kes ji Mele Evdilkerîmî baştir nizane »Memozînê« serast fêm bike û bixwîne.

Min û Mele Evdilkerîmî me li hev kir û min gotê ez dê »Memozînê« hemiyê bi dengê bilind ji te re bixwînim û tu jî ji teksta wê ya erebî bixwîne û guhê xwe bide transkrîpsiyyona min. Min xwend û wî guhê xwe dayê û cihêن xelet li min da serast kirin. Ji wan xeletiyêن ko wî li min da serast kirin herî pir keyfa min ji bêjeyekê re hat ko têkiliya wê bi Bekoyî re heye yan jî bi Bekirî re heye wekî ko di »Memozînê« de derbas dibe. Ew bêje bi alfabeşa erebî bi sê herfan têt nivîsandin ko »bkr« ye. Ehmedê Xanî ji Xwedê re dibêje herçî kesê ko tu bixwazî bînî ser rîya rast Bekirî jê re bike arîkar. Jixwe li gor felsefeya Ehmedê Xanî, Beko jî diçe behestê lewra ko ew jî di eslê xwe de xêrxwazê Memo û Zînê ye.

Herçî ko tu bînî ser hîdayet  
Vê ra Bekirî bikî  inayet

Heta niho di hemî transkrîpsiyon û wergeran de ev bêje wekî »bigirî« hatiye fêm kirin ko hem maneya wê ne rast e û hem jî rîzimana wê ne rast e. Heta niho ev herdu rîzêن li jorê wiha hatine fêm kirin û wergerandin:

Herçî ko tu bînî ser hîdayet  
Vê ra bigirî bikî  inayet

Nivîsandina lêkera »bigirî« û »bikî« wiha li dûv hev ji aliyê gramerê ve xelet e û ji aliyê semantîkê ve jî ti maneya wê nîne. Li gor semantîka rîzê divêt Xwedê bi hevkariya yekî arîkariya kesê sêyê bike. Lî belê ya rast jî ew e ko Xwedê Bekirî dike arîkarê Memo û Zînê, neko Xwedê bi xwe jî dibe arîkarê wan. Di teksta çapa Stenbolê ya 1919-ê de jî »bkr« heye û herfa »g« di wê bêjeyê de nîne.

### Sernivîsên beşan

»Memozîn« ji 60 beşan pêk têt û herçend bi nezim jî hatibe nivîsandin ne helbestêن cida ne û hemî bi hev re wekî çirokeka yekgirtî ye: yanî ji niqteyekê dest pê dike û li niqteyekê xelas dibe. Bi ihtimaleka gelekê mezin beşen cida yêن »Memozînê« sernivîs nînin lê belê di destnivîsa ko çapa Stenbolê ji ber hatiye nivîsandin de hinek sernivîs ji bo beşan hatine bi kar anîn ko Celadet Alî Bedir-Xan gumanê jê dike û dibêje:

»Li ser qesîdeyên *Memozînê* li şûna sernamê çend xêzik nesir hene. Ew xêzik Xanî bi xwe nivîsandine an hinê din piştre ew bi ser ve zêde kirine em pê nizanin. Herçi jî hebe ew nesir ne rast in, Islûba wan ne kurmancî ne farisî ne jî erebî ye. Ew nivîsar ji her du islûban der, ne nezim û ne jî nesir in (Celadet Alî Bedir-Xan (1942), »*Memozîn*«, *Hawar*, hjm. 45).«

Vêca her ji ber vê gumana xurt ya Celadet Alî Bedir-Xanî ez rêza yekê ya her beşekê dikim sernivîs ji wê beşê re û »*Memozînê*« wisa belav dikim. »*Memozînê*« qet sernivîs nebin jî çêdibe ji ber nîşankirina beşan bi reqeman tenê jî bes e.

### Ravekirina ïzafeyê

Di »*Memozînê*« de Ehmedê Xanî ji bo weznê »ïzafe« bi kar anîye û ew jî di alfabeşa erebî de nayêt nivîsandin. »ïzafe« li gor zimanê kurdî hinek caran di cihê vegetandekê de û hinek caran jî di cihê tewangê de hatiye bi kar anîn. Melayên kurdan gava ko »*Memozînê*« dixwînin »ïzafeyê« li gor zimanê kurdî serast dixwînin û wê, dema ko vegetandek be dikin »a« yan »ê« û gava ko tewang jî be dikin »î« yan »ê«.

Rasttranskrîbekirina »ïzafeyê« belayeka mezin e û ji ber ko Ehmedê Xanî jî ne sax e mirov ti caran nikare ji sedê sed piştrast be ka mirov dê wê çawa transkrîbe bike. Heger zayenda navdêrekê mê be divêt »ïzafeya« wê bibe »a« û heger zayenda navdêrekê nêr be divêt ïzafeya wê bibe »ê«. Vêca hinek navdêr hene ko kurd zayendêن jihevcida bo wan bi kar tînin. Ehmedê Xanî »*Memozîn*« – îstisna ne tê de– devoka Botan bi kar anîye û min jî zayenda navdêran li gor devoka botiyan hesiband û vegetandek û tewangên wan jî wisa nivîsîn.

Li cihêن ko »ïzafe« tenê ji bo weznê hatibe bi kar anîn û ew ne cihgira vegetandek yan tewangê be min »ïzafe« bi »i«-yê nivîsiye û bendikek (-) daniye pêşıya wê, ji ber ko »ïzafe« cihê dengê »i«-yê digire. Bo nimûne:

Rûm û 'ereb û 'ecem di ferman  
Meşhûr-i bi navê Mîrê Buhtan

Herçend-i kirin libas-i tebdîl  
Emma nedibûn ji ھalî teھwîl

### Alfabeya transkrîpsiyonê

Alfabeya kurdî-latînî ji 31 herfan pêk têt û di tabela li jêrê de mi‘adilên wan bi alfabe kurdî-erebî hatine nivîsandin. Ew herfîn erebî ko di alfabe latînî de nînin jî bi herfîn transkrîpsiyonê hatine nivîsandin.

kurdî	erebî		kurdî	erebî		kurdî	erebî
a	ا		î	ى		s	س
b	ب		j	ژ		ş	ش
c	ج		k	ک		t	ت
ç	چ		l	ل		u	و
d	د		m	م		û	و
e	ه		n	ن		v	ف
ê	ئ		o	و		w	و
f	ف		p	پ		x	خ
g	گ		q	ق		y	ي
h	ه		r	ر		z	ز
i	-						
Ekstra							
ـ	ـ		ـ	ـ		ـ	ـ
ş	ش		ş	ص		ż	ظ
h	ح		đ	ض		c	ع
ż	ڏ		ť	ط		خ	غ

»Memozîna« Ehmedê Xanî heta niho bi alfabe û vekîteka serast ne-hatiye nivîsandin û alfabe kurdî-erebî ko kurd bi kar jî tînin têra rastnivîsandina »Memozînê« nakin.

Alfabeya erebî problemên mezin di vekîte de derdixe û ti caran rê nade ko mirov kurdî li gor hêmanên gramera kurdî serast binivîsîne. Bi alfabe kurdî-erebî lêker, rengdêr û daçekê kurdî serast nayê nivîsandin û ew jî seqetiyeka pir mezin e. Gelek dengê cida yên kurdî di alfabe kurdî-erebî de nînin yan jî du-sê deng bi yek herfîn têr nivîsandin.

Nebûna girdek û hûrekan jî wisa dike ko bi alfabe kurdî-erebî yan kurdî-

erebî mirov nikare navêx wxeser û navêx cih û welatan ji bêjeyên normal cida bike ji ber herdu jî wekî hev têx nivîsandin. Bo nimûne heger em binivîsinin »ew azad e« gelo em dê çawa bizanin ka mebesta me kesek e ko navê wî Azad e yan jî mebesta me kesek e ko ew bi xwe »azad« e, yanî serbest e.

Ji bo diyarkirina problema vekîte ez dê li vê derê tenê hinek nimûneyan bidim. Ez dê pêşiyê li gor vekîta latînî ya serast binivîsinim û paşê jî her cardî bi alfabeaya latînî lê belê li gor vekîta erebî binivîsinim.

### Nimûne 1

Vekîta rast li gor alfabeaya latînî

Saqî tu ji bo Xwidê kerem ke  
Yek cur'e êmey di cam-i Cem ke

Vekîta xelet li gor alfabeaya erebî

saqî tujibo xwidê keremke  
yek cur'e êmey dicam-i cemke

### Nimûne 2

Vekîta rast li gor alfabeaya latînî

Sersal ko bû ji nû ve me'mûr  
Mîr daye gerê di taze destûr

Vekîta xelet li gor alfabeaya erebî

sersal kobû jinûve me'mûr  
mîrdaye gerê ditaze destûr

Di zimanê kurdî de bêjeyên »tujibo«, »dicam« û »cemke« nînin û vekîta li gor alfabeaya erebî van bêjeyan di kurdiyê de çêdike ko ti bingehê gramerê jê re nîne. Di nimûneya didoyê de »Mîr daye« li gor vekîta bi zimanê erebî bûye »mîrdaye« û hêdî mirov nizane ka pronav ci ye û lêker ci ye. Herdu bi hev re bûne yek bêje ko ti menaya wê nîne.

Di alfabeşa erebî de 12 herfên kurdî (ç, e, ê, g, i, î, j, o, p, u, û, v) nînin. Yanî ji sedê sihê dengê kurdî bi alfabeşa erebî ya normal nikarin bêñ nivîsandin. Farisan ji bo zimanê xwe hinek herf li alfabeşa erebî zêde kirine û ew jî têra kurdîyê nakin.

Li başûr û rojhilate Kurdistanê kurdan alfabeyska erebî ya modifiyekirî amade kirîye lê belê di alfabeşa kurdî-erebî de jî vêca şes herfên erebî (ش، ذ، ظ، ط، ض، ص) nînin û ji ber hindê mirov nikare »Memozînê« bi alfabeşa kurdî-erebî tenê jî binivîsîne. Probleme ka pir mezin ya alfabeşa kurdî-erebî jî ew e ko herfa »i« di wê de nîne û herwiha di alfabeşa kurdî-erebî de sê herfên kurdî (u, û, w) bi yek herfa erebî, yanî bi »wawê, (و)« têne nivîsandin û du herfên dî jî (î, y) bi yek herfa erebî, yanî bi »yayê, (ي)« têne nivîsandin. Mirov nikare kurdî bi vekîteka serast bi alfabeşa kurdî-erebî binivîsîne ji ber ko alfabeşa erebî yan kurdî-erebî rê nade ko mirov bêjeyan li gor hêmanê gramera kurdî vebikîte.

Hejar Mukriyanî (Ebdurehmanê kurê Hacî Mele Mihemed) di pêşgotina werger û şerha »Memozînê« ya bi zaravayê soranî de behsa nere-wabûna alfabeşa kurdî-latînî ji bo kitêbên klasîkên kurdî dike û dibêje ji ber nebûna hinek herfên erebî di alfabeşa kurdî-latînî de divêt mirov »Memozînê«, »Dîwana« Melayê Cizîrî û kitêbên wekî wan bi alfabeşa kurdî-latînî nenivîsîne, û heger mirov binivîsîne jî divêt mirov ji herfên erebî re hinek nîşanan peyda bike.

Carekê ev problem ne ya alfabeşa kurdî-latînî tenê ye. Wekî ko min li jorê gotî di alfabeşa kurdî-erebî de jî şes herfên erebî nînin û Hejar Mukriyanî ji bo rastnivîsandina »Memozînê« ew şes herf bi kar anîne. Bi herfên transkrîpsiyonê em dikarin di alfabeşa kurdî-latînî de problema herfên erebî yên ekstra çareser bikin lê belê bi alfabeşa kurdî-erebî mirov ti caran nikare problema vekîtê çareser bike û ji ber hindê ne mimkin e ko »Memozîn« bi alfabeşa kurdî-erebî serast bêt nivîsandin, herçend mirov wan şes herfên erebî bi kar bîne jî.

Di destê me de ma alfabeşa kurdî-latînî ko alfabeşa herî kamil e bo zimanê kurdî. Lê belê ji ber ko di »Memozînê« de gelek bêjeyen erebî hâtine bi kar anîn û ew bêje divêt li gor denganiya zimanê erebî bêne nivîsandin hingê pêwistiya me bi hinek herfên erebiyê jî çêdibe û em dikarin wan herfan bi herfên latînî yên transkrîpsiyonê binivîsînin. Herfên transkrîpsiyonê jî bi danîna hinek nîşanan li binê hinek herfên latînî yên normal çêdibe.

Vêca heger em »Memozînê« bi alfabeşa kurdî-latînî û bi arîkariya van herfêن transkrîpsiyonê binivîsînin, hingê em hem dikarin hemî dengêن alfabeşa kurdî û hemî dengêن alfabeşa erebî serast binivîsînin û hem ji em dikarin vekîteka serast bi kar bînin û bêjeyan serast ji hev cida yan bi hev ve binivîsînin.

Li vê derê armanca min ne ew e ko em hinek herfêن nû li alfabeşa kurdî ya latînî zêde bikin û wê bikin standardek. Ez vê bikaranînî tenê ji bo rastfêmkirina klasîkêن kurdî pêwist dibînim û lewra ji min »Memozîn« bi du versiyonêن cida amade kiriye: versiyonek bi alfabeşa transkrîpsiyonê û versiyona dî bi alfabeşa kurdî-latînî.

### **Spasî**

Berî ko ez vê pêşgotinê xelas bikim divêt ez spasiya hemî wan kesan bikim ko arîkariya min kirin, dema xwe dan min û nêrînêن xwe ji min re gotin.




Pir spas ji bo seyda Mele Evdilkerîmî, Selam Nimanî û hemî wan kesên ko min navêن wan li vê derê nenivîsîne.

Ev transkrîpsiyonâ nû ya »Memozînê« berhema min e û tenê Xwedê ji kêmasiyan berî ye. Ji hemî kêmasiyêن vê transkrîpsiyonê ez berpirs im û ne ti kesên dî.

Stockholm, 15-ê gulana 2007-ê

**Arif Zêrevan**

Memozin



### **1. Sernameyê name, namê Ellah**

Sernameyê name, namê Ellah  
Bê namê wî natemam e wellah

Ey meṭle<sup>c</sup>ê ḥusnê <sup>c</sup>işqibazî  
Meḥbûbê ḥeqîqî û mecazî

Namê te ye lewહê nameya <sup>c</sup>işq  
Ismê te ye neqşê xameya <sup>c</sup>işq

Bê neqşê te, neqşê xame xam e  
Bê namê te, name natemam e

Namê te ye şahibeytê meqşûd  
Fihristê mukatebatê mehmûd

Međmûnê muraselatê la-reyb  
Meşhûdê mukaşefatê bi-l-χeyb

Meḥbûbê qulûbê men lehu l-qelb  
Qelban tu dikî bi ba xwe ve celb

Me<sup>c</sup>şûq tu yî, bi fexr û naz î  
<sup>c</sup>Aşıq tu yî, lêk bêniyaz î

Muṭleq tu mufîd û mustefad î  
Bêşubhe murîd û hem murad î

Nûr î tu di ھusn-i rûyê dildar  
Nar î tu di qelbê ھasiqê zar

Şem<sup>c</sup> î, ne ji qismê nûr û nar î  
Şems î, ji ھeyan tu perdedar î

Genc î tu di nêv ھilismê ھalem  
Kenz î tu ھeyan ji ismê adem

Ev ھalem û ademî û meşhûd  
Ev mumkin û masiwayê mewcûd

Hemîyan bi te ye mudare û debr  
Feyyađê riyađê xelq û we-l-emr

Emrê te bi lefzê »kun« du ھalem  
Mewcûd kirin, xered çi adem

Adem bi xwe yek ji herdiwan e  
Yek ھerf e ji emrê »kun« fe-kane

Ew ھerf, ھeqîqeta muھeqqeş  
Hem emr e bi qudraşa te hem xelq

Eşbah muressem in ji nasût  
Erwah muwessem in ji lahût

Ev rûh û cesed bi cebr û ikrah  
Tezwîc bûyîn bi emrê Ellah

Nasûtî egerçi rengsefal e  
Lahûtî ji pertewa cemal e

Herfa ko me gotî, neqş-i hûr e  
Lê meqşed û me<sup>c</sup>neya wê kûr e

Zahir te eger numaye şuxra  
Baṭin ew e neqşê xame kubra

Mewcûd e di wî şehadet û ҳeyb  
Meşhûd e di wî siyadet û <sup>c</sup>eyb

Insan bi xwe hem zelam e hem nûr  
Adem ji te hem qerîb e hem dûr

Hindî weh ko cinsê <sup>c</sup>alemî ne  
Ew tabi<sup>c</sup>ê new<sup>c</sup>ê ademî ne

Evrenge felek hemî mu<sup>c</sup>ezzem  
Evçende melek hemî mukerrem

Ev karegeha <sup>c</sup>ezîm û dewwar  
Ev baregeha bedî<sup>c</sup> û seyyar

Evçende zemîn digel <sup>c</sup>enaşir  
Evrenge <sup>c</sup>ered<sup>c</sup> digel cewahir

Evçendehe ni<sup>c</sup> met û nefâ <sup>c</sup>is  
Evrengehe me<sup>c</sup>kel û melabis

Evçendehe mudde<sup>c</sup>a û metlûb  
Evrengehe müşteha û mehbûb

Heywan û me<sup>c</sup>adin û nebatat  
Metlûb û meqaşid û muradat

Bi l-cumle ji bo me ra li kar in  
Fi l-cumle ji bo me ber di bar in

Heqqa ko te xweş nizam û rewneq  
Tertîb kirin ji bo me el-hek

Em xafil û 'aṭil û gunehkar  
Mayîne di qeydê nefsi emmar

Nînin me di qelbî fîkr û zikrek  
Nakin bi zebanî hemd û şikrek

Xanî ko nehin bi qelbî ʐakir  
Barî bide wî zebanê şakir

## **2. Ey şukrê te cewhera zebanî**

Ey şukrê te cewhera zebanî  
Wey zikrê te şeyqela cenanî

Ey wahidê bêşerîkê yekta  
Wey wacidê bênezîr û hemta

Ey baqiyê bêzewalê da'im  
Wey hadiyê bêfenayê qa'im

Ey xaliqê erd û 'asimanan  
Wey xaliqê cumle ins û canan

Mulk û melek û felek bi carek  
Bi l-cumle te çekirin tebarek

Subhaneke kulle ma xeleqte  
Ehsente fe-keyfe ma feleqte

Herçî ko te çekir ey nikûkar  
Heryek di hedê xwe da sezawar

Ev neh şedefê di pirmirarî  
Dirrê di sefid, şefaf û tarî

Heft di mişalê durrê xeltan  
Herşes cihet û çihar erkan

Hersê weledê di pirmewalîd  
Xebra û sema digel meqalîd

Lewhû qelem û şewabit û 'ers  
Heywan û nebat û me'den û ferş

Zahir kirin ev qeder şena'i  
Peyda kirin ev qeder beda'i

Heryek ji 'edem kirin te peyda  
Ibda' kirin te bê heyûla

Fi l-cumle ci ewwel û ci axir  
El-qışse ci mu'min û ci kafir

Her yek ji te ra we bûne mezher  
Ewreng di wan tu bûyî muđmer

Bê ھusn-i te nîne wan wucûdek  
Bê nûr-i te nîne wan numûdek

Hikmet ew e bañinî û zahir  
Qudret ew e ҳaibî û hađir

Nînin te tecezzu' û temekkun  
Emma we di wan dikî teweşşun

Goya hemî cismek in tu can î  
Goya hemî şehrek in tu xan î

Husna te ye zîneta hebîban  
Reşka te ye xîreta reqîban

Meyla te ye ‘aşiqan dikêşit  
Derdê te ye dil ji ber diêşit

Sîrîn te kire şekir li Perwîz  
Ferhad ji rengê eşkê xwînrîz

Leyla te kire bela li Qeysî  
Ramîn bi te ram bû li Weysî

Yûsif te çira numa Zuleyxa  
Wamiq te kusa gihande ‘Ezra

Şêxê weko pênce hec bijarî  
Dîn kir te ji bo keça kufarî

Nîlûfer nazperwerî kir  
Ew jî te li mihrê muşterî kir

Balayê bilind te daye ser wan  
Pabendê bela te da tezer wan

Şorgul te kirin ji xar peyda  
Bilbil te kirin hezar şeyda

Xweşrengî te da giyayê şorgul  
Xweşdengî te da newayê bulbul

Ronahî te da serê şemalan  
Perwane kirin bi şewqê talan

Mehbûb te çêkirin di dilkeş  
Meczûb te pê kirin müşewwes

Ev <sup>c</sup>ışq û mehebbeta di dil da  
Ev zulf-i selasilê di mil da

Aya ne te çêkirin muqabil  
Heryek te bi hev kirin mu<sup>c</sup>adil

Ayîne te çêkirin mukerrer  
Husna xwe di wan te kir muşewwer

Ayîne li pêş-i tûtiyan girt  
Davik te li pêş-i kûviyan girt

Ayîne ji wan we ye ko av e  
Ew <sup>c</sup>ekis ji wan we ye ko taşav e

Neqşê te dibînin ew di avê  
Nakin hêzerê ji av û davê

Lebteşne teleb dikan zelalî  
Wî dane û dam û zulf û xalî

Meqşûd ko bû ji pêş ve hâdir  
Dê qesd bikin cemî<sup>c</sup>ê nazir

Tûtî bi xwe ma şekir dirêjin  
Herçî dibihêñ ewî dibêjin

Wê meqşedê muxteşer dibînin  
Pabend dibilin gelek dimînin

Meqşûd û muradê dil tu şa yî  
Emma tu tuđillu men teşa<sup>3</sup>i

Herçî te divê bibî ɖelalê  
Pabend dikî bi zulf û xalê

Herçî ko tu bînî ser hîdayet  
Vê ra Bekirî bikî ̄inayet

Hadîr wî dibî meqamê me'lûm  
Ger xadim e wî digêrî mexdûm

Bê secde te ey cenabê me'bûd  
Adem kire qiblegah û mescûd

Îsa kusa gihande ewcan  
Aya bi çi te hebande ew can

Dersa ko bi xef te gote Idrîs  
Elbet diçû meqamê teqdîs

Iblîsê, feqîrê bêcinayet  
Hindî te hebû digel ̄inayet

Her roj-i dikir hezar ̄a'et  
Lewra ko te da wî istīa'et

Wî secde nekir li xeyrê me'bûd  
Gêra te ji ber derê xwe merdûd

Yek secde nebir li pêşê exyar  
Qehra te kire muxellide n-nar

Elqîşse ji hikmeta te agah  
Ferdek me nedî tebareke l-lah

‘Irfan-i teleb di şahibê idrak  
Derheqqê te gote »ma ‘erefnak«

Xanî bi nezaniya xwe derheq  
Gumrah bibit ne dûr e el-heq

Illa ko meger mu<sup>cîn</sup> Xwida bit  
Ya rahiberê wî Muştefa bit

Ya reb bi heqqê Muştefa kî  
Xanî bi xwe ra tu aşina kî

### **3. Eşya bi heseb delîl û burhan**

Eşya bi heseb delîl û burhan  
Nabin cu meger wucûb û imkan

Wacib yek e zatê kibriya ye  
Mumkin pir e cem<sup>c</sup>ê ma-siwa ye

Wî wacibê mumkinat-i berqe<sup>c</sup>  
Mumkin wî ji bo xwe kirine metle<sup>c</sup>

Ye<sup>c</sup>nî ewî vê bibit muberhen  
Husna wî bi derkevit ji mekmen

Gencîneyê cewherî bibit faş  
Şabit bibitin ji neqşê neqqaş

Lê şen<sup>c</sup>etê wî hekîmê dana  
Neqşê ewî qadirê tiwana

Nedibû ko nebit ewî rusûmek  
La<sup>ı</sup>q ewî dê hebit ruqûmek

Herçî we ko bûne bêreqem bû  
Lew ewwelê ma-xeleq qelem bû

Ev ewwel û rûh û eqlê ewwel  
Her sîne bi ewwel-i mu<sup>ı</sup>ewwel

Emma meke wan ji hev tu tefriq  
Evrenge ewan bigere tewfiq

Bê şey'ek-i wahid in bi carek  
Te' dad û te'eddud i'tibarek

Ewwel biriqî ji ھusnê sermed  
Nûrek bûye me'neya Muhemed

Ew nûr bi emrê 'alimi l-şeyb  
Bû menşe'ê feydê 'alema ხeyb

Erwah ji me'neya peyember  
Çebûn meşela nebat û şekker

Bû eślê eşilê cumle nefsan  
Nefsa su'eda û nefşê nehsan

Hemîyan ji wî dîtine teferru'  
Hemîyan bi wî girtine temettu'

Hêja ne zemîn ne ev sema bû  
Ew serwerê cumle enbiya bû

Xelqa felekan ji bo wî ra bû  
Secda melekan ji bo wî ra bû

Ew rehmet-i cumle 'alemîn bû  
Adem di meyan-i ma' û tîn bû

Pêxemberê cem'ê ciz' û kul bû  
Adem bi xwe hêj av û gil bû

Ew pencereya cemalê barî  
Şemsa feleka dilê di tarî

Gava kete şûretê cihanî  
Pêxemberê axiri z-zemanî

Wî berzexê mumkinat û wacib  
Wî padîşehê li şiklê hacib

Mensûx kirin wî dîn û millet  
Me'lûl kirin 'elîl û 'illet

Fek'rî ko cihan cemî'i kifr e  
Kêşa ji nubuweta xwe sifre

Xelq-i ko hebûn li rûyê 'erdan  
Teklîf kirin hemî bi merdan

Xaqan bi xwe hind wê kemîn bû  
Fexfûr ji xwanê kaseçîn bû

Qeyşer bi quşûriya xwe qaşir  
Hadîr geriya bi 'eynê başir

Şahê 'erebî 'elem ko rakir  
Kesrayê 'ecem 'ucub duşa kir

Rûm û hebeş û fireng û tatar  
Herçî ko nekir bi dînî iqrar

Naçar gelek bi şîr fena bûn  
Hetta ko hinek bi dîn teba bûn

Butxane bi agirî dişûştin  
Ateşgede cumlekî vekuştin

Gava ewî dîn kir aşikara  
Dawûdî û sibtî û neşara

Tewrat ewan ji bîr kir ekşer  
Incîl û Zebûr çûn ji ezber

Îsayî dema dixwend-i Incîl  
Behşâ wî dikir bi wehy û tenzîl

Go »mijde didim resûlê emced  
Dê paşê mi bê bi navê Ehemed«

De<sup>c</sup>wa xwe dikir bi dest û ezman  
Destê wî bi seyf û dev bi Qur'an

Xweşxilqet e hem resûl e hem mîr  
Pirhikmet e hem kitab e hem şîr

Naxwande sebeq muderrisê <sup>c</sup>am  
Bê mal û menal şahîbê en <sup>c</sup>am

Bê xeyl û heşem bi xwe cihan gîr  
Bê tebl û <sup>c</sup>elem cihan şeda gîr

Herçî te didî meger her ew bû  
Leşker ji cunûdê »lem terew« bû

Bê xeyme û baregah û eywan  
<sup>c</sup>Ewran vedida li ser wî seyan

Hindî ko ji pêş ve baxeber bû  
Ewçend-i ji pişt ve babeşer bû

Sihdan nediket ji wî li 'erdan  
Vêk ra dibihîst şed xeberdan

Goyende dibûn digel cemadat  
Pûyende dibûn digel nebatat

Yek new<sup>c</sup>i nema ji cinsê ھeywan  
Nîna bi nubuweta wî îman

Illa ko hinek ji ibnê adem  
Bûn derxwirê ateşê cehennem

El-qışşe di erdû 'asimanan  
Hasıl di cemîcê insû canan

Nînin bê şerafeta wî tiştek  
Nabit ji wî zêdetir me piştek

Ev bîmededê di ummeta xwe  
Mumtaz kirîn bi himmeta xwe

Wer<sup>c</sup>a wî we reng dîn qewî kir  
Şer<sup>c</sup>a wî şiraṭ mustewî kir

'Alim hemî şubhê enbiya ne  
'Abid hemî pêk ve ewliya ne

Ferdek ji şehabeyê di kubbar  
Panşed ji dilawerê di kuffar

Ew cumle digel yekê seraser  
Nedibûn bi mehabetê beraber

Xelqê heye şubheyek di dînî  
Behşê bi cedel bikit ji dînî

Qur'an û xeber ci mu'cizat in  
Ayat û suwer ci beyyinat in

Bû Bekr û 'Umer ci xweş qerîn in  
'Uşman û 'Elî 'eceb guzîn in

Ey padişehê bilindpaye  
Xwîşidê feleknişîn û saye

Ne'cî te bi 'ilmê min meħal e  
Meddaħ-i ji bo te zu l-celal e

Ez dê ci bibêjim ey şehinşah  
Weşşafê te ye kelamê Ellah

Şaha ji te ra xweş ism e »yasîn«  
Taha ti te ra ṭilism e »ṭasîn«

Her ev bes e ey ḥebîbê muxtar  
Barî ji te ra bijîte sondxwar

Şed car bijîte ey keremkar  
Ger dê me hebin guneh duşed bar

Şed mertebe gerçi em xirab ïn  
Emma ji te naumîd nabîn

Hetta bigihite Xaniyê jar  
Napak û pelîd û wacibu n-nar

Ew jî bi xirabî û şeyînî  
De<sup>c</sup>wa dikitin bi ummetînî

Wî bed<sup>c</sup>emelî wekî kilaban  
Barî bike peyrewê şehaban

#### **4. Ey wasīteyê wucûdê kewneyn**

Ey wasīteyê wucûdê kewneyn  
Şayesteyê qurbê »qabi qewseyn«

Şahinşehê textigehê Medîne  
Mūciz ji te ew qeder me dîne

Seyra felekan li nik te gavek  
Fexra melekan ji te silavek

Şeqqe l-qemera te yek işaret  
Zaxê l-besera te yek ibaret

Ey padişehê serîrê »lewlek«  
Rabe here asimanê çalak

Hadîr ji te ra Buraq û refref  
Şaçîr bi te ra fîrişte ref ref

Da refî bibin ji ber te perde  
Bê perde digel Xwidê xeber de

Bêjê tu qedîr û zu l-celal î  
Bêjê tu qedîm û la-yezal î

Em fanî û jar û miştî xak ïn  
Hadî ne tu bî xwe em helak ïn

Ewwel te ji bo çi da me te<sup>c</sup>zîm  
Danî li serê me tac-i tekrim

Tesrîf-i xilafetê te da me  
Gava te emanetê xwe da me

Me'lûmê te bû ko em nezan ûn  
Qedrê wê emanetê nizanîn

Herçî te ji bo me kir irade  
Yek zerre me lê nekir ziyade

Haşa ji kemalê re<sup>c</sup>feta te  
Dûr e ji celal û rehmeta te

Kufr û gunehan bikî behane  
La<sup>c</sup>iq te bitin ev e şehane

Yekrû ne li nik te kufr û îman  
Yeksû ne li nik te xuld û nîran

Qehra xwe bikî eger tu zahir  
Cennet li me dê bibîte agir

Wer feyd bikit sehabê rehmet  
Dozex li me dê bibîte cennet

Ger kafir û ger gunahekar ûn  
Bi l-cumle ji te umîdiwar ûn

Kes nîne ji kafir û <sup>c</sup>uşatan  
Mezher nebitin ji bo şifatan

Kafir bûyîn em bi ismê qehhar  
Xeffar e ko em kirîn gunehkar

Kufrê tu meger neşî bibexşî  
Ger dê gunehan bi me nebexşî

Dê şad-i bibin li me şeyaṭîn  
Mesrûr bibin gelek mela<sup>c</sup>în

Qet xîret e ey penahê <sup>c</sup>alem  
Qet la<sup>c</sup>iq e ey şebanê adem

Ev gurgê le<sup>c</sup>înê bedserencam  
Jêk ra bikitin me şubhê exnam

El-qışşe bikî ko dêwê serkeş  
Tenha û tenê biçîte ates

Fi l-cumle me cumle xas û <sup>c</sup>aman  
<sup>c</sup>Aşî û şeqî û natemaman

Têk ra bi şefa<sup>c</sup>eta xwe xas ke  
Vêk ra me ji agirî xilaş ke

## 5. Saqî tu ji bo Xwidê kerem ke

Saqî tu ji bo Xwidê kerem ke  
Yek cur<sup>c</sup>e<sup>’</sup>ê mey di cam-i Cem ke

Da cam bi mey cihannuma bit  
Herçî me irade ye xuya bit

Da keşf bıbit li ber me eħwal  
Kanî dıbitin muyesser iqbal

Idbara me wê giha kemalê  
Aya bûye qabilê zewalê

Ya her wehe dê li ‘stiwa bit  
Hetta weko dewr munteha bit

Qeṭ mumkin e ev ji çerxê lewleb  
Tali<sup>c</sup> bıbitin ji bo me kewkeb

Bextê me ji bo me ra bıbit yar  
Carek bıbitin ji xwabê hişyar

Rabit ji me jî cihanpenahek  
Peyda bıbitin me padişahek

Şîrê hinera me bête danîn  
Qedrê qelema me bête zanîn

Derdê me bibînitin ‘ilacê  
‘Ilmê me bibînitin rewacê

Ger dê hebûya me serfirazek  
Şahibkeremek suxennewazek

Neqdê me dibû bi sikke meskûk  
Ned’ma wehe bêrewac û meşkûk

Herçend ko xalis û temîz in  
Neqdên bi sikkeyê ‘ezîz in

Ger dê hebûya me padişahek  
La’iq bidiya Xwidê kulahek

Te’yîn bibûya ji bo wî textek  
Zahir vedibû ji bo me bextek

Haşîl bibûya ji bo wî tacek  
Elbette dibû me jî rewacek

Xemxwarî dikir li me yetîman  
Tînane der ji destê le’îman

Xalib nedibû li ser me ev rûm  
Nedibûne xirabeyê di dest bûm

Mehkûmi ‘eleyhî û şe’alîk  
Mexlûb û muṭî’ê tirk û tacîk

Emma ji ezel Xwidê wisa kir  
Ev rûm û ‘ecem li ser me rakir

Tebe<sup>c</sup>iyyet wan egerçi<sup>c</sup>ar e  
Ew<sup>c</sup>ar li xelqê namidar e

Namûs e li ḥakim û emîran  
Tawan ci ye şâ<sup>c</sup>ir û feqîran

Herçî bire şîrî destê himmet  
Debt kir ji bo xwe bi mîrî dewlet

Lewra ko cihan wekî<sup>c</sup>erûs e  
Wê ḥukim di destê şîrê rûs e

Lê<sup>c</sup>iqd û şedaq û mehr û kabîn  
Luṭf û kerem û<sup>c</sup>eṭa û bexşîn

Pirsî ji dinê min ev bi ḥikmet  
Mehra te ci gote min ko himmet

Haşîl ko dinê bi şîr û ihsan  
Tesxîr dabit ji bo wî insan

Ez mame di ḥikmeta Xwidê da  
Kirmanc di dewleta dinê da

Aya bi ci wechî mane mehrûm  
Bi l-cumle ji bo ci bûne mehkûm

Wan girt bi şîrî şehrê suhret  
Tesxîr kirin biladê himmet

Her mîrekê wan bi bezlê Hatem  
Her mîrekê wan bi rezmê Ristem

Bif'kir ji 'ereb heta ve gurcan  
Kirmancî ye bûye şubhê bircan

Ev rûm û 'ecem bi wan hîşar in  
Kirmanc hemî li çar kenar in

Herdu terefan qebîlê kirmanc  
Bo tîrê qedâ kirîne amanc

Goya ko li serheden kilîd in  
Her ta'ife seddek in sedîd in

Ev qulzimê rûm û behrê tacîk  
Hindî ko bikin xurûc û tehrîk

Kirmanc dibin bi xwîn mulettxex  
Wan jêk ve dîkin mişalê berzex

Ciwamêrî û himmet û sexawet  
Mêrînî û xîret û celadet

Ew xetm e ji bo qebîlê ekrad  
Wan dane bi şîrê himmetê dad

Hindî ji şeca'etê xeyûr in  
Ewçend ji minnetê nefûr in

Ev xîret û ev 'uluwwê himmet  
Bû mani'ê hemlê barê minnet

Lew pêk ve hemîse bêtifaq in  
Da'im bi temerrud û şıqaq in

Ger dê hebûya me ittifaqek  
Vêk ra bikira me inqiyadek

Rûm û 'ereb û 'ecem temamî  
Hemîyan ji me ra dikir xulamî

Tekmîl dikir me dîn û dewlet  
Teħşîl dikir me 'ilm û hikmet

Temyîz dibûn ji hev meqalat  
Mumtaz dibûn xwidankemalat

## 6. Xanî ji kemal-i bêkemalî

Xanî ji kemal-i bêkemalî  
Meydana kemalê dîte xalî

Ye<sup>c</sup>nî ne ji qabil û xebîrî  
Belkî bi te<sup>c</sup> eşşub û <sup>c</sup>esîrî

Haşil ji <sup>c</sup>inad eger ji bêdad  
Ev bid<sup>c</sup>ete kir xilafê mu<sup>c</sup>tad

Şafî şemirand vexwar-i durdî  
Manendê derê lisanê kurdî

Înaye niżam û intiżamê  
Kêşaye cefa ji boyî <sup>c</sup>amê

Da xelq nebêjitin ko ekrad  
Bême<sup>c</sup>rifet in, bêeşl û bunyad

Enwa<sup>c</sup>ê milel xwidankitêb in  
Kirmanc-i tenê di bêhesêb in

Hem ehlê nezer nebên ko kirmanc  
'Isqê nekirin ji bo xwe amanc

Têk da ne di ṭalib in, ne metlûb  
Vêk ra ne muhibb in ew, ne mehbûb

Bêbehre ne ew ji <sup>c</sup>işqibazî  
Farix ji heqîqî û mecazî

Kirmanc ne pir di bêkemal in  
Emma di yetîm û bêmecal in

Fi l-cumle ne cahil û nezan in  
Belkî di sefîl û bêxwidan in

Ger dê hebûya me jî xwidanek  
<sup>c</sup>Alîkeremek, leşifedanek

<sup>c</sup>Ilm û hiner û kemal û iz<sup>c</sup>an  
Şi<sup>c</sup>ir û җezel û kitab û dîwan

Ev cins biba li ba wî me<sup>c</sup>mûl  
Ev neqd biba li nik wî meqbûl

Min dê <sup>c</sup>elema kelamê mewzûn  
<sup>c</sup>Alî bikira li banê gerdûn

Bîna ve rûha Melê Cizîrî  
Pê һey bikira <sup>c</sup>Elî Herîrî

Keyfek we bida Feqiyê Teyran  
Hetta bi ebed bimayî һeyran

Çi b'kim ko qewî kesad e bazar  
Nînin ji qumaşî ra xerîdar

Xasma di vê <sup>c</sup>esrê da ko himyan  
Me<sup>c</sup>şûq û hebîb e bo me hemiyan

Ye<sup>c</sup>nî ji teme<sup>c</sup> dirav û dînar  
Heryek ji me ra we bûne dildar

Ger<sup>c</sup>ilm temam bidî bi polek  
Bifroşî tu hikmetê bi şolek

Kes nakite meyterê xwe Camî  
Ranagiritin kese Nîzamî

Weqtê ko me dî zeman e evreng  
Fi l-cumle li ser diravî bû ceng

Hez kir me bibîne kîmiyager  
Gava ko me dî nebû tuyesser

Nişfiyye me pêlekê<sup>c</sup> emel kir  
Teşfiyye cewher dexel kir

Qelbê me nekir qebûl-i hîle  
Qeṭ bo ẍeredê nebû wesîle

Dîn çû û neket bi dest me dînar  
Paşê ji neçarî bûyîne şeffar

Şifrê xwe yê xef me eşkera kir  
Qırtaşıye bû me lê du<sup>c</sup>a kir

De<sup>c</sup>wet geriya bi şidq icabet  
Bû waşıteê qedayê hacet

Ev pol egerçi bêbeha ne  
Yekrû ne û şaf û bêbeha ne

Bêhîle û xurde û temam in  
Meqbûlê mu'amela 'ewam in

Kirmancî ye şirf e, bêguman e  
Zêr nîne bibîn sipîdeman e

Şîfrê me yê şor e, aşikar e  
Zîv nîne bibîn ko kem'eyar e

Neqdê me mebêje kembeha ye  
Bê sikkeyê şahê şehrewa ye

Ger dê bibûya bi ɔerb-i menqûş  
Nedima wehe bêrewac û mexşûş

Mehbûb e, bi kes ne namizad e  
Lew bextê siyah û namurad e

Qırtaşıyeya me bêpenahan  
Bê ɔerb-i qebûl-i padişahan

Me'lûl e li ba gelek 'elîman  
Meqbûl e li ba gelek hekîman

Lê ɔakimê weqt-i me'rifetnak  
Mesmû' nekir bi sem'i idrak

Mîrê ko bi navê Mîrza ye  
Mehdâ nezera wî kîmya ye

Qelbê di zexel dikit bilorî  
Polê di dexel dikit filorî

Şed bar hebin filûsê ehmer  
Derhal-i dikit bi yek nezer zer

E<sup>c</sup>layî dikit bi qehrê edna  
Ednayî dikit bi lu<sup>c</sup>tfê e<sup>c</sup>la

Paşan digirit wekî esîran  
Aza dikitin wekî feqîran

Herroj hezar bênewayan  
Herlehze bi lu<sup>c</sup>tfê şed gedayan

Zengîn dikitin bi destê himmet  
Hikmet ew e nakitin çu minnet

Ger dê wî nezer bida me carek  
Iksîrê teweccuha mubarek

Ev qewl hemî dikirne eş<sup>c</sup>ar  
Ev pol hemî dibûne dînar

Emma nezera wî zêde <sup>c</sup>am e  
Lew xas-i nezer ji dil neda me

Ew rehmet xaş e bo <sup>c</sup>ewamî  
Ya Reb, tu bidî wî her dewamî

## 7. Saqî bike cam-i asimanî

Saqî bike cam-i asimanî  
Raşa weko rûhê cawîdanî

Da em bikirîn dimaxê can ter  
Yek lehze bi rahé rûhperwer

Saqî tu birêje camê mîna  
Ava ko dikit ɬemîrî bîna

Şadab bigêre qelbê mehzûn  
Medhûş bigêre eqlê mecnûn

Saqî bike kaseya muc ewher  
Wê şîreyê me sera muşehher

Yaqûtê mužab û leclê seyyal  
Wê durr-i xweşab û xemra ṭellal

Durdaneyê xwe birêje navê  
Yeñî ereqa wekî gulavê

Dem dem bide destê meyperestan  
Xelqê ko hinik ji dil di destan

Da camê dilan bîbit mureşşec  
Bezma ȳerebê bîbit muşenneye

Vê meclisê meyxuran mudamê  
Mestane bike ji nû mudamê

Mumkin ko ji feydê bênihayet  
Yek qet're bibit li min 'inayet

Neş'a qedeха meya murewweq  
Keyfa 'ineba rezê bi rewneq

Ewreng-i bikit di nefsê te'sîr  
Haşil bibitin di qelbî teşwîr

Ye'nî bikevîte canî şewqek  
Hetta bigihîte qelbî zewqek

Te'sîrê nefes bibit ji bo min  
Teşrîhê qefes bibit ji bo min

Tesfiyyeyê dil babit me hasil  
Hevdeng bibim digel 'enadil

Murxê dilê murde bête perwaz  
Bê perde babit terane perdaz

Dem şubhetê bilbilan binalit  
Geh şubhê 'enadilan bikalit

Ahan ko verê bikit sehergah  
Hemware digel nesîmê hemrah

Şed xunçeyê dil ji ber bi ker bin  
Sosin bi zeban û baxeber bin

Bışkoj bibişkivin ji xaran  
Xwînrîz bibin dim hezaran

Şorgul bigirîn bi eşkê şebnem  
Bilbil bikenin li rexmê hemdem

Saqî bide min şerabê gulgûn  
Bê dengê defê û şedayê qanûn

Da şehne û muhtesib nebînin  
Şahî bicivin çu xem nemînin

Teşwîş biçin ji qelbê mehzûn  
Dîsan bibim ez ji nû digergûn

Mexmûr bibim bikirme lafan  
Serxweş bibim bikim guzafan

Bê keyf neşêm çu ez bibêjim  
Dîwane bibim duran birêjim

Bedhal bibim suran bi der dim  
Bêqal ji baṭinê xeber dim

Teşbîhê neyê bikim terennum  
Tûṭîşifet ez bikim tekellum

Da keşf bibin ji min keramat  
Meşhûd bibin li min meqamat

Şu'be ji meqamê dil bi awaz  
Gulgeşt bikin geweşt û şehnaz

Bêdeng ji xewrê dil bi aheng  
Şed reng şeda bidim wekî çeng

Manendê rubabê bê kemançe  
Deng bê ji defa me bê țebançe

Zuhre bibihêt newayê <sup>c</sup>uşşaq  
Reqqas bitib li ewcê neh țaq

Saza dilê kul bi zîr û bem bit  
Sazendeyê <sup>c</sup>işqê Zîn û Mem bit

Şerha xema dil bikim fesane  
Zînê û Memê bikim behane

Nexmê we ji perdeyê derînim  
Zînê û Memê ji nû vejînim

Me'lûl bûyîn hebîb û <sup>c</sup>aşıq  
Îrohe wekî țebîbê ھازىق

Derman bikim ez ewan dewa kim  
Wan bêmededan ji nû ve rakim

Derdê di dilê Memê cegerrîş  
Zîna ji derûnê dil cefakîş

Wê perdegiya <sup>c</sup>efîfe mestûr  
Wî bêgunehê ji tuhmetê dûr

Meşhûr bikim bi țezz û uslûb  
Mumtaz bibin muhibb û mehbûb

Ewreng-i bikim ji nû serefraz  
Da bêne temâşeyê nezerbaz

Dilber li Memê bikin girînê  
‘Aşıq bikenin bi derdê Zînê

Hemderd bikin bi wan şefayê  
Bêderd bikevne ھilûlayê

Xelqê ko sîne û ji dil şaf  
Pakîzesirişt û ehlê inşaf

Bi-l-cumle bikin ji bo me tehsîn  
Bêjin ko »bi qencî hate tedwîn«

Xelqê ji »yuhibbuhum« digergûn  
Herçî ji ezel bûyî »yuhibbûn«

Da bêñ û bikin hikayetê gûş  
Hindek bikirin xwe pê feramûş

Hindek bikirin bi can sema<sup>c</sup>ê  
Hin pê bikirin ji dil weda<sup>c</sup>ê

Lê hêvî dikim ji muste<sup>c</sup>îdan  
Herfan negirin li mustefîdan

Ev name eger xirab e ger qenc  
Kêşaye digel wê me duşed renc

Nûbawe ye, ȝifl e, nûresîd e  
Herçend nehin qewî guzîde

Lê min ji rezan nekir temettu<sup>c</sup>  
Manend-i dizan bi kes tetebbu<sup>c</sup>

Nûrestê hedîqeyê fu'ad e  
Me'sûm e 'efîf e xanezad e

Nûbar e eger şirîn eger taş  
Meṭbû<sup>c</sup>e ji rengê new<sup>c</sup>ê etfal

Min hêvî heye ji ehlê ھalan  
Teqbîh nekin evan җifalan

Ev meywe eger ne abdar e  
Kirmancî ye, ew qeder li kar e

Ev җifl e eger ne nazenîn e  
Nûbar e bi min qewî şirîn e

Ev meywe eger ne pir lezîz e  
Ev җifl e bi min qewî 'ezîz e

Mehbûb û libasê gûşîwar e  
Mulkê di min in ne muste<sup>c</sup>ar e

Elfaz û me'anî û 'ibarat  
Inşa<sup>c</sup> û mebanî û işarat

Mewdû<sup>c</sup> û meqasid û hikayet  
Mermûz û menaqib û dirayet

Uslûb û şifat û me'na û lefz  
Eşla nekirin me yek ji wan qerz

Bi-l-cumle netayicê di fikr in  
Dûşîze û nû<sup>c</sup>erûs û bikr in

Ya Reb mede destê xelqê nasaz  
Vê şahidê dilrubayê tennaz

Umîd ew e ji ehlê <sup>c</sup>urfan  
Ew dê negirin li min çu hêrfan

Teşnî<sup>c</sup> nekin wekî xeyûran  
Işlah bikin li min quşûran

Eşhabê kemalê perdepûş in  
Erbabê xered di pîrxirûş in

Me<sup>3</sup>mûl ew e ji ehlê razan  
Ew dê nekirin bi min tînazaran

Ez pîlever im ne gewherî me  
Xudreste me ez ne perwerî me

Kirmanc im û kûhî û kenarî  
Van çend xeberê di kurdewarî

Imda bikirin bi hûsin eltaf  
Ixha bikin ew bi semi<sup>c</sup> inşaf

Eşhabê xered ko guh bidêrin  
Eyban bi kerem li min veşêrin

Ava rûyê şâ<sup>c</sup>irî nerêjin  
Ger mumkin e êke qenc bibêjin

Sehw û xeleşan nekin te<sup>c</sup>eccub  
Te<sup>w</sup>îl bikin ji bo te<sup>c</sup>essub

## 8. Neqqaşê şehîfeyê hikayet

Neqqaşê şehîfeyê hikayet  
Neqqadê sebîkeyê riwayet

Kêşa bi vî terhî resm û ayîn  
Lê da bi vî terzî derb û tezyîn

Go, padişehek zemanê sabiq  
Rabû di hukûmeta xwe fa'iq

Ecnasê milel muti<sup>c</sup> û munqad  
Nesla wî 'ereb emîrê ekrad

Textê wî Cizîr û bextê mes<sup>c</sup>ûd  
Tali<sup>c</sup> qewî û meqamê mehmûd

Rûm û 'ereb û 'ecem di ferman  
Meşhûr-i bi navê »Mîrê Buhtan«

Aba'ê 'izam û cedd û walid  
Mensûbê muselselê di Xalid

Cebbarê felek ji wî hezerkar  
Meslûl-i ji sellê seyfê cebbar

Zînet de mulk û zeynê dîn bû  
Navê wî emîrî Zeynidîn bû

Mîrî ji wî ra bi zîn muweşşef  
Zînet ji wî ra bi dîn mu'erref

Aşarê şeca'eta wî şahî  
Dagirtî ji mah ta bi mahî

Mahiyyetê wî medarê dunya  
Şahiyyetê wî şî'arê 'uqba

Muhtacê sexaweta wî Hatem  
Mexlûbê şeca'eta wî Ristem

Hatem ji kemalê himmeta wey  
Tomarê sexaweta xwe kir Tey

'Eql û huner û sexa û meydan  
Debt û neseq û nizam û deywan

Dîndarî û dewlet û diyanet  
Serdarî û şewlet û şıyanet

Meşhûn ji her yekê xezînek  
Meknûn ji her yekê defînek

Bê 'usir ji bo wî ra tuyesser  
Bê xusir ji bo wî ra muqedder

Enwa'ê newadir û cewahir  
Elwanê nefâ'is û zewahir

Mecmûe'ê mumkinatê meqsûd  
Wacib kiribûn li nik wî mewcûd

Haşil bi wî mudde<sup>c</sup>a û metlûb  
Waşil bi wî müşteha û mehbûb

Şehna heremê ji nazenînan  
Cennet tejî bû ji hori<sup>c</sup>inan

Horî wî di cennetê gelek bûn  
Xulman wî di hedefretê melek bûn

Lê zadeyê dûdemanê dewlet  
Nûbadeyê bositanê <sup>c</sup>iffet

Şehzade du bûn li nik wî şahî  
Xurşide du bûn li nik wî mahî

Ye<sup>c</sup>nî ko ji wî nejadê <sup>c</sup>alî  
Hemşîre du bûn di la<sup>c</sup>ubalî

Yek serwî riyadê rasitî bû  
Wê nav bi rasitî Sitî bû

Ya dî ji dil û hinavê mîr bû  
Wê nav ji nişfê navê mîr bû

Rawî wehe gote min mu<sup>c</sup>emma  
Ew hor-i bi navê Zîn musemma

Yek zêde şirîn ziyade mehbûb  
Yek rûhê qulûb û hor-i meqlûb

Yek esmer û ya duwê zerî bû  
Yek horî û ya duwê perî bû

Ew ከور û پەری di bêbedel bûn  
Lewra ko ji nûrê lem yezel bûn

Ḩusna rûxê wan çu kes ne dî bû  
Zîra ji cemalê sermedî bû

Leble<sup>l</sup> û semen<sup>c</sup>uzar û gulruk  
Rewneqşiken-i butanê xullux

Zulfêن mişalê tayê sunbul  
Xeddêن ji rengê rûyê şorgul

Ew şorgul û sinbilê di azad  
Bişkiftî li qeddê serwîşimşad

Şorgul ji xwe da li ser rehistî  
Sinbil bi xwe pêk ve daheristî

Ḩusna xeṭê rux ji xeṭtê yaqût  
Çaha zeqenê ji sīhrê Harût

Goya kiribû ji mişk bêzî  
Remmalê felek nuqaṭê rêzî

Xal û nuqet û beyađ û ھumre  
Beyt û ھecer û ھewaf û umre

Ebrû ji kemanê qewsê eflak  
Mijgan bi guman ji sehmê semmak

Sermayeyê wehşeta cunûnan  
Mermûzê di dehşeta uyûnan

Mebhûtê dibûn di ḥerfeti l-<sup>c</sup>eyn  
Keşşafê rumûzê hikmeti l-<sup>c</sup>eyn

Cebhet dinuma ji ḥerfê iklîl  
Goya li <sup>u</sup>fqê cenahê Cibrîl

Wesṭayî l' istiwayê da<sup>im</sup>  
Xurşîd di xīmeta wî qa<sup>im</sup>

Herçî bidiya rux û binagûş  
Fi-l-ḥal bi der dida ji bo hûş

Gerden te digo di destê saqî  
Qarûre ye pir şerabê baqî

Yan şubhetê şîseya nebatê  
Yan menbe<sup>c</sup>ê kahniya hîyatê

Serpenceâ naxunê muhenna  
Rencîdeyê xaṭirê muhenna

Xelqê ko didîtin ew kemergah  
Hadîr dikirin ji xewrê dil ah

Zahir dikirin ko zend û bazin  
Edî nediman gilî û gazin

Herçend ko herdu şubhê can bûn  
Ew herdu bi ḥusin tew'eman bûn

Herçend Sitî we nazenîn bû  
Lê Zîn ji mişalê ḥorî<sup>c</sup>în bû

Herçend Sitî stareweş bû  
Lê Zîn bi ruxan heyîveges bû

Herçend Sitî wekî qemer bû  
Zîn mihirşifet ziyadetir bû

Ev herdu wekî du şebçiraşan  
Gava dimeşîne baş û raşan

Nalan dikirin cemad û heywan  
Talan dikirin nebat û insan

Kofî ji cewahiran mukellel  
Koter ji netrikan muselsel

Serbendê qeşeb didan cebînê  
Aşıq dimirin ji dest evînê

Ev zînet û xeml û qışt û henbel  
Ez pîş û pes û yemîn û qenbel

Gava dimeşîn perî digel wan  
Wale dikirin welî di xelwan

Ger şêx in û ger mela û mîr in  
Derwêş û xenî û ger feqîr in

Kes nîne ne ḫalibê cemalê  
Kes nîne ne raxîbê wişalê

Hin raxîbê ḥusnê la-yezal in  
Hin ḫalibê qalibê beṭal in

Lêkin hemiyan yek e yeqîn dost  
Ferqa ko heye ji mexz ta post

## 9. Hindî ko di qeyşerê di dinya

Hindî ko di qeyşerê di dinya  
Vêk dane xwedîmeta<sup>c</sup> û kala

Mecmû<sup>c</sup>ê xeza<sup>ı</sup>inê di Qeyşer  
Hetta veke di xîmeya Sikender

Durrê di defa<sup>ı</sup>inê di xaqan  
Le<sup>ı</sup>la ko di xatema Silêman

Herçend ziyadetir biha bin  
Bi-l-cumle bi cuz<sup>ı</sup>ê hûsnê nabin

Husna li ruxê Sitî û Zînê  
Bû behrekê ateşê evînê

Pêla ko digirte pêl û mewcan  
Roja dikete hedîd û ewcan

Şed can û dil û ceger dişotin  
Xelqê bi meşel ji wan digotin

Şems û qemeran qiran e pêk ve  
Lew muşterî ev cihan e pêk ve

Seyyadê cemalê wan xezalan  
Seyyatê şedayê wan delalan

Delal-şifet gelek şifet şêr  
J'efxan û ji naliyan nebûn têr

Rojan û şevan gelek dinalîn  
Hetta ko digel melek dikalîn

Husna nebitin cu hedd û ҳayet  
Nabit ji xwe ՚aşiqan nihayet

Lê ՚aşiq û bu-l-hewes cida ne  
Hin fa'îdexwaz û hin fida ne

Canançeleb in hinek ji bo can  
Hin cançeleb in ji boyî canan

Hin weşilhebîn ji rengê Tacdîn  
Hin derdiguzîn wekî Mem û Zîn

## 10. Da bêne bi ser hikayeta pîş

Da bêne bi ser hikayeta pîş  
Xelqê ko ji derdê <sup>c</sup>işqê dilrîş

Herçend ko bêhed û qiyas bûn  
<sup>c</sup>Amî û xewadim û xewaş bûn

Lêkin ji xewadimê di mumtaz  
Şed law sihîqed û serefraz

Heryek di meqam hüsnirojek  
Heryek bi kelam sîneşojek

Heryek bi kemal bedrê mahek  
Heryek bi cemal şedrê şahêk

Ew jî hemî <sup>c</sup>aşiq in di taşlib  
Ew jî hemî taşlib in di raxîb

Lêkin ne bi dîtin û şehadet  
Belkî bibihîstin û riwayet

Bi-l-cumle di xidmeta emîr bûn  
Fi l-cumle ji sirrê hev xebîr bûn

Serhelqeyê wan perîmîşalan  
Sertacê ewan melekxişalan

Tacdîn digotin-ê ciwanek  
Guhderzê zemane pehlewanek

Nesl û neseb û heseb 'eyan bû  
Serdefter û serwerê kuran bû

Babê wî digotin-ê Sikender  
Lêkin 'ereban digo ҳedjenfer

Lewra ko bi şîrî şubhê şêr bû  
Roja şerî ew hezare mîr bû

Tacdîn du bira hebûn di qellaş  
Manendê du şahbazê cemmaş

Da'im dilê dijminan dişotin  
Yek 'Arif û yek Çeko digotin

Emma wî ji cümle xaş û 'aman  
Ji ewçend bira û bab û maman

Lawek kiribû bira ji bo xwe  
Ne, ez ҳeleş im, çira ji bo xwe

Roja ko ewî bira nedîta  
Teşbihê şeva çira nedîta

Dinya li wî têk dibûye tarî  
Roj bû ko li wî dikir tewarî

Enbazê fereh şerîkê xem bû  
Sergeşteyê xem bi navê Mem bû

Mem jî li wî <sup>c</sup>aşiqek temam bû  
Ne şuhê bira û bab û mam bû

Herçend birayê axiret bû  
Te digo ko dinê û axiret bû

Tacdîn weledê wezîrê dîwan  
Mem jî xelefê debîrê dîwan

Ew herdu ciwan we lêk <sup>c</sup>aşiq  
Ew herdu bira we pêk ve şadiq

Yek Qeysê zemane yêkê Leyla  
Yek Wamiqê <sup>c</sup>eşr û yêkê <sup>c</sup>Ezra

Ew yarî ji dil ne serserî bûn  
Rehşubhetê Mihr û Muşterî bûn

Yarî û birayî û muwaxat  
Nabit bi riya<sup>î</sup> û muqalat

Yarî ne hêsanî ye cefa ye  
Meqşûd ji yarıyê wefa ye

Axir tu eger nekî wefayê  
Ewwel mede ber xwe wê cefayê

## 11. Xellaqê cihan ji feydê fiştret

Xellaqê cihan ji feydê fiştret  
Hey'atê felek bi wechê qudret

Bê qalib û bê muhît û miqyas  
Bê alet û bê müşîr û miqraş

Evçende mue<sup>c</sup>zzem û mudewwer  
Evrenge musenne<sup>c</sup> û mukerrer

Înane bi me<sup>c</sup>ređa wucûdê  
Kêşane bi menzera şuhûdê

Hikmet ew e ev hemî li kar in  
Hindek di peya û hin siwar in

Hindek di beşî û hin serî<sup>c</sup> in  
Hindek di mu<sup>c</sup>în û hin menî<sup>c</sup> in

Hin mudbir in ew hinek mudebbir  
Hin muqbil in ew hinek muqeddir

Hin katib in ew hinek di ustاد  
Hin mütrib in ew hinek di cellad

Hin rojperest û hin şebefrûz  
Hin xuşşerevîn û hin xemendûz

Hindek di mişalê Zîn zerî ne  
Hin şuhê Memê di muşterî ne

Bi-l-cumle müşeyqel û munîr in  
Hin padişeh in hinek wezîr in

Hindek ji teħerruka tebî<sup>c</sup>î  
Ew têne bi nuqṭeya rebî<sup>c</sup>î

Tecdîd dikan ji bo me salê  
Gava weko têne i<sup>c</sup>tidalê

Danayê mu<sup>c</sup>emmerê kuhensal  
Evrengehe go ji bo me eħwal

Go <sup>c</sup>adetê pêşîzemanan  
Ev bû li hemî cih û mekanan

Weqtê weko şehsiwarê xawer  
Teħwîl dikir di mahê azer

Ye<sup>c</sup>nî ko dihate bircê sersal  
Qeṭ kes nedima di mesken û mal

Bi-l-cumle diçûne der ji malan  
Hetta digihişte pîr û kalan

Roja ko dibûye <sup>c</sup>îdinewroz  
Te<sup>c</sup>zîm ji bo dema dilefroz

Şehra û çîmen dikirne mesken  
Beyda û demîn dikirne gulşen

Xaşma <sup>c</sup>ezeb û keçê di bakir  
Elqışşe cewahirê di nadir

Têk da di muzeyyen û mulebbes  
Vêk ra li teferrucê murexxes

Lêkin ne bi tuhmet û bi minnet  
Belkî bi ḥerîqê şer<sup>c</sup>ê sunnet

Lewra ko ewan ḫeredj ji geştê  
Meqşûd ji çûyîna bi deştê

Ew bû ko ci ṭalib û ci meṭlûb  
Ye<sup>c</sup>nî du ṭeref muhibb û mehbûb

Ev herdu celeb ko hev bibînin  
Kufwê di xwe ew ji bo xwe bînin

## 12. Dewra felekê ji bextê feyrûz

Dewra felekê ji bextê feyrûz  
Dîsan ko numa ji nû ve newrûz

Mebnî li wê <sup>c</sup>adetê mubarek  
Şehrî û sipahiyan bi carek

Bajar û kelat û xanî berdan  
Teşbihê bi nijdeyan û cerdan

Şef şef dimeşîne kûh û deştan  
Ref ref dixwişîne seyr û geştan

Eşnafê umem şıxar û kubbar  
Qeṭ<sup>c</sup>a venema di şehrî deyyar

Hindek bi peyayî çûne başan  
Hindek bi siwarî çûne raşan

Hindek bi tebayî û bi keşret  
Hindek bi hevalî û bi wehdet

Rabûne ve xanim û xewatîn  
Wan jî tejî gul kirin besatîn

Horan kire meskenê xwe cennet  
Bê perde û bê melal û minnet

Dûşîze û duxter û rewalan  
Pakîze<sup>c</sup>izar û zulf û xalan

Etrab û kewa<sup>c</sup>ibê di <sup>c</sup>ezra  
Merdan û murahiqê di zîba

Eşhabê qumaşê lutfê ruxsar  
Erbabê meta<sup>c</sup>ê husnê dîdar

Wan lêk dikirin meta<sup>c</sup>ê yek <sup>c</sup>erđ  
Texmîn dikirin bi-ş-şûli we-l-<sup>c</sup>erđ

Sewdagirê <sup>c</sup>işqê bûn di bazar  
Hem ba<sup>3</sup>i<sup>c</sup>ê husn û hem xerîdar

Sersalî û bakir û rewalan  
Şedsalî û ciwan û pîr û kalan

Sersal li resm û rahê me<sup>c</sup>hûd  
Gêran diçû meqamê mehmûd

### 13. Qendîlê munîrê dêrê ezreq

Qendîlê munîrê dêrê ezreq  
Muşkatê hemel ko kir murewweq

Sersal ko bû ji nû ve me<sup>c</sup>mûr  
Mîr daye gerê di taze destûr

Destûr ko bû ji bo wişaqan  
Rabûn hemî şubhetê <sup>c</sup>uşaqan

Têk çûne bi me<sup>c</sup>ređa mezadê  
Dildadeyê meqşed û muradê

Illa ko tenê Memo û Tacdîn  
Wan dane xwe duxterane tezyîn

Ye<sup>c</sup>nî di dema ko bûye tehwîl  
Ew herdu bira di came tebdîl

Istebreq û sundusin di ber da  
Çend me<sup>c</sup>cer û muqrime bi ser da

Kagul kiribûne ȳurreê her sû  
Perçem kiribûne zulf û gîsû

Wan lew kiribû libasê teşrif  
Da qeṭ nebitin li wan çu teklîf

Pûşîde libasê dilberanî  
Seyran dikirin bi sergiranî

#### 14. Wan herdu kurê di came tebdîl

Wan herdu kurê di came tebdîl  
Weqtê dikirin di şehrî tehwîl

Nagah <sup>c</sup>ecayibek nima wan  
Yek cuz<sup>o</sup> ji <sup>c</sup>eqil qet nema wan

Dîtin di mehelle û zikakan  
Her kuçe û xurfe û şibakan

Şed taze ciwan ji rengê serwan  
Dîba û herîr û xez di ber wan

Panşed ji keç û kur û rewalan  
Ewçend ji qismê pîr û kalan

Enwa<sup>c</sup>ê muzekker û muennes  
Hindek di brehne hin mulebbes

Hindek di e<sup>c</sup>alî û ekabir  
Hindek di edanî û eşaxir

Pêxwas hinek hinek di serkol  
Kaşo ji piyan we ser wekî hol

Sermost hinek hinek di serxwes  
Dembeste hinek hinek di demkeş

Goyende hinek hinek di xamûş  
Pûyende hinek, hinek di medhûş

Hin camederîde hin di serxweş  
Hin ‘eqilremîde hin muşewweş

Hindan dikirin fixan û feryad  
Hin bûyî ji qeydê ‘eqil azad

Heryek di meqamekê dîgergûn  
Heryek bi cefayekê cegerxûn

Ew herdu, demek veman teheyyur  
Bûn xerqeyê licceyê tefekkur

Tacdîn sekinî û pirsiyar kir  
Pirsa xwe bi yêkê ixtiyar kir

Go »ey Xuđirê, rehê hidayet  
Bêj' ev ci bela ye bênihayet«

Wî got »du şehlewendê şeddad  
Îro li vî xelqî bûne cellad

Herçî ko dibînin ew du serxweş  
Fi l-ħali dikin weha muşewweş«

Wan go »te nedî ko ew ci reng in«  
Wî go »du kur in, ziyade şeng in«

Wan go ko »bi şîrê şesper in ew  
Ya ne bi xedeng û xencer in ew«

Wî go ko »bi xemze û bi awir  
Xelqê dikujin, wekî bi keybir«

Wan pirs dikir ko ger bibînin  
Da bo xwe bi merdî dest hilînin

Herdu di wî karî bûn ko nagah  
Dîtin ko ji mehîdê qudreti l-lah

Ew herdu puser wekî du peyker  
Tabende bi şeklê şahê exter

Yekhey'et û şekl û yeklibas in  
Emma di wî şehrî rengnenas in

Sîretmelek in şorperî ne  
Ne ba<sup>3</sup>i<sup>c</sup> in ew ne muşterî ne

Van herdu biran ko ew du ewbaş  
Dîtin dil û can we dan bi şabaş

Ewreng geriyan cunûn û waleh  
Êdî qe nebûn ji <sup>c</sup>eqlî ageh

Ne fehm û xired ne <sup>c</sup>eql û ne hûş  
Gêr bûn li ser zemînî medhûş

Fi l-cumle ji <sup>c</sup>eql û canî têr bûn  
Fi l-hali ji dûr ve herdu gêr bûn

Wan herdu firîsteê di kubbar  
Dîtin du melek ziyade dildar

Mehpare ne lêkin afitab in  
Dildare ne lê ceger kebab in

Tesbihê bi şeydê nîmbismil  
Bê şubhe gihane halê müşkil

Naçar bezîne ser şukaran  
Fekrîne ruxê di wan nigaran

Zanîn ko ne şeydê serserî ne  
Serxeylê sipahê dilberî ne

Wesstan û nezer kirin bi diqqet  
Wan hate bi qelbî rehem û riqqet

Elqışşe ji husnê van xezalan  
Rehmek kete qelbê wan rewalan

Sirra dilî kir bi hev te'elluq  
Nûra ruxê wan bi hev te'eşşuq

Mekşûfê teriqê aşinayî  
Rûhan qe nekir ji hev cidayî

Yekrengî sirfê 'alemê xeyb  
Zahir dikir ittiihadê lareyb

Hubbê we kirin bi hev giriftar  
Husnê we kirin bi hev telebkar

Te digo ko ci qalib û ci meqlûb  
Herçar ci ṭalib û ci metlûb

Bêşubhe yek in ci ten ci erwaḥ  
Ew muttehid in ci can ci eşbah

Hubba di dilan we kir ḥelawet  
Bux̬da di dilan we kir ḡedawet

Nisbet bi me ḥadiṣ in ḡedîm in  
Lêkin ji ḥeqîqeta qedîm in

Lewra ko cunûdê can mucenned  
Çêbûne di ḡilmê ḥeq muxelled

Hin mu'telif in hinek muxalif  
Hin muxtelif in hinek mu'alif

Wan mu'telifan bi yek ve ulfat  
Axir we kirin nema cu kulfet

Ye'ñî ko ewan kurê di xwînxwar  
Gava wehe dîtin ew birîndar

Ew herdu bi şed dilan ḥebandin  
Rûniştin û herdu wergerandin

Gavek seyirîn li bejn û balan  
Pêlek ḥeyirîn li zulf û xalan

Gotin »'eceb ev keçê di kê ne  
Yan herdu mela'ikê d' Xudê ne

Ev mêwe li kî cihî giha ne  
Ev gul di ci gulşenê nima ne

Serwê di çi cûbarekê ne  
Teyrê di çi murxezarekê ne«

Mawerd ji hêstirê di gulgûn  
Rihtin li ruxê di wan di pirxûn

‘Isqê kiribûn wisa nehişyar  
Qet<sup>c</sup>a nedibûn ji xwe xeberdar

Axir ko kirin bi xameya ‘esq  
Husna xetê wan li lewîhê dil meşq

Wan vî ko bizanin ew çi eşl in  
Lewra ko nizanin ew çi nesl in

Enguşteriyê di wan ciwanan  
Kêşan ji eşabi<sup>c</sup>ê d' xwidanan

Xatem ji enamilê d' xwe kêşan  
Danîne cihan ji boyî nîşan

Yaqût bi muhriyan guhorîn  
Elmas bi şûşeyê d' belorîn

Sersal û xweşî ji dest bi der dan  
‘Eyşê xwe bedel kirin bi derdan

Nagah ecanibin xuya bûn  
Nagam kirin weda<sup>c</sup> û rabûn

Man herdu bira wekî du şeydan  
Pabestê selasilan û qeydan

Rabûn ko şevek siyah û ḥarî  
Şems û qemeran kirî tewarî

Reh şubhetê murxê nîmbismil  
Bê quwwet û bê tuwan û bê dil

Sersam û dewwar û şer<sup>c</sup> û mehrûr  
Sewdafu'ad û xebl û mexmûr

Şed car diketine asitanan  
Hetta ko gihane aşiyanan  
Herçend gihiştine meqaman  
Emma ko li wan du telxikaman

Roj û şev û weqt û şubh û êvar  
Yeksan dinima li wan bi yek car

## 15. Ew dûxteşem herdu şahîn

Ew dûxteşem herdu şahîn  
Ew sûxteper Memo û Tacdîn

Xweş çûne şikarê kebk û qazan  
Nagah bi ser ve şubhê bazan

Nûrek fitilî li wan ji nageh  
Êdî qe nema ewan cu ageh

Hindî ko di heftiya hemel bûn  
Ew zêde di wehşî û xebel bûn

Ew hefte li wan ko bûye salif  
Xwekirdeyê işq bûn mu'âlif

Rabûne ve rojekê bi êk ve  
Fekirîne bi reng û rûyê êk ve

'Isqê kiribûn wisa mubeddel  
Wan êkdû nas nekir ji ewwel

Ewwel dikirin ji hev texerrub  
Paşê ko kirin bi hev teqerrub

Dîtin xwe bi paçebend û zingil  
Perwaz û firîn muhal û müşkil

Eskûfeke zulmetê bi ser da  
Celfûyeke ulfetê bi ber da

Bête<sup>c</sup>me û bêşerab û bêçav  
Bêmeqşed û bêmurad û bêgav

Mestane ji rengê çeşmê dildar  
Mexmûr û siyah û mest û bîmar

Manend-i dihan yarê dilteng  
Nalîn ji reha dilî wekî çeng

Gotin »<sup>c</sup>eceb em ko bûne bîmar  
Ya bûne di kî şerî birîndar

Ya ne wehe em çira nikarîn  
Mecrûh û de<sup>c</sup>if û dilfikar ïn«

Evrengehe wan dikir tefehhus  
Mahiyyet-i ھالە xwe tecessus

Tacdîn fekirî di dest birayî  
Tîsit guherek wekî cirayî

Yaqûteke müşlê daneyê nar  
Miş<sup>c</sup>elşifet e ji bo şeva tar

Manend-i şemalê ew tiîsî  
Hekkakî bi navê »Zîn« nivîsî

Destê xwe dirêj kirî ko bînit  
Da qenc nezer bikit bibînit

Mem jî fekirî di destê Tacdîn  
Elmaseke bêbiha û texmîn

Lê ismê »Sitî« kirî kitabet  
Ustadekê şahîbê meharet

Şerraf eger bibîte Buqrat  
Texmîn bikitin bi wezn û qîraṭ

Bazar bikit ji bo Filaṭûn  
Mecmû'ê xeza'inê di Qarûn

Şemna şemenê di wan nigînan  
Nabit bi wuqûfê dûribînan

Mayin di te'ecceb û teheyur  
Daman û gelek kirin tefekkur

Zanîn ko şewahîbê nigînan  
Herçî kirî kir Sitî û Zînan

Roja weko bûye 'îdi tehwîl  
Ew jî geriyane cametebdîl

Çawa xemilîne ev keçanî  
Ew jî geriyane cil kuranî

Ew bûn ko me go di roz-i newrûz  
Mişlê Meh û Mihrê 'alem-efrûz

Ew herdu ne ê di dest vemiştin  
Ew herdu ne ê di xel dikuştin

Ew bûne di şehrî bûyî cellad  
Ew bûne ko xel ji dest bi feryad

Ew bûne ko van bi dil ھebandin  
Ew bûne li van ceger kewandin

Wan herdu biran bi ‘eql û texmîn  
Bê şâ’ibe qatilê xwe zanîn

Tacdîn li nik hebû şu‘ûrek  
‘Isqê di wî hiştibû quşûrek

Go »rabe bira ji nav nivînan  
Bes ah-i bike ji ber birînan

Em şêr in û ew di xwe ҳezal in  
Pir ‘eyb e ko em ji dest binalin«

Mem puxteyê ‘isqê bû temamî  
Got-ê ko »bira meger tu xam î

Da ژen nebirî mucessem im ez  
Ser ta bi piyan muquessem im ez

Ev cisim li min bûye muxeṭṭet  
Ew xeṭ hemî bûyîne muneqqet

Te’sîr û rengê ‘isq û wemqan  
Bi-ṭ-ṭûl di ṭûl û ‘erđ û ‘umqan

Yek nuqte nehin ji derd-i xalî  
Hêja tu dibê çira dinalî

Dil bûye mehellê <sup>c</sup>işqê ḥala  
Vî ḥalî divê mehellê vala

Nîne <sup>c</sup>eceb er bibêm hulûla  
Min maye ji şûretê heyûla

Şahinşehê <sup>c</sup>işqê bê ḫered hat  
Cewher veşirî dema <sup>c</sup>ered hat

Ev ḥal û mehell û cism û cewher  
<sup>c</sup>İşqê ji xwe ra kirin musexxer

Can û ceger û dil û hinavan  
Dest û ser û pê û pişt û çavan

Wellahî yekê nemaye rahet  
Billahî yekê nemaye ṭaqet

Bizdandine wan ji min <sup>c</sup>ela<sup>c</sup>iq  
Bi-l-cumle dibên ko nehnu <sup>c</sup>aşıq

Napırsî li ḥalê min tu ȝalim  
Hêja tu dibêjî ez nenalim«

Evrengehe wî ko kir tezellum  
Tacdîn qe nema ji bo tekellum

Ew mane digel evan birînan  
Behşâ me li ser Sitî û Zînan

## 16. Ew jî vegeŕin bi wî libasî

Ew jî vegeŕin bi wî libasî  
Hađir şeliyan ko kes nenasî

Herçend-i kirin libas-i tebdîl  
Emma nedibûn ji halî tehwîl

İşqê kiribûn wisan mubeddel  
Êdî nedîçûne halê ewwel

Qeṭ kes nedigo Sitî û Zîn e  
Xelqê we dizanî ecnebî ne

Dayîneke wan hebû zemanî  
Teşbîhê belayê asimanî

Zala felekê li ber zebûn bû  
Wê nav ji pîrê, Heyzebûn bû

Ew hat-i ji xefletê bi ser da  
Fekrî ko cilê di wan di ber da

Rûniştine bêmezaq û meşreb  
Winda kirine zeqen di xebxeb

Ye'ñî di teheyur û melal in  
Mehpare di haletê webal in

Cilwa bûyî cewcemê di taze  
Rengê semenê bi cayê xaz e

Kafûr mişil ‘izarê qanî  
Şorgul geriyane ze‘feranî

Zanî ko perî di bêlibas in  
Mehbûbê mehebbetê ‘unas in

Go »ey hewesa dil û hinavan  
Heryek ji we rohniya du çavan

Hafız ji we ra meger Xwidê bit  
Canê me ji bo we ra fidê bit

Hon hinde muqeyyed in di qeydê  
Îro bi tenê ko çûne şeydê

We zû şemirand ji bo ci sersal  
Hon rast bibêñ ku bûye ehwal?

Bêjin ko muqeddime ci reng e  
Ev hîret e ya xiyal e beng e

Hon bo ci hêzin in ey meşaya  
Nînin çu netîce bê qedaya

Hon bêjine min ku bû qediyye?  
Kengê li me xef dabit xebiyye

Ez dê nihe remlekê birêjim  
Ismî û ɬemîrî ez bibêjim

Yan şûşe û mendela xwe danim  
Mahiyyetê ھالî dê bizanim«

Wan gotine daye<sup>3</sup>ê nihanî  
Em şubhe ko çûne der ji xanî

Herçî li me bû duçar û peyda  
Hadîr geriya cunûn û şeyda

Axir ko ji heddî çûye der cor  
Cewrê li me aqibet nima dor

Em jî geriyan melûl û mexbûn  
Hatîne ve em xefîf û mecnûn

Dayîn bi teennî û tewella  
Çû bal ve, daye wan tesella

Go »hon bi cemalê şehriyar in  
Heryek ji we şah û xundikar in

Kî bit ko nebit muṭî<sup>c</sup> û muhtac  
Kî bit ko nedit we bêteleb bac

Herçî we ھebandî ey perîzad  
Husna we dikit ji bo we munqad

Xasma di vî şehrî bit we dildar  
Ez dê wî bikim niha xerîdar

Bêjin kî ye da biçim bibînim  
Hadîr bikirim ji bo we bînim«

Wan gotine Heyzebûnê sahir  
»Derdê li me ey têbîbê mahir

Bêşubhe dewa ji dest te têtin  
Teqrîr eger ji dest me bêtin

Teqrîr û edakirin mehal e  
Tedbîr û dewakirin betal e

Hindî hene kîj û kur di Buhtan  
Belkî di cemîcê bejn û buhtan

Kes nîne bi lutf û ھusnê meshûr  
Illa ko di deftera me mestûr

Ye'ñî hemî rû bi rû me dîne  
Hindî di vî şehrî ademî ne

Îrohe du keç xeriqê şiba  
Ser ta bi qedem debîq û dîba

Zîbende ji şiklê şahê xawer  
Tabende ji rengê mahê enwer

Nageh li me bûn duçar û zahir  
Gêr bûn ji dûr ve herdu nadir

Em çûne bi ser binên ko kî ne  
Fekrîn ne wek me ademî ne

Tehqîq melek we ya perî bûn  
Lewra ko li av û gil berî bûn

Gava ko me dîtin ew perîzad  
Em jî geriyan ji ^eqil azad

Ew herdu wekî du camê Cemşîd  
Em herdu müşalê Mah û Xurşîd

Gava weko pêk ve bûn muqabil  
Mişbah û zucac bûn mu^adil

Qarûre ji necmê mun^ekis bû  
Nûrek me bi qelbî muqtebis bû

Qendîl û fitîle ger ji wan bû  
Agir ji ruxê me herdiwan bû

Zeytê me û agirê me dîsa  
Ber bû me we dil me pê eyîsa

Şohtîn xwe bi xwe nizan ci hâle  
Hişyarî ye, xewn e, ya xeyal e«

## 17. Dayîn heyirî ji macerayê

Dayîn heyirî ji macerayê  
Go »ey rûh û qalibê di dayê

Hon çûne teferruca rewalan  
Fariş ji te'essoqua xezalan

Şiklê ko we dîtî bêmeal e  
Meyla we bi qismê jin mehal e

Meyla beşerî beşer divêtin  
Emma we keçan puser divêtin

Keç qeṭ li keçan dibin xerîdar  
Bê neqdê kuran mehal e bazar

Kur ayîneyê cemalê zat in  
Keç mežherê pertewa şifat in

Bê zat û şifet 'ered mişal e  
Cewher nebitin 'ered betal e

Qa'im dibilitin 'ered bi cewher  
Bê şemis qemer dabit munewwer?

Meyla ji ruxê kuran berî bit  
Şed car-i ko hörî û perî bit

Ew meyl ko dê bikit we meftûn  
Ew Leyl ko dê bikit we Mecnûn

Mecnûn ko nebit <sup>c</sup>edîlê Leylê  
Leylê ku dikit bi Leyl meylê?

Gul qet li gulan dibîte <sup>c</sup>aşıq?  
<sup>c</sup>Ezra xwe bi xwe dibîte Wamiq?

Xwisrew nebûya siwarê şebdîz  
Şîrîn li şekir dibûye Perwîz?

Ferhad cûwa sîrîşkê pîrxûn  
Neyna nedidî siwarê gulgûn

J'ewçendehe <sup>c</sup>alema ricalan  
Begzade û sade û rewalan

Dil qeṭ we nebit bi kes ve ma<sup>c</sup>il  
Kîjin di edanî û eražil

Bê nam û nişan û xeyri me<sup>c</sup>rûf  
Qelbê we bi wan ko bûye meşxûf

Ev emre bi min qewî meħal e  
Ev xewn e we dîtî ya xeyal e«

Zînê ko bihîstin ew me<sup>c</sup>anî  
Ev nexme ji perdeyê deranî

Evrenge gote dayeya pîr  
»Xalib te nemaye <sup>c</sup>eql û tedbîr

Te d'go ko bi de<sup>c</sup>wet û <sup>c</sup>eza<sup>c</sup>im  
Halê ko xefî bitin dizanim

Siklê ko me dî ne bêmeal e  
Tehqîq e ne xewn e ne xeyal e

Wan ger melek û eger beşer bûn  
Ger qismê nisa û ger puser bûn

Enguşteriyê di wan evan e  
Înane me wê ji bo nişan e

Remlê tu bi rast eger dizanî  
Xatem ev e dê bizan xwedanî«

Wê şehleya hîlekar û cazû  
Go »bîne ji bo me xateman zû

Da işeve remlekê birêjim  
Hetta şibe şahîban bibêjim«

Hadîr Sitiyê nigîn deranî  
Da destê <sup>c</sup>ecûzeya zemanî

Zînê wehe gote Heyzebûnê  
»Min dil bûye werþeyek ji xûnê

Gava weko werþe tête coşê  
Weqtê ko dikit bikit xuroşê

Teskîn dikit ev nigîn dilê jar  
Dem dem ko didim di çeşmê xwînbar

Zinhar eger dibî nigînê  
Zû bîne ve bo me dilhezînê

Lewra bi wê ye me şebr û saman  
Ew bo min e xatema Silêman«

## 18. Wê delleyê bêfeşal û muhtal

Wê delleyê bêfeşal û muhtal  
Şubhî xwe gihande pêşê remmal

Zêrek du birin di dest xwe bo pîr  
Evrengehe kir ڦemîr-i teqrîr

Go »min du kurik heyin di meşûm  
Bêbab û yetîm û jar û mehrûm

Roja weko bûye ڦîd û sersal  
Ew jî bi terîqê ڦebê etfal

Rabûne ve herdu çûne geştê  
Xûlan څeliştibûn li deştê

Îrohe dema ko bûne peyda  
Dîn in teles in cunûn û şeyda

Hatîne ve bêlibas û ڦazî  
Geh geh dikirin fişan û gazî

Bêhiş dikevin gelek dimînin  
Gava weko radibin di dîn in

Ev xateme ne ewan di dest in  
Goya tu dibê bi van di mest in

Ey waqifê remz û kaşifê raz  
Bêçare me ez tu çareperdaz

Ihsan bike qenc jê xeber de  
Kanî şebiyê di min ci derd e

Mecnûnî ye şer<sup>c</sup> e ya hewa ye  
Çawa meredj e ci bo dewa ye

Ey murşid û pêşewayê muqbil  
Hellalê <sup>c</sup>uqûd û hellê müşkil

Sirrek heye wê di van nigînan  
Peyda ye li nik we dûribînan

Eşhabê nigîn bibêje kî ne  
Cinnî ne, perî ne, ademî ne«

## 19. Ew warisê ‘ilmê daniyalî

Ew warisê ‘ilmê daniyalî  
Gava fekirî di şeklê falî

Fi l-ħali di reħmê ummehatan  
Bê wed ċê tewelluda nebatan

Leħyan û neqî bi yek ve dîtin  
Tacdîn û Sitî bi yek ve dîtin

Şiklê fereħē digel ҳemê dî  
Bēperde wî Zîn digel Memê dî

Evrengehe gote qaṣida pîr  
»Meqşûd bi mekr û kiżb û tezwîr

Ma qeṭ dibitin ji bo te ħasil  
Bê rastiruwî meħal e menzil

Te digo ko kurê di min di dîn in  
Nabējiye min Sitî û Zîn in

Roja weko çûne geṣt û seyran  
Wan dîne li rē du dîdeħeyran

Ye ċnî du kurê di serwiqamet  
Rabûye li wan kuran qiyamet

Fi l-ḥali evan du afitaban  
Dil çûye ve bal du mahitaban

Ew bûne ji ḫisqê van di bêhûş  
Ev bûne ji ḥusnê wan di medhûş

Ev şîftekê belayê ḫisq in  
Ev teşneyê Kerbelayê ḫisq in

Ev xatem yê di wan kuran in  
Van jî du nigîn di destê wan in

Çawan xemilîne ev kuranî  
Ew jî geriyane cil keçanî«

Pîrê wehe gote şêxê remmal  
»Min şubhe nema di keşfê ehwal

Lêkin tu bibêje ew ci eśl in  
Qenc keşif bike ko ew ci nesl in

Begzade ne ew ḫalîmeqam in  
Cundîneseb in weya ḫewam in«

Şêx go ko »di dînê ḫisqibazî  
Beyek heye ew dibêñ terazî

Bê şerṭê kefa'etê rewa ye  
Şerṭê mute'aqidan riđa ye

Xasma ko kurê di van bijarî  
Durdane ye êk û êk mirarî

Begzade ye yek ji neslê mîran  
Yek jî bi neseb kurê debîran«

Wê sahireyê ji bo nişane  
Dîsan xeberek kire behane

Go »<sup>c</sup>aşıq û mubtela û dînan  
Meftûn ji bo Sitî û Zînan

Ew nabine qabilê hisaban  
Naguncine defter û kitaban

Şêxim, tu dizanî ev Cizîr e  
Têk da kubera û kurd e mîr e

Ihsan bike perdeyê hilîne  
Ew herdu melek bibêje kî ne

‘Ehda me webit tenê bibînim  
Çil zêrî biçim ji bo we bînim«

Şêx go »tu here bibîn wişaşan  
Teftîş bike cih û wişaşan

Herçî ko dibêjin ew <sup>c</sup>elîl e  
Ew <sup>c</sup>ille ji bo te ra delîl e

Binimê xwe bi şûretê tecrübe  
Bêperde dibînî wan hebîban

Gava ko te dîtin ew melekwar  
Keşf e ji qumaşî ra xerîdar

Xaşma ko di destê wan nigîn in  
Menqûş li wan Sitî û Zîn in«

Rabû ve ‘ecûze şubhê Luqman  
Ser ta bi qedem dewa û derman

Qarûre û huqqe neşter û kîs  
Hilgirtin ewa xebîşe telbîs

Danî paxila xwe çend kitêbek  
Din’ma bi hekîmekê ‘ecêbek

Hadîr xwe gihande pêşekaran  
Fi l-ḥali bûye nedîmê yaran

Wan go »tu ji kû ve tê, ci pîr î  
Xalib tu ji ‘ilmekê xebîr î«

Go »gerçi ko ژahirî hekîm im  
Zêde bi du ‘illetan ‘elîm im

Za’îl dikim ez qewî du janan  
Derdê bedenan û derdê canan«

Wan go »tu ji bo me ra xeber de  
Derdê ko li can-i bit ci derd e«

Wê got-i ko »hon meger nebînin  
Wî derdî ‘elametin nehîn in

Ew derdekê zêde bêmecal e  
Şihhet ji wî derdî ra mehal e

Dûr bit ji we ew gelî rewalan  
Ew berq e di şûretê şepalan

Gava vedidit wekî birûsk e  
Bêşu<sup>c</sup>le û pêt û bêçirûsk e

Bêcurhe û qerhe û birîn e  
Navê li wî derdî her evîn e

Emma we dişojitin hinavan  
Xwîna dilî tê ji herdu çavan«

Wan gotine wê ko »xeyri meqdem  
Hala nexweş in ji me du hemdem

Ihsan bike herdiwan dewa ke  
Derman ke bi new<sup>c</sup>ekê tu rake

Herçî tu dibêjî em wisa kîn  
Herçî tu dixwazî em eda kîn«

Pîrê xwe gihande nik merîzan  
Weqtê fekirî di wan <sup>c</sup>ezîzan

Wê gote bi hemdem û delîlan  
»Tenha mebihêlin û <sup>c</sup>elîlan

Da ez bikirim vî derdî teşxîş  
Paşê bikim ez dewayê telxîş«

Hevrê hemî çûne der ji ba wan  
Pîr ma û tenê digel du lawan

## 20. Bîmarê bi derdê ‘îşqê bedħal

Bîmarê bi derdê ‘îşqê bedħal  
Nageh fekirîn ko çûne haval

Rûniştî ji pêş-i wan ve zalek  
Qametçiviyayî rengħilalek

Aheste kelamekê dibējît  
Digirîtin û hêtstiran dirêjît

Gotin »çi kes î tu ey dilaram  
Bo çi digirî weha bi nagam«

Wê go bi serê Sitî û Zînê  
Mehħda ji we ra dikim girînê

Mexşûş ji nik Sitî û Zînan  
Hatim li we xweş bikim birînan

Enguşteriyê di we evan e  
Înane me wê ji bo nîşan e

Hon hilgirin û bidin nigînan  
Bednam mekin Sitî û Zînan

Ez qaşid û hon ji bo me meqşûd  
Hon min mekin ê murad-i merdûd«

Ev mijde ewan dema kirin gûş  
Yekcar-i ji şahiyan nema hûş

Hişyar-i ko bûn demek newestan  
Fi l-ḥali bezîne pê û destan

Tekrar li dest û pê û dawan  
Şed bûse didan ewan du lawan

Dayîn ھeyirî ji iştıyaqê  
Berda giriyê jiiftiraqê

Go »xem mexwin ey murad û meqşûd  
Mizgîn ji we ra bi ھeqqê me'bûd

Tewfiq refiq bit ji barî  
Ez dê we bikim bi sihirkarî

Hon cumle li 'erdekê cema bin  
Herçar-i bi meqşeda xwe şâ bin

Nam û neseba xwe hon 'eyan kin  
Sirra dilî bo me ra beyan kin

Da ez vejerim bi van nigînan  
Tesxîr bikim Sitî û Zînan

Te'cîlê bikim ji bo şewabê  
Zû bême ve ez digel cewabê«

Tacdîn nigîn ji dest deranî  
Da destê 'ecûzeya zemanî

Mem tê fikirî ko bê nigînê  
Kengê dikitin medar û jînê

Go »daye, tu min bidêre me<sup>c</sup>zûr  
Kî canî didit ji dest xwe destûr

Ev xateme ism e, ger ȳilism e  
Min can ew e, qalibê me cism e

Ey daye, tu qaşidê hebîb î  
Bêşubhe li derdê min ȳebîb î

Şedqe<sup>’</sup>ê ser zi-l-cemali Zînê  
Mestîne ji destê min nigînê

Gava tu diçî ve ey wefadar  
Evrenge ji min bibêje dildar

Ew şah e egerçi ez geda me  
Elṭafê şehinşeha ne, <sup>c</sup>am e

Ez bende ne la<sup>’</sup>iqê wişal im  
Xursend-i bi şûretê xiyal im

Rađî me ji ewqeder cemalê  
Min bînite xelweta xeyalê

Her gah ji ahê dil biṭirsit  
Geh gah li ḥalê min bipirsit«

## 21. Ew herdu nihalê ‘er‘era şeng

Ew herdu nihalê ‘er‘era şeng  
Rûniştî mişalê ҳunçe dilteng

Çeviyayî, bi fîkr û sernîşîvî  
Herlehze ji dayeyê bi hîvî

Mexmûrê ҳebûqê bênihayet  
Muştaqê şebûhê bûn bi ҳayet

Dîtin ko ji nagehî տebîbe  
Wê hat-i bi şûretek ‘ecîbe

Zîn û Sitiya ji ‘isqê medhûş  
Wan daye kirin rewan der aχûş

Gotin »bi Xwidê kî ey dilaram  
Aya te kirîne ew melek ram

Remla te çi go, perî te zanîn  
Yan herdu di şûşeyê te anîn

Tîra li me kun kirî siwêda  
Aya te beyan nekir ko kê da«

Wê go »bi serê we yê mubarek  
Şed car-i qesem dikim, ne carek

Ez hatime vê demê ji ba wan  
Emma guneha mi tê bi lawan

Herdem ko Sitî û Zîn dibêjin  
Şed reng sirişkê xwîn dirêjin

Qurbana we bim bi vê kemalê  
Ew herdu beşer bi wê cemalê

Çawa we bijarin ew du mumtaz  
Zîbendeyê weşl in ew serefraz

Wellahî qesem dikim bi barî  
Ew herdu durê d' we bijarî

Nabin di çu ber û behr û kanan  
Nînin we melek di asiman'an

Ew herdu ji bo we ra seza ne  
Mîrza ne eger we ger geda ne«

Ew delle bi dil we bûye delal  
Dildade ji pêş ve man demek lal

Zîn û Sitiyan nema di dil hûş  
Gava ko ewan kir ev xeber gûş

El-qışse ji kunhê macerayê  
Hişyarî ko dayeyê didayê

Agir te digo gihande neftê  
Pêt jê diçû asimanê heftê

‘Isq agir e ten çiyayê Tûr e  
Dil ew şecera bi nar û nûr e

Muşkat e qefes qebes çira ye  
Can zeyt e, fitîl-i wê xefa ye

Dil şûşe ye, ew çira di nav e  
Sir cuz’ e, di kulli da belav e

Bi-l-kul ji serî hetta bi eqdam  
Şohtin bi wî agirî dilaram

Gotin »ji me ra tu dilnewaz î  
Ey daye, ji bo me çaresaz î

Dehqan tu yî em wekî nihal ïn  
Ezman tu yî em bi xwe di lal ïn

Ger lehzekekê nekî tu guftar  
Ger sa’etekê nebî tu ҳemxwar

Em dê weko xar û xes heba bin  
Em dê weko berg berhewa bin

Ey waqifê waqi’atê dêrîn  
Em ҳeyri te mehreman nedêrîn

Tacdîn û digel Memê te gotî  
Perwane ne per li wan me şotî

Ew jî nuhe pir di intîzar in  
Belkî ji me zêdetir niçar in

Rabe here zû bibêje Tacdîn  
Ger dê te Sitî bivê, Memê Zîn

Mizgîn ji we ra, me hon qebûl in  
Em jî ji we zêdetir melûl in

‘Isqa we celew ji me reva ye  
Manî<sup>c</sup> li me perdeya hîeya ye

Ew perde ji bo we ra ‘edîm e  
Bêperdeyî bo we ra qedîm e

Xwazgîn û wesa<sup>’</sup>iṭ û wesîle  
Herçî ko ji ba we bêñ cemîl e

Evrenge bibêje wan hebîban  
Mecmû<sup>c</sup>ê mewalî û xetîban

Hindek ji we ra bibin ricaçî  
Hindek ji me ra bibin di<sup>c</sup>açî

Belkî kiribit Xwidê muqedder  
Weşla me û we bîbit tuyesser«

## 22. Xweş weqt e ji bo 'elîlê muştaq

Xweş weqt e ji bo 'elîlê muştaq  
Xaşma ko ji bo qebîlê 'uşşaç

Dermanekê şîhîhet û şefayê  
Mizgîn û besareta wefayê

Nageh bigihîte wan ji durdan  
Azade bikit ewan ji derdan

Ew daye ji rengê Eristetalîs  
Ser ta bi qedem libasê telbîs

Dîsan ketî şûretê şebîban  
Hadîr xwe gihande nik hebîban

Ew mijde wekî me gotî, gotin  
Ew şûretê wekî neşotî, şotin

Emma bi wî agirî we geş bûn  
Te digo qe nexweş nebûn di xweş bûn

Goya ko ewan ji dest Filaṭûn  
Xwarin bi yeqîn dewa û me'cûn

Rabûne ve çûne nik hevalan  
Çendek ji meharim û rewalan

Agah kirin ji macerayî  
Rabûn bi te'essşub û tebayî

Gava ko ewanbihîstî mîzgîn  
Hay dan bi tebayî xelq û xwazgîn

Hindek 'ulema û hin di 'adil  
Hindek umera û hin di cahil

Rabûne ve cumle çûne nik mîr  
Evrenge kirin qediyye teqrîr

K'ey waliyê mulk û mal û millet  
Wey hamiyê dad û dîn û dewlet

Tu sayeyê lutfê girdegar î  
Îro li me şah û xundikar î

Şah î nezera te kîmiya ye  
Mah î eşera te pirdiya ye

Herçî te vexwend ew 'ezîz e  
Herçî te nexûd bêtemîz e

Herçî te kire cirax û geş kir  
Ger halxirab e jî te xweş kir

Tacdîn egerçi mîriza ye  
Nisbet bi te bende ye geda ye

Hatin ko bikin ji dil di'ayê  
Fi l-cumle dikin ji te ricayê

Tacdîn Sitiyê ji te dixwazit  
Ew qul bi çiraxiyê dinazit

Ew bende ye wî bigêre azad  
Zîbende ye wî bidêre damad«

Mîr go ko »heçî we dît-i la'iq  
Elbette ji bo me ra ye fa'iq

Herçî ko wekîl e bêt û rûnit  
Mewla kî ye xuþbeyê bixûnit

Eqda Sitiyê me kir li Tacdîn  
Icabe ev e qebûl e amîn«

Fi l-ħali Çeko bezî û pê mîr  
Teqbîl-i kir û qebûlê teqrîr

Mecmû'ê mela û şêx û mîran  
Axa û ekabir û feqîran

Vêk ra bi devê xwe wan şena kir  
Têk da bi dilê xwe wan di'a kir

Mîr go »biquṭin def û rebaban  
Bînin hemî şerbet û şeraban

Da bezmeke şadimane danîn  
Îrohe ko şubhe em nizanîn

Dê şubhetê vê demê di xweş bin  
Ya dê bimirîn we ya nexweş bin

Hibla ne leyalî, ey mewalî  
Kanî ci dizên ‘ele t-tewalî

Ev şîwen û şahî teweman in  
Ev çerx û felek di bêeman in

Geh nûrnima ne gah mezlem  
Geh sûrnima ne gah matem

Gava ko dibînî weqtê ‘uşret  
Da fewt nekî zeman-i furşet

Lewra ko zeman mişalê şîr e  
Nabêjitin ev mela ye, mîr e

Îrohe ji bo riðayê Tacdîn  
Min jî ji xwe ‘ed bikin bi xwazgîn

Evçende zeman e ew җulam e  
Da’im di җulamiyê temam e

Ew hinde di xidmeta me da bû  
‘Emrê wî di ber me da fena bû

Şerî e di şerî‘eta wefayê  
Em jî ji wî ra bixwîn cefayê

Îrohe di xidmeta wî rabîn  
Bi z-zati di xidmeta wî da bîn

Mîrê wehe kî bitin ko canî  
Şabaş neditê bi şadimanî

Ger min hebitin hezar û yek ser  
Wan cumle di rojekê bi defter

Ger ez nekirim fida bi carek  
Mîrînî li min nebit mubarek«

Tacdîn ko di xidmeta emîr bû  
Çeşna wî di dest û çâşnegîr bû

El-qışse bi şewketa xwe ew mîr  
Rabû bi xwe bûye çâşnigîr

Kêşa wî bi meclisa xwe xwanek  
Goya kire ferş asimanek

Qurşê meh û mihrê asimanî  
Înan te digo bi cayê nanî

Ev lengeriyê di zîv û zérîn  
Şubhet felekê di jor û jérîn

Her şehnê mezin müşalê bircek  
Serpoşê li ser ji rengê durcek

Her tebsî û kaseyê di fexfûr  
Yek exterê pirdiya yê pirnûr

Cedy û Hêmelê di asimanî  
Biryân û kebabê meyhimanî

Her kase û tebsiyek yek enbar  
Serşar-i şebîhê nefşê emmar

Enwa<sup>c</sup>ê te<sup>c</sup>amê çurp û şirîn  
Elwanê xida û nuqlê rengîn

Van meşrebe û eyaxê çînî  
Dewran dikirin bi nazenînî

Seyyare şifet bi geşt û seyran  
Herçî ko didî dimayî heyran

Narinc û turinc û nar û lîmo  
Nûbaweyê şaxisarê mîno

Fanîz û nebat û qend û şekker  
Mawerd û zabad û misk û <sup>c</sup>enber

Hindan dikirin me<sup>c</sup>ide ҳaze  
Hindan dikirin dimax taze

Mecmer geriyan bi <sup>c</sup>ûd û <sup>c</sup>enber  
Bûn cümle meşamê can mu<sup>c</sup>etter

Ramîşger û xweşnewa û xweşdeng  
Şayeste û xweşqumaş û xweşreng

Hevdeng hinek bi şewtê sazan  
Hemdeng hinek bi fexr û nazan

Mexnî û kemançe <sup>c</sup>ûd û tênbûr  
Çeng û def û şurna û şentûr

<sup>c</sup>Uşşaq û newa, <sup>c</sup>iraqî û ewc  
Vêk ra dikirin bi rastî zewc

Awaze û şu<sup>c</sup>be û meqamat  
Bêperde bi mu<sup>c</sup>ciz û keramat

Zahir ko dibûn ji nayê gerdan  
Xaretgerê <sup>c</sup>eql û dîn û îman

Saqî şewişîn bi abê engûr  
Muṭrib herişîn bi şeytê şentûr

Qewwal û muxennî û ҳezelxwan  
Mexmûr û siyah û mest û sekran

El-qisşe li rexmê seb<sup>c</sup>i şidad  
Danîn bi wî resmî <sup>c</sup>urs-i binyad

Xeṭṭaṭê felek ji dest qelem ket  
Celladi dikir ko wî qelem ket

Nahîd bi <sup>c</sup>erdê da dida çeng  
Meh çû veşirî di Bircê xerçeng

Keywan di Delwê da nihan bû  
Bercîs di Hûtî bênişan bû

Dinya hemî bûye <sup>c</sup>eyş û <sup>c</sup>uşret  
Zala felekê ji kerb û hesret

Cu j'dest nedihat û maye <sup>c</sup>aciz  
Naçar-i <sup>c</sup>ecûze bûye Kadiz

Şeyxûxeyê çerxê rengsemawî  
Rehwar-i sema<sup>c</sup>i kir rehawî

‘Alem hemî bûye ‘uşretabad  
Şehrî û bedewî, ‘ebîd û azad

Mustexreqê ni‘met û tereb bûn  
Mustecme‘ê şahî û le‘eb bûn

Rabû ve ko xwan ji ber xewaşan  
Saqî geriyan bi cam û kasan

Mîr xwendine pêş Memo û Tacdîn  
Go »çerx-i li min Memo tu şûşbîn«

Ew herdu kirin temamî melbûs  
Rabûn bi edeb etek kirin bûs

Rûniştin û pêk ve wan vexwarin  
Ewroj bi yek ve rabiwarin

### **23. Weqtê weko nû'erûsê Xwîrşîd**

Weqtê weko nû'erûsê Xwîrşîd  
Neh qubbe mişalê cam-i Cemşîd

Fi l-cumle kirin bi rux mucella  
Goya ko kirin bi zêr muṭella

Meşşaṭe û daye û perestar  
Işqê kirî cumle germibazar

Çûn zeyn bikin Sitî û Zînan  
Nazende bikin du nazenînan

Ewwel fekirîn di zilf û xalan  
Dîtin ko dilan dibin bi talan

Gava fekirîn di qewsê ebrû  
Bûn şubhetê wesme jê siyehrû

Fekirîne ruxê di wan di taze  
Şermende dibûn bi cayê xaze

Qadir nedibûn ji surmeyê reş  
Ahûyê xeten bikin muşewwes

Ser ta bi qedem ji rengê şane  
Şed se î kirin ji bo behane

Mehđa ji du ahûyan yek ahû  
Wan seh nekirin heta serek mü

Illa sermûyekê miyan bû  
Ew jî bi meşel ne ten, ne can bû

Qet<sup>c</sup>a ji mexafeta şikestin  
Qet lê kemerek nehate bestin

Kes dil nedida çu lê bibînit  
Belkî ko ji nazikî şikînit

Ma dest dida ko dest û pence  
Henna bikitin bi rengê rence

Neqşê ko Xwidê kirî muxeyyer  
Kî qadir e wî bikit muxeyyer

Axir geriyan ji rengî me'yûs  
Ew man û hena û reng û pabûs

Zînet ji qedê di wan hebîban  
Bexşîne zemîn têla û şîban

Ferxunde kirin bi ferqê efser  
Tabende kirin bi tacê gewher

Serlewheyê şefheyê müşenner<sup>c</sup>  
Zîbende bi zîwer-i mureşş<sup>c</sup>

Pîraye ji rewneqa cemalê  
Bû hale li xermenâ hilalê

Elmas û zumerred û merarî  
Xal û xet û turreyê di tarî

Manend-i kitabê şâ'iran e  
Mewdû' bi wedî'ê xane xane

Ev rewneqê 'aridî û ژatî  
Bû nusxeyê sihr û mu'cizatî

Ebyat bi cem'ê bûne dîwan  
Ayat bi şun'ê bûne Qur'an

Ew şun'etê ustadê muşleq  
Herçî ko didî digo »huwe l-heq«

Tezyîn ko temam bû li bûkan  
Ayîn kete çarsû û sûkan

Enwa'ê tecemmûl û melabis  
Elwanê cewahir û nefâ'is

Şed cariye û dused benî çûn  
Zerbeftilibas û zerbenî çûn

Naqe bi qîtar û dur bi qençtar  
Yaqût bi bar û zêr bi xerwar

Xaric ji te'edduda hisaban  
Xariq li teqeyyuda kitaban

Nedihate te'eqqul ev cihaze  
Nedibûn mutehemmil ew cemaze

Vê debdebeyê we kirine <sup>c</sup>aşiq  
Bû zelzele rakirin xelayiq

Şehrî, ji muzekker û mu'ennes  
Fi l-cumle muzeyyen û mulebbes

Teşbîh-i bi behrê pir temewwuc  
Cunbuş dikirin şered teferruc

Nageh geriya bi Cûdî meftûh  
Dergahê kerem li keştiya Nûh

Ye <sup>c</sup>nî ko <sup>c</sup>imareta Sitî tê  
Qeşra periya bi rasitî tê

Her texte ji <sup>c</sup>ûdê şendelûsî  
Textek xetebendê abenûsî

<sup>c</sup>Erşek ji cewahiran mureşşe<sup>c</sup>  
Belqîs celîs û lê murebbe<sup>c</sup>

Dest bestî ji pêş ve pêşekaran  
Durrînkemer û guherguharan

Şed Aşef-i berxiya wekî ba  
Hemmalî dikir bi <sup>c</sup>erşî dilşa

Hilgirtine ser serê xwe ew mehd  
Dest dest direvand ji hev bi şed cehd

Ew textirewan wekî gemî bû  
Behra ko bi ser ket ademî bû

Beğrek ji hewa ko bête coşê  
Naçar ji dil dikit xuroşê

Xelqê cihî cumle <sup>c</sup>aşıqan e  
Perwane û şem<sup>c</sup> der miyan e

Şofî û mela feqîr û paşa  
Vêk ra li teferruc û temaşa

Xelqê ko ji dest xeman bi feryad  
Ferdek qe nema nebûyî dilşad

Her berderekê şemaşeyek lê  
Her mecmê ekê temasşeyek lê

Te digo ko <sup>c</sup>erûs <sup>c</sup>eynê can e  
Lew bûne beden li pey rewan e

Sazan mirî hey kirin wekî şûr  
Kûs û def û kerrena û naqûr

Şabaş û şeda û gaze-gazan  
Guhdar-i xenî kirin ji sazan

Vêk ra ko şeda ji wan bi derket  
Qesra felekê şeda bi ser ket

Ev <sup>c</sup>eyş û neşat û şadimanî  
Nadîde bi dîdeyan zemanî

Fulka feleka melek di navê  
Mewcan ko reva di weqt û gavê

Ev ṭenṭene û şî‘ar û ayîn  
Çûn lehżeyekê gihane Tacdîn

Tacdîn bi xwe bûye padışahek  
Mem jî li ṭenişt şubhê mahek

Rûniştî di şehnişîn-i ‘alî  
Cem‘ek ji ekabiran ḥewalî

Rabûn li teferrucê vewestan  
Wan cumle ṭebeq di herdu destan

Manend-i ṭibaqê asimanî  
Yaqût û zumerredê di kanî

Ruhtin ṭebeqê di wê nişarê  
Jor da li ‘imareya nîgarê

Emma ṭebeqê di wan hemî pir  
Zêr û wereq û cewahir û dir

Yexma kir genc bûne maşa  
Xîzan hemî bûne mîr û paşa

Şed car-i li hêviya ḥerîşan  
Xaric ji çevandina xesîsan

Fadîl ji kerameta kerîman  
Zâ‘id ji xwidaniya le‘îman

Xîzan û geda we bûne mun‘em  
Muflis bûye zenperest û muxlem

Xîzan û geda xenî û zengîn  
Şadan û hezîn û şâ û xemgîn

Êdî nedibûn ji hev müşexxes  
Te digo hemî mîrek in murexxes

Têk da di munasib û muwafiq  
Vêk ra di müşafîh û mu<sup>c</sup>aniq

Haşil ko ji meqşeda seramest  
Bûn ew der û ban û ew sera mest

Hin mest û hinek dikir di bengî  
Xwanende û bezlego û çengî

Her bengî û serxweşê di Botan  
Têk hatine çerx û baz û lotan

Bêrîte sema û saz û govend  
Şêrîn û şekerleb û şekerxend

<sup>c</sup>Ezra û rewal û bikr û merdan  
Hor û melek û perî û wildan

Gulpeyrehen û semenqebayan  
Şekkerdehenan û qendixayan

Zerînkemeran û keckulahan  
Tel<sup>c</sup>etqemeran û xeçsiyahan

Sîmînbeden û semen<sup>c</sup>ezaran  
Sêvînzeqen û memikhinaran

Ev mûyemiyan û marê gîsû  
Ev çardesale çar ebrû

Merdan û murahiq û mucerred  
Lawê weko xeþ wekî zumerred

Xweþdeng hinek hinek di xweþreng  
Hin cergebezî û hin dîger leng

Bi l-cumle li rexmê vê ´ecûzê  
Ye ´nî li xilafê piştikûzê

Kîjê di sivik kurê di lawîn  
Manend-i benat û müşlê Perwîn

Hin daþirebend û hin di dewwar  
Hin silsilebend û hin di seyyar

Encumşifet encum in firûzan  
Heft şev di temam û heft-i rûzan

Bezma Sitiyê û cem ´-i Tacdîn  
Gêran bi vî rengî zîb û tezyîn

## 24. Daman-i ‘erûsê pakê gerdûn

Daman-i ‘erûsê pakê gerdûn  
Damad ko kir bi mihrî gulgûn

Tarîtî bi rohniyê ko rakir  
Xem şubhetê zulmetê fena kir

Weqtê seherî ji roj-i hëftê  
Agir te digo gihişte neftê

Germiyyet-i narê qurbê meqşûd  
Rakir ji wucûd-i ‘aşiqan dûd

Cem‘iyyet-i xasê ateş û bad  
Elbette dikit mirovî berbad

Ev ‘işq û hewa ko bûne dildaş  
Can û dilî dê bidin bi şabaş

Şebra şewiştandîiftiraqê  
Têk şoht qiran û iħtiraqê

Deryayê meħebbet uştulum kir  
Aram û şekîb û şebir gum kir

Mehbûb û muhib ji ferṭê teşwîr  
Hatin ko bibin bi şewqê teqdîr

Meşşaṭe û mihreban û dayîn  
Şoşbîn û meḥarimê di Tacdîn

Mustewcibê weqt dîn mulaqat  
Bermucib û muqtedayê ḋadat

Mecmû'ê mubexxirat û muṭîr  
Memzûcê muferriḥat û muskir

Cam û qedeḥ û eyax û mexmer  
Ev miskê zebad û ḫûd û mecmer

Mawerd û gulab û ḫîtr-i şahî  
El-qışṣe ji mahê ta bi mahî

Esbabê neşat û ḫeyş û ḫuşret  
Alatê şefa û zewq û şuhbet

Ewçend kirin ewan muheyya  
Mehđa mirî pê dibûn muheyya

Araste bû ḫerûsxane  
Dîwar û der û ḫurûsxane

Rabûne ve xaşekî û xadim  
Hindek di eqarib û meḥarim

Şem'ek bi temame muṭella  
Şemsek bi cemale mucella

Hilgirtine ser serê xwe reqqas  
Înane meyanê meclisa xas

Şem<sup>c</sup>ê bi zebanê ھalê bêqal  
Evrengehe kir beyan-i eھwal

K<sup>c</sup>ey<sup>c</sup> aşiqê bêqerar û bêtab  
Ger şubhê min î xwidan teb û tab

Rabe here ھecleya<sup>c</sup> erûsê  
Pabende bibe bi payebûsê

Şem<sup>c</sup>a te wekî te intîzar e  
Şewqa te li can û cismî nar e

Şohtin te bes e mişalê şem<sup>c</sup>an  
Bes şubhetê min bibare dem<sup>c</sup>an

Ger<sup>c</sup> aşiq î rabe şubhê ferraş  
Canê xwe bide nişar û şabaş

Ey sa<sup>c</sup>iyê meqşeda ھewafê  
Wey salikê menheca meھafê

Ew qible û ke<sup>c</sup>beya te meqşûd  
Nêzîk-i te bû ye emrê me<sup>c</sup>bûd

Beyt û ھecer û meqam û ھucré  
Se<sup>c</sup>y û ھeleb û ھewaf û<sup>c</sup>umre

Barî ji te ra kirin muqedder  
Ha bûne ji bo te ra tuyesser

Av î tu rewan be pêş-i selwê  
Şêr î tu heman kerem ke xelwê«

Tacdîn ji şûretê şemalê  
Me'neyê mehebbeta şepalê

Zanî bi te'emmûl û bi idrak  
Rabû ji cihê xwe çist û çalak

Yarê xem û şahiyan Memê jar  
Vê ra bûye şahîb û silehdar

Destê wî di dest û dil di dil bû  
Bû hacibê derge şîr li mil bû

Tacdîn bi vî terzî çû serayê  
Mem ma li derî digel du'ayê

Lewra ko mexwuf bû ew mulaqat  
Melzûm e li 'aşiqan mu'adat

Ger qışmê muhibb û ger hebîb ìn  
Elbette bi dijmin û reqîb ìn

Hin dêw û hinek ji wan perî ne  
Hindek di munafiqê ademî ne

## **25. Zava bi edeb ko çû ji der dan**

Zava bi edeb ko çû ji der dan  
Şem<sup>c</sup>a ko li pişt hicab û perdan

Rabû ko ji pêş ve çû xeraman  
Kêşa li zemîn bi naz-i daman

Zulfê di xwe kirine pay-i endaz  
Destê di xwe kirine ferq-i perdaz

Dêma ko bi nûrê Beyti l-eqsa  
Qendîlê felek bi wê teyîsa

Mexmûrê xebûqê derdê hicran  
Muştaqê şebûhê weşlê canan

J'ewwel ve li <sup>c</sup>adetê mubahî  
Destê xwe dirêj kire şurahî

Noşî ji şurahiya şekerleb  
Noşîn qedehek ji mey leba-leb

Mexmûr-i ko defî<sup>c</sup> kir meya nab  
Bêhn kir gul û sunbulê di térab

Geh nêrgis û lale gah şorgul  
Reyhan û binefşê gah sunbul

Têk têk ve didan û têk dibestin  
Hin bûse didan û hin digestin

Ewçend-i bi yek ve radimûsan  
Nobet nedidane hev li bûsan

Elmas û guher cebîn û dindan  
Tebdîl bûyin bi le'l û mercan

Deryayê mehebbetê we kir cûş  
Dest gerden û leb bi leb hem aχûş

Medhûş bûyin bi wê mudamê  
Bêhiş we ketin ji ser qiyamê

Qadir nedibûn bikin qu'ûdê  
Gêr bûn bi yek ve bo sucûdê

Tekrar ji secdeyê ko rabûn  
Ewçend-i bi yek ve herdu şâ bûn

Şekker ji lebê di yek revandin  
Şorgul ji ruxê di yek civandin

Terkîb kîrin ji bo xwe gulqend  
Tezwîc ko bûn bi yek ve dilbend

Sê roj û şevan bi dil peya-pey  
Wan teşneleban vexwarin ew mey

Mustesqeyê şerbeta meya nab  
Axir ko nebûn bi şurbê sîrab

Keyfiyyet-i neş'eya şerabê  
Kêşane kemal-i idtirabê

Şafizeqen û bedenşefafê  
Kir meyl û mehebbeta zifafê

Sermest bi dest têk heristin  
Bû gelte û gelc û daheristin

Dem lêk piçian û dem cuda bûn  
Geh têk hejiyan û geh di ba bûn

Dem ew didu bûn û gah yek bûn  
Geh cot û bi yek ve gah tek bûn

Tîra ko ji 'acê ber hedef bû  
Amac bi şefweta şedef bû

Amac ko bû mehellê peykan  
Durdane bedel kirin bi mircan

Nebil hate ve neşil ma di wê da  
Nesla xwe ji can û dil bi wê da

Peyweste bi roj eger bi şev bû  
Wan ber ji mehebbetê bi hev bû

Hemware du serxweşê di serkeş  
Vala dikirin li yek du terkeş

Ger roj û eger şevê di reş bûn  
Ew herdu melek we pêk di xweş bûn

Goya te digo du kîmiyager  
Meşxûl bûyin bi <sup>c</sup>eqdê cewher

Ew rûh û cesed bi yek ve munđem  
Nefseyn-i bi yek ve bûne mudxem

Inzalê legen nuzûlê ibrîq  
Teş<sup>c</sup>id kirin bi qer<sup>c</sup> û inbîq

Memzûc-i şebîhê şîr û şekker  
Mexlût-i wekî heyat û Kewşer

Qet<sup>c</sup>a çu nebû ne xur ne xwabek  
Wan bîr nedihat-i nan û abek

Ew hefte temam bûye gerdek  
Agah nebûn ji halê ferdek

Xalib geriya li derdî şihhet  
Xem çûn veşérîn ji kerbê wesilet

Nageh seherê, ji roj-i heştê  
Riđwan meşıya ji nêv biheştê

Mem hêj wisa li ber derî bû  
Da'îm ewî ser li ser berî bû

Hêj ewî mesken asitan bû  
Rojan û şevan we pasiban bû

Tacdîn ko ji gerdekê bi der ket  
Rojek te digo Memê bi ser ket

Fi-l-ḥali we reng-i şadiman bû  
Hemeferê ewcê asiman bû

Yarek te hebit meger we bîtin  
Ger dê we nebit meger nebîtin

Yarê bi te ra bitin muwafiq  
Şed xizmê di xa'în û munafiq

Qurban bike qet mebê mixabin  
Çi d'kî bi kesan ko bêwefa bin

Qurban bide qet mebêje kî ne  
Bêkîn e bira, eger bikîn e

Yarê te ji bo te ra bira ye  
Hem çav e ji bo te hem çira ye

## 26. Gava ji ‘edem Xwidê kir îcad

Gava ji ‘edem Xwidê kir îcad  
Ev kewn û mekan ji nû ve bunyad

Mecmû‘ê mukewwenatê ‘alem  
Hetta ve xulaşe new‘ê adem

Eşya bi heseb şifat û ef‘al  
Înane wucûd muxtelifê hal

Mewcûd kirin bi hev mu‘eyyen  
Eddad kirin bi ɖud mubeyyen

Ev erd û sema beṭî‘ û da‘ir  
Ev mulk û melek muqîm û sa‘ir

Ev nûr û ȝelam û kufr û îman  
Ev xuld û seker biheşt û nîran

Ev barid û ȝar û reṭb û yabis  
Ev mîr û geda ȝenî û ba‘is

Ev ax û hewa û agir û av  
Ev leyîl û nehar û sî û sîtav

Ev hecr û wiṣal û şahî û ȝem  
Ev mewt û ȝeyat û sûr û matem

Hin nûrmîşal û hin wekî nar  
Hindek di ھelîm û hin di dijwar

Van şadiq û rast û xêriixwahan  
Van qemşî û xwar û rûsiyahan

Van ehlê cehennem û ھezaban  
Van la'iqê cennet û şewaban

Nabînî ko pêk ve cumle ڏidd in  
Hikmet ci ye, bo ci pêk ve nedd in

Lewra ko nebit eger texaluf  
Temyîz meھal e, hem te'aruf

El-qışşe, bi iqtidayê xilqet  
Mîrê bi kemal û izz û rif'et

Ragirt-i ji bo xwe dergevanek  
Fettanê zeman e şeypişanek

Da'im li derê wî qapûcî bû  
Qella'û qelaş û qawecî bû

Emma bi neseb ne merd bû ji Buhtan  
Belkî mutewellidê ji buhtan

'Eşlê wî dibêñ ji Mergever bû  
Mehđa wî beşer bi şûr û şer bû

Navê wî munafîqî Bekir bû  
Belkî ji belûqiya betir bû

Menna<sup>c</sup> û muzebzebîn û iblîs  
Xedda<sup>c</sup> û xeberbezîn û telbîs

Şagirdê şe<sup>3</sup>ameta wî şeytan  
Şermende ji guhtina wî Buhtan

Bedçehre ji rengê dêwê kabûs  
Bedfi<sup>c</sup>l û sitîzekar û salûs

Tacdîn digote mîr <sup>c</sup>eyanî  
»Mîr<sup>c</sup>im, bike der vî dergevanî

Ev la<sup>3</sup>iqê dergehê te nîne  
Ev kelb e nehîndir e bikîn e

Herçend şeh û dergevan bira ne  
Ekşer şeh bi mihr û bawefa ne«

Evrengehe mîr digote Tacdîn  
»Fi<sup>c</sup>lê di Bekir meger nizanîn

Em qismê emîr qismê aş ïn  
Pirfetl û ger ïn û pêş û paş ïn

Naçare ji bo me aşivanek  
Labudde ji bo me dergevanek

Hindî bi hukûmetê dikîn dewr  
Geh <sup>c</sup>edl e ji bo me kar û geh cewr

Herçend Bekir weledzina ye  
Aşê me ji wî bi fetl û ba ye

Ev zumre ko ژalim û چewan in  
Sûbaşî û şehne û dergevan in

Aşê di me ژaliman digêrin  
Dexlê di mezaliman dihêrin

Aşê me egerçi weqfê چam e  
Gewrî tejî garisê heram e

Wî garisi ھarişek diçînit  
Ev ھarişê bo me dê hilînit

Ev چadete nîne xaşê mîran  
Nabînî li ber derî feqîran

Wan jî hemî pasiban ji şan in  
Ew jî hemî qismê dergevan in

Sultanê serîrê bêniyazî  
Nabînî ji boyî karisazî

Hindî ewî rakirin selaşîn  
Deh çend ewî çekirin şeyaşîn«

Haşil di şeyê xwe mîr neborî  
Te'lîl didane ber چerûrî

Mîrin hene ew şeyê di tazî  
Nadin bi چedaleyê di Tazî

Ew kînewer-i xebîş-i mudbir  
Ye'ñî Bekirê bi dil muzewwir

Xewfa wî hebû bi xef ji Tacdîn  
Da'îm di dilê wî da hebû kîn

Weqtê ko bi dewlet û se<sup>c</sup>adet  
Ev de<sup>c</sup>wete bû bi resm û <sup>c</sup>adet

Xef j' ademiyan wekî <sup>c</sup>Ezazîl  
Mehdâ xereda wî kîzb û teswîl

Tenha wehe gote mîr di xef da  
»Mîr'îm te Sitî qewî telef da

Ew cewher-i tac û tac-i cewher  
Ew efser-i zîb û zîb-i efser

Ewrenge sezayê text û ewreng  
Ferzane bi <sup>c</sup>eql û ferr û ferheng

Kisra bi keser ji boyî dînê  
Fexfûr bi xewr bo evînê

Qeyşer ji kurê xwe ra bixwesta  
Xaqan ji pêş ve dest bibesta

Hêja nedibû ewê tu erzan  
Evrenge he serserî bidî wan«

Mîr go »qe didim, eya bedexter  
Tacdîn û Memê bi textê Qeyşer

Roja weko bûye ceng û perxaş  
Tacdîn û Memê duşed qizilbaş

Bi-l-cumle bi zirh û zend û binper  
Înan ji me ra bi şîrê şesper

Xaqan kî ye ez ci kim bi fexfûr  
Nadim ez ewan bi rub<sup>c</sup>ê me<sup>c</sup>mûr«

Mel<sup>c</sup>ûnî ko dî nebû cu te<sup>3</sup>şîr  
Ew mes<sup>3</sup>ele wergerande tezwîr

Go »qenc e heqîqeta humaman  
Hemseng-i şedaqeta ₓulaman

Roja vedixwin şerab-i belwa  
Gava ko dixwin kebab û selwa

Çawa ne di şahî û şefayê  
Ewrenge di tengî û cefayê

‘Ariq nebitin li wan tebeddul  
Zahir nebitin ji wan tehewwul

Mehđa nekin ev quşûr-i xidmet  
Qeṭ<sup>c</sup>a nekin ew futûr-i himmet

Ev zewq û cefa bibin muqabil  
Ew şidq û wefa bibin mu<sup>c</sup>adil

Lê ȳayı<sup>c</sup> e himmeta kerîman  
Der heqqê nela<sup>3</sup>iq û le<sup>3</sup>iman

Nakes ne sezayê genc û mal e  
Nûres ne munasibê celal e

Menzûreyê nûresan şerab e  
Mexmûreyê serxweşan xerab e

Pir ‘eqil divêt û pir tehemmul  
Nûres bi meyê nekit tehewwul

Mîr’im, te nedî kurê Sikender  
Dayê te nezer ji heddî çû der

Roja ko Sitî te daye Tacdîn  
Wî j’alê xwe dayiye Memê, Zîn«

Mîr go »çî ‘eceb bi min nekir pirs  
Ya ne qe nemaye wî ji min tîrs«

Go »ma tu nizanî ew kusan e  
Mîrza ye ciwan e pehlewan e

Meydan diye wî, celew reva ye  
Herçî weko ew bikit rewa ye

Tîrsa min ew e bi kubr û kînê  
Tuxyan bikitin ji paş-i Zînê

De‘wa nesebê bikit bi Xalid  
Qeşda hesebê bikit zewayid«

Mîr go »me ji dil hebû bi daxwaz  
Zînê bi Memê bikim serefraz

Şondê dixwim ez bi rûhê walid  
Hetta bigihîte ceddê Xalid

Mehđa bi zukûrê neslê adem  
Zînê bi jinînî ez qe nadem

Herçî ji serê xwe bûye bêzar  
Ha Zîn û bila bîbit xerîdar

Merdê ji ser û ruha xwe têr e  
Bêxewf-i bixwazitin ko mîr e«

Hukkam bi bañin û bi zahir  
Bêşubhe müşabih in bi agir

Zahir di spañî û binûr in  
Bañin ji mudareyê di dûr in

Rehmê ko dikin ji rengê roj in  
Qehrê ko dikin cihan dişojin

Zinhar bi wan nekî tu bawer  
Ger bab û pis î û ger birader

Xasma ko muquerrebê di bedxwah  
Nêzîk bibin ne<sup>c</sup>ûzu bi-l-lah

## 27. Tacdîn û Sitî ko bûn bi hev şad

Tacdîn û Sitî ko bûn bi hev şad  
Weşlê kirin ew ji hecrê azad

Mem mayî di kuncê wehdetê ferd  
Ne yar û ne hemnişîn, ne hemderd

Hemdem ko nebin ji bo deman ra  
Hemderd nebin ji bo ҳeman ra

Xemgîn bi ci dê bikin tehemmul  
Şahîn bi ci dê bikin tewessul

Şahî û ҳeman divêt-i enbaz  
Derdan û deman divêt-i demsaz

Unsiyyet-i aşiqan sukûn e  
Sermayeyê wehşetê cunûn e

Asûde dibin bi yekdu hemqal  
Xasma ko hebin bi yek ve hemhal

Zîn û Sitî û Memo û Tacdîn  
Vêk ra dikirin mudar û teskîn

Zînê ko dikir ji derdî efşan  
Dengê Sitiyê dibûye derman

Gava weko Mem bi dil dinalî  
Tacdîn dibûye hekîm li alî

Ev herdu ji herdiwan cuda bûn  
Çûn herdu bi meqşeda xwe şâ bûn

Man Zîn û Memê di bêserencam  
Bêmeqşed û bê murad û bê kam

Çil roj-i ne xur ne xwab-i Zînê  
Ser ranedibû ji ser girînê

Xwîna dilî bû xîda û xwarin  
Hêstir bi xwe şerbet û vexwarin

Hemware bi roj, eger bi şev bû  
Wê ھal-i ji firqetê her ev bû

Rojan digirî, bi şev dikir ah  
Ewreng geriya deif ew mah

Bedra rûyê wê bûye hilalek  
Tel<sup>c</sup> et dinima wekî xeyalek

Hemzad û heval û hemnişînan  
Hemraz û emîn û nazenînan

Herlehze digotinê bi riqqet  
K'ey serwê riyadê baxê rif'et

Sersebz î û tazeberg-i bar î  
Evçende ci hêstiran dîbarî

Hemşîre eger ji te cuda bû  
Xweş çû û bi hemserê xwe şa bû

Wê girtiye bo xwe şebr û temkîn  
Ew şa ye li wê tu l'êre xemgîn

Min be<sup>c</sup>di xeman ji qelbî rake  
Teşbîhê bi zulf-i ber vi ba ke

Çîn çîn bike tûrreyê di şebreng  
Gul gul veke arîdê di gulreng

Zulfan veke da bibin muselsel  
Iklîl li cebhetê mukellel

Biskan tu ji xemriyan cuda ke  
Zulfan şe ke bi yek ve berhewa ke

Da sinbil û şorgul aşina bin  
Reyhan û binefşê ta bi ta bin

Biskan biwerîne ser hilalan  
Sewda ke di bekke<sup>’</sup>ê bilalan

Dîsan bike xemriyan qedehnoş  
Ce<sup>c</sup>dan veke Ke<sup>c</sup>be bit siyehpoş

Ta xelq ji xerb û şerq-i ta Şam  
Huccac şifet bibînin iħram

Pêwend bike pêk ve bisk û xalê  
Şîraze ke müşhefa cemalê

Serlewheyê dêm bîbit muzeheb  
Ayatê Xwidê bibin muretteb

Da furqe'ê kafir û musilman  
Teşdîq bikin bi neşşê Furqan

Van xemze û awirê di xwînxwar  
Wan xencer û keyberê di dijwar

Zinhar, medî cewaz û ruxset  
Wan nîne bi kes çu rufq û rehmet

Me'zûn bike terreyê di terrar  
Da hukim bikin li şah û xundkar

Perdê tu ji ber gulan hilîne  
Bêsebrê bilbilan bibîne

Xendan bike xunçeya dehanî  
Nalan ke hezar di asitanî

Serxweş ke li gerdenê guharan  
Sersem ke cunûn û dîn û haran

Meyxur ke melan bi xenc û nazan  
Şexan tu bişihîne ber berazan

Destûr bide bisk û zulf û xalan  
Agah bigêre ehlê halan

Da murşidê bêterîq-i ha'im  
Sergeste nebit wekî beha'im

Inkar bikit ɖelalê muṭleq  
Iqrar bikit bi şûretê heq

Fariş ji tecelliya celalê  
Qani<sup>c</sup> bi teşewwura cemalê

Fanî bikitin ewê wucûdê  
Baqî bibitin bi vê şuhûdê«

Evçende ewan digotin ev pend  
Zîn pê nedibû şebûr û xursend

Belkî bi neşîhet û bi pendan  
Yekcar dikete bela û bendar

İşq agir e nefhe ye neşîhet  
Sir perde ye lewme ye fedîhet

Hindî ko ewan dikir melamet  
Wê zêde dibû ji wan nedamet

Eşkan nedidane çavî furşet  
Ahan nedida dehanî muhlet

Da ev bi kelamekê xeber dit  
Ya ew bi meqamekê nezer dit

Naşih fekirîn ko we<sup>c</sup>z û teqrîr  
Nakin bi çu rengî nef<sup>c</sup> û te<sup>3</sup>şîr

Mayin di te<sup>c</sup>eccubê ko ew mah  
Evçende ji bo ci ra dikit ah

Wan herwe qiyas dikir ko Zînê  
Her bo Sitiyê dikit girînê

Dîtin ko xeber hemî hewa bûn  
Naçar-i kirin sukût û rabûn

Zîn ma bi tenê digel ҳeman cot  
Ҳem lê civiyan ji bo ҳeman got

## 28. K'ey hemnefesê di bênewayan

K'ey hemnefesê di bênewayan  
Feryadiresê di pircefayan

Hemderdê dilê di derdimandan  
Hemperdeyê sîrre mustemandan

Hemrazê dilê di dilbirînan  
Hemxwabeyê xaçira hêzînan

Hemkaseyê xwanê bête<sup>c</sup>aman  
Hemmesrebê raھ-i telxikaman

‘Aşiq bi we waşilê cemal in  
Salik bi we na<sup>o</sup>ilê celal in

Wêraneyê dil we maye xalî  
Qet xeyri we kes nehin hewalî

Çawa dikirin ji bo xwe me<sup>c</sup>mûr  
Muşleq ji we ra me daye destûr

Dewlet bi we ye di darê dunya  
Rif<sup>c</sup>et ji we ye serayê ‘uqba

Xem lew me divêñ ko bawefa ne  
Nabêñ eve têhlî û cefa ne

Roja reşîyan e yar-i canî  
Yarê xweşîyan e şadimanî

Ko nîn-i ci 'acil û ci acil  
Xemxwarî nebit ko têne haşîl

Haşîl bi we xweş dîbit li min dil  
Bê genc-i xeman ji dil ci haşîl«

Geh gah dikir Sitî muxaṭeb  
Evrenge he ew melek mu'ateb

## 29. K'ey rûh û rewanê qelbê Zînê

K'ey rûh û rewanê qelbê Zînê

Nûra beşerê diyar û dînê

Hemşadî û hemcefa û hemdem

Hemlehîm û 'izam û cild û hemdem

Hemşîre û hemcenağ û hemser

Hembeyde, hemaşîyan û hemper

Wey têbi<sup>c</sup> bi têb<sup>c</sup>ê min muṭabiq

Illa ko bi bext-i namuwafîq

Şed şukir te bext bûye yawer

Çawa te divê, we da te dawer

Şed şukir, te bext-i bû musa<sup>c</sup>id

Tali<sup>c</sup> geriya ji bo te şâ<sup>c</sup>id

Bextê min egerçi zêde reş hat

Ev qismete bo me zêde xweş hat

Teqsîm-i xeman ji bo mi ra bû

Teqdîr-i ezel yeqîn wisa bû

Şahî ji te ra û xem ji bo min

Tacdîn ji te ra û Mem ji bo min

Xem çunko li şûretê Memê ne  
Lew xem ji mi ra li ser xemê ne«

### **30. Dem şemi<sup>c</sup> dikir ji bo xwe demsaz**

Dem şemi<sup>c</sup> dikir ji bo xwe demsaz  
K'ey hemser û hemnişîn û hemraz

Herçend bi şuhtinê wekî min  
Emma ne bi guhtinê wekî min

Ger şubhetê min te jî biguhta  
Dê min bi xwe dil qewî neşuhta

Derdê min û te ji yek biferq e  
Ew ferq-i ji xebê ta bi şerq e

Meşriq tu yî agirê te zahir  
Mexrib ez û başinê min agir

Da'im dişojit me rişteyê can  
Te naşojitin bi xeyri ezman

Pêht-i min li ser di dil pereng e  
Canê me digel perengê ceng e

Şewqek te li ser serî diyar e  
Sewdayeke serserî diyar e

Ew şewq ji bo te ra zeban e  
Ev pêht-i ji bo me ra ziyan e

Pêhta ji dilê me dayî ser ser  
Hukmê dikitin li bayê şerşer

Herçend-i bi şev dimînî bêdar  
Şubhan dînivî heta ve êvar

Êvar û şehîr bi roj eger şev  
Ez her dişojim wisa li ser hev«

Geh gah-i ji dest-i dil birîndar  
Naçar-i dibû ji canî bêzar

### **31. Perwa nedikir bi ateşê xem**

Perwa nedikir bi ateşê xem  
Perwane dikir ji bo xwe hemdem

K'ey ṭa'irê aşyanê firqet  
Wey bilbilê bositanê hirqet

Ey ḥuccet-i aşiqê di şa'ib  
Wey mubṭilê mudde iyê kazib

Merdane dibexşî canî erzan  
Heyfa ko bi mir giran î lerzan

Nawestî demek li ber hewayê  
Napuxte teleb dikî fenayê

Ew lez ji te ra gelek quşûr e  
Ew lerze ji bo te ra futûr e

Bêşebr î û bêsukûn û bêtab  
Lewra xwe dikî bi zûyî pirtab

Napuxteyê eybeke temam e  
Metbûx dibêjinê ko xam e

Puxte dişojin meger çu caran  
Fanî qe dixin bi nûr û naran

Baqî digerin, wekî semender  
Wan cisim dibîte can-i enwer«

Wê cisimmunewwera melekîrûh  
Beydaqemera muqabeleti yûh

Yek ژerre ji asiman û erdan  
Nedima ko nekit digel xeberdan

J'ev ademiyê di şahîbexrad  
Mehdâ dikir ihtiraz û i'rad

Fikra xwe dikir ji uns û canan  
Sirra xwe digote bêzebanan

Ser ta bi qedem xerîqê xem bû  
Neqşê dil û can xeyalê Mem bû

### 32. Mem jî ji xeyal-i rûyê dildar

Mem jî ji xeyal-i rûyê dildar  
Ye'ñî ko ji arezûyê dîdar

Bû dînekê dilpezîrê sewda  
Mecnûnekê bênežîrê şeyda

Xalib geriya li 'eqlî dehşet  
Mûnis geriya li qelbî wehşet

Ne qabilê heml-i daş û derdan  
Ne na'îlê seyr-i başê werdan

Haşil ko nebû wişalê Zînê  
Rahet çunebû ji ber birînê

Lewra ko du teşneleb di bê gav  
Bêtab-i bibin ji bo firek av

Nageh birijit ji asimanî  
Serçeşmeyê ab-i zindeganî

Yek teşne muradê dil hilînit  
Yek soxt û her wisa bimînit

Yek kesib bikit heyat-i sermed  
Ê dî diçite memat-i mumted

Tacdîn ko ew wişal-i dest da  
Ewreng li Memê melal-i dest da

Esla ji xeman nebûye hêsa  
Mehdâ bi kesan nebû muwasa

Qet<sup>c</sup>a wî nebû li cih qerarek  
Esla wî nebû bi kes mudarek

Ew weqtê we ko diçûye pêş mîr  
Te digo ko du saxê û pê di zincîr

Herlehze ji derd û ah û wahê  
Agir digihande baregahê

Gava ko diçûye pêş-i Tacdîn  
Ew jar-i digel dilî bi nalîn

Nedişî bikitin mudar û şuhbet  
Nedibû bigirit qerar û ulfat

Naçar-i ji hêsetê diçû dûr  
Hemderd-i dibû digel şete kûr

### 33. K'ey şubhetê eşk-i min rewane

K'ey şubhetê eşk-i min rewane  
Bêsebr û sukûn î 'aşiqane

Bêsebr û qerar û bêsukûn î  
Yan şubhetê min tu jî cunûn î

Qet nîne ji bo te ra qerarek  
Xalib di dil te da ne yarek

Herlehze te jî ci tête bîrê  
Sergeste dibî li rex Cizîrê

Ev şehre ye ger ji bo te mehbûb  
Haşil geriyaye bo te metlûb

Da'im di dilê te da ne menzil  
Destê te li gerdenê hema'il

Hêja ji Xwidê tu fikir nakî  
Herroj-i hezar şukir nakî

Evçende dikî hewar û gazî  
Êdî ci muradekê dixwazî

Beyhûde çira dikî tu feryad  
Aware diçî diyarê Beşdad

Ger ez bigirîm we ger binalim  
W'er ez bimirim we ger bikalim

Herçî weko ez bikim rewa ye  
Me<sup>c</sup>qûl ji bo mi ra fena ye

Carek li dilê mi jî guzer ke  
Serçeşmeyê çeşm-i min neżer ke

Derdê dilê min ko bêdewa ye  
Çeşm-i terê min ci ma-cera ye

Dîwane me, min perî bi der da  
Ez Dicle me zenberî me berda

Westanî û Nêrgizî û Seqlan  
Derwaze û Ummerî û Meydan

Van seyrigehan tu lê dikî geşt  
Ez mame ji bo mi ra der û deşt«

### **34. Geh behîş dikir digel şebayê**

Geh behîş dikir digel şebayê  
Şerha xemê dil digote bayê

K'ey cisimleştîf-i şubhetê rûh  
Dergahê beden li ber te meftûh

Ez hêvî dikim ko bê teweqquf  
Rencîdeqedem be, bê tekelluf

Carek here suddeti s-se<sup>c</sup>adet  
Gavek here sudreti n-nihayet

Ewwel tu bibûse asitanî  
Paşê here pêş-i dilistanî

Emma bi tewađu<sup>c</sup> û bi te<sup>c</sup>zîm  
Şed mertebe iħtiram û tekrîm

Aheste ji bo bike du<sup>c</sup>ayê  
Wabesteyê wê bike şenayê

Şayeste bike tu iħtiramê  
Destbeste vewest, bike selamê

Paşê hereket ke pêş ve çapik  
Şiqlet negirî li ṭeb<sup>c</sup>ê nazik

Ev name ko xwîn-i dil mîdad e  
Ev şefhe ko merdumek sewad e

Perdê melivîn ji ber cemalê  
Tenha bide dest-i <sup>c</sup>erdihalê

Zinhar-i di ba nekî niqabê  
Gava ko dixwînitin kitabê

Bêj'ê ji mi da ko Padişahim  
Benden ana soyle Qiblegahim

Lew metle<sup>c</sup>ê nûr-i zu l-celal î  
Lew menbe<sup>c</sup>ê Kewsera zelal î

Lew menzer û mezhera ilah î  
Em bûne geda, tu padişah î

Da bo me bi hêqqî mutteşif bî  
Der hêqqê me <sup>c</sup>edl û munteşif bî

Der dîde ji dîdeyê tewella  
Geh gah-i bikî li dil tecella

Ev de<sup>b</sup>-i qedîm e padişahan  
Wan <sup>c</sup>am e nezer li pirgunahan

Wella gunehê xwe ez nizanim  
Emma me dilek hebû dizanim

Ew dil periyan ji min revaye  
Ev pêlek e ew ji min cuda ye

Weqtê ko digel min ew teba bû  
Şahibhewes û xwedanhewa bû

Belkî kiribit xeta û 'uşyan  
Insan xuliqîn bi nuqş û nisyan

Şedcar-i ko zêde pирgunah e  
Lê sayeyê zulf-i te penah e

Ger qehir bikî li wî ceza ye  
Wer 'efû bikî 'eceb 'eşa ye

Evrenge bibêje ey şeba tîz  
Wan gah zemîn bibûs û berxîz

Ey bad-i şeba bi hêqqê me'bûd  
Gava weko tê ji pêş-i meqşûd

Zinhar-i hinek ji xak-i dergah  
Bîne ji mi ra digel xwe hemrah

Toza ko ji rengê tûtiya ye  
Bîne bi xwe ra ko kîmiya ye«

### **35. Geh ceng dikir digel dilê jar**

Geh ceng dikir digel dilê jar  
K'ey xa'inê şermesarê şeddar

Kan qewl û qerar û 'ehd û peywend  
Peyman û qesem, yemîn û sûkend

Te digo ko digel te şadiq im ez  
Te digo bi te ra muwafiq im ez

Te digo ko digel te yekdil im ez  
Te digo ko xwedanteğemmul im ez

Heyfa, ko ziyade bêwefa yî  
Weyla, ko ne qabilê cefa yî

Qelp î, dexel î, bi dil neyar î  
Pir çîl û çep î, xerab û xwar î

Ey tûtiyê perwerîş şîrîn î  
Wey tifl-i tufeyl-i nazenîn î

Yarê xweşîyan bûyî meger tu  
Qelbê reşîyan bûyî meger tu

Dilhay, kusan derûn-i ten ha  
Inşaf e tenê bihêlî tenha

Ev bilbil-i can-i di mehbesa ten  
Maye bi tenê mişalê Bîjen

Inşaf e bikî tu canî bedrûd  
Derwazeyê ten bigêrî mesdûd

Sirra di te da ji feyđ-i can e  
Nûra di zemîn ji asiman e

Ey dil, meçe bê çirax-i canî  
Zulumat e, tu kor î rê nizanî

Meqşûd e eger ji bo te canan  
Canan te di canî da ne penhan

Lewra tu numûnedar-i ȝat î  
Ayîneyê şûretê şifat î

Zinhar-i meçe li dû tewella  
Da can nekitin ji te teberra

Çûna te dibîte xariciyyet  
Terka te dibîte rafîdiyyet

Xaric mebe da bibî tu daxil  
Terkê meke da bibî tu waşil

Refđê meke tu bi dil be sunnî  
Ma baleke weyhek ente minnî

Şabit be ko da ne naxelef bî  
Da waqif-i surrê men 'eref bî

Herçend-i tu çûyî ber derê dost  
Lê dost-i li nik min e, li wê post

Qedda te hêbandî bo te dar e  
Zulfa tu çivandî ew qenar e

Cezba tu revayî can li bal e  
Surra tu fida yî ew xwemal e

Bawer te neyê li zulf û xalan  
Malî mede hindîyan bi talan

Pabende mebe bi tar-i gîsû  
Sergeşte mebe bi qews-i ebrû

Herçend xelîl î ey belakeş  
Gulzar li te dibîte ateş

Teşbîh-i te şed hezar-i bulbul  
Şedcar bikin fixan û җul-җul

Perwaneşifet li pêş-i werdan  
Herdem dişojim bi daş û derdan

Ey dil te xwe daye ber hewayê  
Qeşda te ew e bikî şefayê

Emma ji ȝebîb-i işq-i şadiq  
Min zaniye bo te ra muwafiq

Perhîz-i ji qismê müştehatan  
Teqwa ye ji van mulezzezatan

Herçî ko muxalif-i hewa ye  
‘Eynê wî ji bo te ra şifa ye

Min pirsiye bêguman ji Luqman  
Xaşiyyetê şerbetan û luqman

Herçî ko şirîn e ‘eyn-i da ye  
Herçî weko têhlî e ew dewa ye«

Ewçend-i ewî digel dilî got  
Naçar-i dilê dilî bi wî şot

Dûkel ji herareta suweyda  
Rabû tejî bû mehellê sewda

Rabû ve ji dil duxan û yehmûm  
Reş kir li serî dimax û xeyşûm

Neynîk-i xeyal-i bû mukedder  
Ayîneyê ‘eqil bû muşebber

‘Ewrek te digo ji ‘erdê rabû  
Evrazî li asiman cema bû

Wî ‘ewrî ji nîveka hinavan  
Xwînbarî dikir bi herdu çavan

Seyla cegerê wesa li gurr hat  
Goya ko bi ser Erez ve gur hat

El-qışse ji ‘illeta di dil da  
Seylek we diçû Memê bi mil da

Şeṭṭu l-<sup>c</sup>ereb û Ferat û Ceyhûn  
Hersê te digo bi yek ve rabûn

Herçend ji hêstirê Memê jar  
Şîn bûn li rexê şetî spîndar

Şehra Memê bûye şehnê bistan  
Sahîl bûye gulşen û gulistan

Wî bêdilî her li wê mekan girt  
Wî bilbilî bo xwe aşiyan girt

Ew bilbil egerçi pirhewes bû  
Zindan-i beden li wî qefes bû

Vêk ra weriyan li wî per û bal  
Têk da weşîyan ji wî xet û xal

Qedda wî ye şubhetê şenewber  
Xwim bû, çeviya mişalê <sup>c</sup>er<sup>c</sup>er

Rûyê di wî gerçi her di ter bûn  
Manend-i <sup>c</sup>uram-i lêk-i zer bûn

<sup>c</sup>Arid qewimî li neynikê jeng  
Rewneq çu nema li neqşê erjeng

İşqê we nexweş kir ew belakes  
Hubbê we teles kir ew muşewwes

Dêma wî nema çu ab û rengek  
Nutqa wî nema cewab û dengek

Ji ewwel ve li rex şetî nexwêş ket  
Çil rojî temam-i şubhê leş ket

Êql û xired û şu ûrê insan  
Hiss û hereket qewayê heywan

Qet<sup>c</sup>a qe nema ji van çu aşar  
Yek cuzi<sup>o</sup> li nik Memê birîndar

### 36. Şeyyadê şikar-i hûsn-i exbar

Şeyyadê şikar-i hûsn-i exbar  
Kir bo me ko sergûzest-i izhar

Go, rojeke xweş bi feşl û eyyam  
Dewra feleka fena serencam

Ferraşê qedâ bi şun<sup>c</sup>ê qudret  
Xebra kiribû mişalê cennet

Meşşateşifet cihan-i dêrîn  
Tezyîn kiribû <sup>c</sup>erûs-i ayîn

Her yek ji newal û koh û deştan  
Reh şubhet-i goşeyê di bihiştan

Her rewde riyadê xuld-i ekber  
Her çeşme ji <sup>c</sup>eynê ab-i Kewşer

Her koh ji rengê Torê Mûsa  
Ji enwarê tecelliyyê teyîsa

Her nehir ji rengê ejdeha bûn  
Her sebze bi mu<sup>c</sup>cizan <sup>c</sup>eşa bûn

Her dar-i ji feydê nûbiharî  
Têk şu<sup>c</sup>le dida ji nûr-i barî

Her gul ji mişalê ateşê Tûr  
Yek miş<sup>c</sup>el-i bêquşûr-i pirnûr

Her murx-i seher bi xwe kelîmek  
Her tûtî û qumrî yek nedîmek

Her nexil nidakunende hergah  
Teşbîhê şecer digo »ene l-lah«

Xergûş û xezal û gor û ahû  
Ev qaz û quling û kebk û tîhû

Ker ker diçêrîn li koh û deştan  
Ref ref difirîn di nêv bihiştan

El-qışşe bi iqtıda zemanî  
Bû firşet-i <sup>c</sup>eyş û kamiranî

Feşla bigerin li geşt û seyran  
Nêçîr bikin ji wehş û teyran

Mîrê ko felek muṭî<sup>c</sup>-i ferman  
Go »şubhe nebûyî qewm-i Buhtan

Rabestî silah û gurz û şimşîr  
Bi-l-cumle digel me bêne nêçîr

Hadîr nebitin kesek di şeydê  
Ew dê bimirit di bend û qeydê«

Xelqê ko heta bi şubh-i kazib  
Hadîr kiribûn bisaṭ û ratib

Fecrê ko nemaye wan <sup>c</sup>elamet  
Rabû di wî şehrî da qiyamet

Mêran vekirin <sup>c</sup>uqab û bazî  
Şêran dibirin piling û tazî

Derrende û adem û beha<sup>im</sup>  
Ferdek qe nema di şehrî qa<sup>im</sup>

Dam û ded û ademî û heywan  
Tîfl û şebî aşvan û rezvan

El-qisşe qebîleya ricalan  
Fi l-cumle kesek nema di malan

Bû hêşirgehek li şeydigahan  
Şefqet nekirin li bêgunahan

Ewçend-i ji wehşîyan dikuştin  
Goya ko wuğuş qeṭ nehiştin

Derrende dewende û perende  
Hin kuştî di girtî hin fikende

Çapikherekat û nûciwanan  
Wan faris û kurd û pehlewanan

Derrende dirandibûn bi şîran  
Perrende birandin bi tîran

Mehbûb-i müşalê şehlewenda  
Merkeb<sup>c</sup>ereban xwidankemenda

Çewgan-i di dest digel gupalan  
Avêtine gerdenê di ҳezalan

Ew şêresiwar û bi berçengî  
Xwînî kiribûn belek pilingî

Ewçend ҳezal ewan kirin şeyd  
Ewçend piling ewan kirin qeyd

Êdî nedîşîn digel xwe bînin  
Belkî nedîşîn ji cih hilînin

Kuştî ji xwe ra birin feqîran  
Girtî bi xwe ra birin emîran

### **37. Başek we hebû Emîr Zeydîn**

Başek we hebû Emîr Zeydîn  
Baxê Iremê diçû bi mizgîn

Herdewhe ji wî û her tuyûrek  
Yek qeşir ji cennetê û hûrek

Bo şûştin-i dest û pê û çahvan  
Kewser kiribûn sebîl-i Riðwan

Hemser bi meqamê Sudre serwek  
Manend-i fîriste her tezerwek

Teşbîhê Memê dilşenewber  
Şed pare ji işqê qedd-i ‘er‘er

Narinc û turunc-i şubhê Zînê  
Zer bûyî ji ‘illeta evînê

Sêv û ruṭeb û enarê bistan  
Lêv û zeqen û enarê pistan

Şimşad û çinar hemqedem bûn  
Xweş sayewer û ‘elîhîmem bûn

Zêrînqedehê di mest lebrîz  
Reyhan û binefşê cumle nûxîz

Mecmu<sup>c</sup>eyê xuđrewat û ezhär  
Şîrazeyê selsebil û enhar

Şehna rezî, mucmelen kitabek  
Her qit<sup>c</sup>e û feşl-i, feşl û babek

Goya bi edeb edîb-i tencîm  
Serşefheyê baş-i şubhê teqwîm

Cedwel kiribû bi ḥellê sîmab  
Şengerfşifet gulê di sîrab

Eṭraf ji sinbil û reyahîn  
Elwan ji xuṭût-i sebz û müşkîn

Heryek dikirin beyan-i eħkam  
Bextê siyeh û sefid-i i<sup>c</sup>lam

### **38. Ew ahûyê şeydgah-i wehşet**

Ew ahûyê şeydgah-i wehşet  
Ew banûyê baregah-i 'ulfet

Sergeleh-i ҳezal-i deşt-i derdan  
Sergeşte nihal-i bax-i werdan

Pabesteyê qeyd-i 'isq-i xwînxwar  
Şeyda ko Memê kirî birîndar

Dî şehr û mehelle cumle xalî  
Xalî bûye kuçe û hewalî

Tenha û tehî ne baş û bistan  
Bê'uns û perî ne, şehn-i eywan

Zanî ko zemane bêeman e  
Go »rabe dilo 'eceb zeman e

Furşet xweş e da biçîne seyran  
Ca seyr-i bikîn li wehş û teyran

Kanî qe heyin ji wan-i hemderd  
Lewra ko ev ademî ne bêderd

Teyrek me bihîstiye di başan  
Bextê wî reş e ji rengê zaşan

Lê jar û de<sup>c</sup>îf û bêmecal e  
Aşifteyê rûyê werdê al e

Rojan dikitin fixan û zarî  
Xwîna xwe dixwit şevê di tarî

Da<sup>c</sup>im dikitin fixan û җul-җul  
Hevdengê min e bi navê bulbul

Hemderdekê qenc e, ehlê һal e  
Dermanekê derdê min li bal e

Ey dil, were da biçîn nihanî  
Hêja ko heye me zindeganî

Belkî bi neşîhet û bi pendê  
Aza me bikit ji qeyd û bendê«

Evrengehe got û bê teweqquf  
Zîn hate ve baxî bê tekelluf

Agah-i nebûn ji wê çu deyyar  
Ne daye, ne xadim û perestar

Meqşûd-i ewê ne<sup>c</sup>ışretek bû  
Wê mehîdê murad<sup>c</sup>ezletek bû

Lew hate ve baxî ew perîzad  
Da têr-i bikit ji dest xeman dad

Her lale li sîne bûne daxek  
Her җunçe bi şuhtinê çiraxek

Her dar-i li cismî bûne barek  
Gulnar-i li qelbî bûne narek

Tenha ko xwe dî berek di des bû  
Ew seng zebaneyê ceres bû

Dem dem we dida li deff-i mermer  
Bêşubhe dilê beran dibû ker

Gava ko nezer dikir li avan  
Xûnabe diçû ji herdu çavan

Şehna rezî bû hewayê bulbul  
Şadab-i dikir bi ab-i gul, gul

Qedda ko bi rastîy-i şenewber  
Dêma bi ɖiyayê mihr-i enwer

Ewreng dida li ax û 'erdê  
Ewçend dihesû di toz û gerdê

Axê dikir ax û ber dinalîn  
Daran dikir ah, belg dikalîn

Herdem ko dikir ji derd-i yahû  
Mir'at-i felek dikir siyehrû

Pejmurde kirin bi rengê sorgul  
Efsurde kirin bi dengê bulbul

Bilbil nedîşî bibîte hevdeng  
Şorgul nedibû bibîte hevreng

Hindî ko di baxî da nezer kir  
Beħsa xwe digel gulê di zer kir

K<sup>o</sup>ey şubhetê ‘aşiqan digergûn  
Wey şubhetê min zerîrû zergûn

Bergê di we şed newa hezar in  
Hon bo çi zer in, de<sup>c</sup>if û jar in

Yan şubhetê min di bê Mem in hon  
Lewra weko min di pirxem in hon

Bilbil bi gulê di şor e meşxûl  
Hon mayine şubhê min di me<sup>c</sup>zûl

Lewra di ‘elîl û derdinak in  
Lewra di ħezîn û sîneçak in

Hon qenc ji bo mi ra delîl in  
Hon bo me di ħalî da ‘edîl in

Xwişkek me hebû, ji rengê şorgul  
Hilgirtiye wê ji bo xwe bulbul

Ha hêştiye bo me ‘endelîbek  
Meħrûm û sefîl û bêneşîbek

Ez jî ji ȝelîl û bêneşîbî  
Zer bûme ji hicr-i ‘endelîbî

Dêma min e şor e erxewanî  
Zer bûye wekî we ze<sup>c</sup>feranî

Carek bidiya min ew bi dilxwah  
Êdî nedikir min ah-i bi-l-lah«

### 39. Herçî bibitin ji xêr eger şer

Herçî bibitin ji xêr eger şer  
Bê da<sup>c</sup>iye nabitin tuyesser

Ger weşl e we ger qumaş-i dîdar  
Bê da<sup>c</sup>iye nabitin çu bazar

Ew da<sup>c</sup>iye cumle remz û ḥal in  
Belkî ji cenabê zu l-celal in

Qelbê te dibêjitin ko rabe  
Ev sa<sup>c</sup>ete <sup>c</sup>eyn-i feth-i bab e

Ew koh-i weqar û behr-i mewzûn  
<sup>c</sup>Işqê kiribû xefîf û mecnûn

Ye<sup>c</sup>nî ko Memê merîdê bedhal  
Di<sup>c</sup>fê kiribû ziyade pamal

Roja ko ji şehrî xel bi der ket  
Sewdayê xiyal-i Zîn bi ser ket

Bîmarê bi derdê <sup>c</sup>ışqê sekran  
Bê nedc-i mered gihişte buhtran

Bû qelqeleyek di qelbê xemgîn  
Eşla nedibû di xanî teskîn

Naçar ji xanî ew bi der ket  
Ew da<sup>c</sup>iye Xuđir bû bi ber ket

Ew Xuđir ci bû teşewwuqa dil  
Ew şewq-i ci bû te<sup>c</sup>eşsuqa dil

Qelbê wî digel wî bûye başî  
Kêşan û keşan gihande başî

Zîna ko şevê di reş di tarî  
Herdem bi fişan û ah û zarî

Da<sup>c</sup>im ji Xwidê dikir temenna  
Mem rabbit û bête nik bi tenha

Nageh fekirî ko Mem ji der hat  
Bîmar Mesîh dî bi ser hat

Zînê ji evîn û şadimanî  
Fi l-ħal-i nema çu zindeganî

Bêhiş kete ser çimen wekî gul  
Şed pare ceger ji işq-i bulbul

Mem hat û teferruca gulan kir  
Seyrek li riħan û sinbilan kir

Go »ey gul eger tu nazenîn î  
Kengê tu ji rengê rûyê Zîn î

Ey sinbil eger heyî tu xweşbû  
Reyħan ji te bûyine siyehrû

Hon ne ji mişal-i zilf-i yar in  
Hon herdu fuđûl û herzekar in

Ey bilbil eger tu ehlê hal î  
Perwaneyê şem<sup>c</sup>-i werd-i al î

Zîna me ji şorgula te geştir  
Bextê me ji ṭali<sup>c</sup>ê te reştir

Bilbil ez im ey nikûserencam  
Beyhûde çîra dikî xwe bednam

Gul yek ne tenê ko şed hezaran  
Gulşen diditin di nûbiharan

Me<sup>c</sup>şûqê ko mişlê wan gelek bin  
Herçend ko ḥorî û melek bin

Ew nabine mûcibê çu derdan  
Lewra ko heyin li cumle<sup>c</sup>erdan

Yek bit û nebit mişal û hemta  
Mestûr-i ji rengê Zînê<sup>c</sup>enqa

<sup>c</sup>Aşıq bi ci dê bikit mudare  
Bêşebr û mirin ewî ci çare«

Evrenge digo ji ḥalî xafil  
Nageh fekirî ko pêş muqabil

Zîna ko duşed perî perestar  
Hora ko Memo ji bo giriftar

Wê sebzefet li ser zemînê  
Bêhiş kirî darûyê evînê

Zîna ko şebîhê durr-i meknûn  
Fi l-ħali ko dî Memê cegerxûn

Bêhiş kete ber piyan bêgav  
Serwî ko gihişte ber piyan av

Xunçe ji xewa şeher vebîkift  
Wê bûyî bi bilbilê xwe ra çift

Go »ev xew e ya nexud xeyal e  
Ev xewn e şehîh e, ya betâl e«

Haşil ko ji paş-i şed xeyalan  
Xaşıyyet-i bûye zulf û xalan

Zînê ko gihande ber meşamê  
Şeyd-i mirî zinde kir bi damê

Rabû ko li pêşedestê Zînê  
Fek'rî ko du dest di destê Zînê

Man herdu gelek li pêş-i yek lal  
Ne nuṭq û xeber, ne qîl û ne qal

Ewwel dikirin bi dest işaret  
Paşê ko vebû li wan ‘ibaret

Ewçend kelam bi yek ve gotin  
Ewçend ji pêş-i yek ve şotin

Ewçend şeker bi yek ve rêtin  
Ewçend lebê di yek dimêtin

Ewçend qedeh bi yek ve xwarin  
Ewçend qeda ji nû bijarin

Çeşm û leb û sîne gerden û dûş  
Ruxsar û zeqin ber û binagûş

Yêk yêkê bi dil ji yek dixwestin  
Hin bûse didan û hin digestin

Ew teşnelebê d' ji weşl-i yek têhn  
Gerden dikirin li yêk û du bêhn

Zîna ko bi rux müşalê şem<sup>c</sup>an  
Pirşewq û ɖiya û nûr û lem<sup>c</sup>an

Perwaneşifet Memê bi ʐahir  
Cismê xwe û can didane agir

Geh geş dibû agirê evînê  
Perwa nedima ji boyê Zînê

Herdu di wî һalî da ̄eyanî  
Bê perde sera û bêniwanî

Wan dît-i di baxî da serayek  
Ayîneyê Cem cihannimayek

Rabûn û meşîne şehnişînan  
Rûniştin û herdu nazenînan

Hicran dikirin ji ser şikayet  
Wecdan dikirin ji nû riwayet

Dem ebîşifet hêzîn û gîryan  
Geh xunçe meşel leşîf û xendan

Herdem dikirin qedâ û sunnet  
Ferda weko bûse ne ci minnet

Herçend ko refîc bûn-i tekelluf  
Lêkin evişandibûn teşerruf

Ew gerçi hebûn ji hev bi hîvî  
Emma nedîçûn qewî nişîvî

Hubba di dilan ji heddî der bû  
Serhedî zerafetan kemer bû

İşqa ko ji ser hedê kemal e  
Ava ko ji menbe'ê zelal e

Elbette xwe dê bikit hîraset  
Nakit çu qebûliya necaset

Ciwanî û bihar û baş û mehbûb  
Aya di dinê ci maye metlûb

Xaşma hebitin evînê xalib  
Lebteşneyê işq-i herdu canib

Êdî ci bibêjim, ez nizanim  
Bilmez kî ne soyleye zebanim

#### **40. Saqî mi bigir ko ez bi dest im**

Saqî mi bigir ko ez bi dest im  
Mexmûr im û meynexwarê mest im

Gava ko vexwar Memê û Zînê  
Axift li min cihê birînê

Em <sup>c</sup>aşıq egerçi meyperest in  
Emma ji meya elestê mest in

Ew mey ne wekî meya te al e  
Ew mey ji cemal-i zu l-celal e

Ew ھubb-i ھebîbê pakıżat e  
Qinwan-i ھedîqeyê şifat e

Saqî bide min ji bo Xwidê ra  
Camek ji meya te duh digêra

Her cur<sup>c</sup>eyekê ejê bikim tam  
Yek neş<sup>c</sup>e bes e ھeta serencam

Ew kefeke mehd e bêkem û keyf  
Esrareke bêxeyal û bêteyf

Da defi<sup>c</sup> bikim xumar-i doşîn  
Hişyar bibim ji xwab-i noşîn

Da şubhê Memê nebit ko ҳafil  
Bêt mîrê ecel bi ser me 'acil

Roja min e 'umrî çûye êvar  
Hêja nebim ez ji xwe xeberdar

Zîna hewesa dilê hewayê  
Min dabite nave xwe 'ebayê

Mîr hat li ser wî hinde 'esker  
Zirna û nefîr û kûs û mehter

Dadî li տebilxan û sazan  
Çawûş-i şeda û gaze-gazan

Pabendê bi 'isqê herdu ceyran  
Dermande ji pêş-i yek ve hêyran

Qeṭ seh nekirin ko ev ci reng e  
Qeṭ guh nekirin ko ev ci deng e

Mîr go ko »vekin evan ҳezalan  
Pabend-i mekin ewan şepalan

Têk berdine başî wan wekî teyr  
Da em bikirin hero li wan seyr

Xelqê ko ҳezal û gor û xergûş  
Xweş girtî li ser mil û der axûş

Anîn hemî mîr tejî rez kir  
Aşul ko şivan tejî pez kir

Mîr gote ekabir û xewaşan  
»Tenbih-i bikin nedîm û nasan

Da çîn û demek di baxî rûnîn  
Lewra ko ji rehtiyan zebûn ïn

Ew hatine der serayê <sup>c</sup>alî  
Dîtin der û ban hemî di xalî

Emma ko derîce têk kuşad in  
Reng qur<sup>c</sup>eyê texteyê murad in

Hađir kete qelbê wî xeyalek  
Zanî ko ne xalî ye ji halek

Mîrê bi weqar û <sup>c</sup>eql û ferheng  
Tacdîn û Bekir xwe dane ber çeng

Înane sera ko Zîn û Mem tê  
Guh dane şeda ko zîr û bem tê

Mîr hat-i bi ser ve dî Memê jar  
Pal da <sup>ı</sup>ye balîkê di zertar

Kêşaye serê xwe wî <sup>c</sup>ebayek  
Êvar e ne şem<sup>c</sup> û ne çirayek

Mîr go »kî ye ev di vî zemanî  
Bê ruxset-i min di vî mekanî«

Zînê ko bihîst-i dengê nasî  
Fi l-ħali xwe daye bin libasî

Mem qet ji cihê xwe ranebû, got  
»Şeyda te li min dil û ceger sot

Mîr'îm, te dizanî ez nexweş bûm  
Hetta ve duhî qewî nehiş bûm

Îro me bihîst ko xel digel mîr  
Têk da bi tebayî çûne nêçîr

Şebra me nema di nav nivînan  
Rabûm û digel evan birînan

Naçar bi der ketim ji xanî  
Nageh me xwe dî l' vî mekanî«

Mîr go »nexweşan nehin ji bo qeyd  
Barî te di baxî da ci kir şeyd«

Go »ez ku bibêm bike tu bawer  
Dawer bi mi ra ko bûye yawer

Min dî di vî baxî da xezalek  
Emma ne xezal-i bû şepalek

Ahûyê spî û çav di reş bûn  
Biskin di siyah û bihin di xweş bûn

Herlehze ji nafeyê di tetarî  
Sed bar-i ji turreyan dibarî

Şehrayê Xuten tejî bitin misk  
Yek ta ye ji zulf-i wê û yek bisk

Herçend spî û çavbelek bû  
Emma bi qiyas-i min melek bû

Lewra ko tu hatî ew nihan bû  
Hindî tu nehatî ew 'eyan bû«

Tacdîn ji tekelluma wî zanî  
Zîn hatiye ba Memê nihanî

Go »guh medine Memê ko dîn e  
Malxolî ye wî 'eqil çunîne«

I'radî kirin ji wî kelamî  
E'yan hemî vêk ketin temamî

Saqî û şerab û şemi<sup>c</sup> xwestin  
Dîwanekê hakimane bestin

#### 41. Tacdîn fekirî ko bezme boş e

Tacdîn fekirî ko bezme boş e  
Pirzewq û şefa û 'eyş û noş e

Mem zêde bi ҳuşşe û melal e  
Çû bal ve go »bira, ci hal e«

Emma bi işaret û mu'emma  
Pirsî û Memê bi remz û îma

Destê xwe ji hûçikê 'ebayê  
Kêşa û 'ecayibek nimayê

Dîtin du kezî ji mişkê tatar  
Manend-i du ser bi mehr-i şehmar

Gerdayî di paşila Memê da  
Mem mayî di heybet û ҳemê da

Zanî ko qewî xirab e eħwal  
Rabû bi lez û bezî û çû mal

Nageh bi ҳeđeb ko çû ji der da  
Zanî Sitiyê digel xeber da

Gotê »te ci hal e, ey tehemten  
Te'cîl ci ye kî ye te duşmen«

Go »rabe Sitî ko min dereng e  
Îro me digel vî malî ceng e

Tiflê xwe xilaş ke dê biçit mal  
Mal bo min û ha ji bo te mindal

Sermayeyê <sup>c</sup>umrê zindeganî  
Ye<sup>c</sup>nî Mem û Zîn bi dilgiranî

Mayîne di werțeya belayê  
Min qeşd e ko ez bidim rehayê

Xel vedikujit agirî bi avê  
Ez dê vekujim bi agir avê«

Mala xwe ji rengê qewmê Zerdeş  
Da agir, û gaziya xwe raheş

Agir ko digirte xan û manan  
Wî girte bi gazî û fişanan

Eqwam û qeba<sup>2</sup>il û <sup>c</sup>eşair  
Bi-l-cumle bezîne def-i agir

Agah ko bûn emîr û xulman  
Xalî kirin ew sera û bustan

Ew jî ko bezîne wê hewarê  
Wî muttehemî we gote yarê

»Tacdîn te dî ci reng eda kir  
Mûsa li me behr-i xem ziwa kir

Rabe tu here ḥeremserayê  
Da ez çime agir û nidayê«

Zîn rabû we çûye xelweta xas  
Tacdîn ne ma ne cil ne palas

Esbab û tecemmûl û defîne  
Emlak û cewahir û xezîne

Bi-l-cumle di riya birayî şotin  
Lew nav-i bi qencî tête gotin

Malî mehebîn tu ey nikûnam  
Hubba wî dikit mirovî bednam

Zinhar mebe li malî hariş  
Lewra ko dibin ji dest te warîş

Cem<sup>c</sup>a wî ji bo te barê zehmet  
Terka wî ji bo te narê hesret

Roja biçî pêsedestê barî  
Destê te ji genc û malî <sup>c</sup>arî

Ev cennet û ev qumaş-i dîdar  
Ey muflisê axiret xerîdar

Kengê ji te ra dibin tuyesser  
Dê bêne te »mifliso, here der«

Reh şubhetê vê cihan-i fanî  
Mift nadine pareyek ji nanî

Malî mede warişan tu meccan  
Ger dê te bivê hesa'îya can

Wariş ji te ra kefenbihayî  
Hetta nekirîn didin hesayî

Hêja ko xweş î telef bike mal  
Bi-l-cumle bide bi ḥusn-i e'c mal

Yan şerf bike mişalê Tacdîn  
Pê nav-i ebed ji bo xwe bistîn

Yan pê bigire tu yarekê qenc  
Ew çêtir e bo te ra ji şed genc

## 42. Sultanê wilayet-i mehebbet

Sultanê wilayet-i mehebbet  
Serxeylê eyalet-i meweddet

Gava ko ji mekmenê xulûşî  
Binimêt li textê dil cilûşî

Kengê dikitin qebûl-i estar  
Hetta 'elema xwe nakit izhar

Reh şubhetê padişahê encum  
Tabende ji taremê çiharum

Ji ewçend tebeqatê asimanî  
Ji ewçend mesafe û mekanî

Ji ewçend 'enaşir û sehaban  
Ji ewçend mewani'c û hicaban

Naçar-i dikit nufûz-i her rûz  
Elbette dibîte 'alem-i efrûz

Ev padişehê ko 'işiq nam e  
Rojê bi wî nisbetek temam e

Ew jî qe venâşirit çu caran  
Naçar bi ker dikit sitaran

Razê di dilê Memê û Zînê  
Sazê ko di perdeya evînê

Hindî negihiştibû zebanan  
Ned'bû çu ziyan ji bo xwidanan

Miqrabê zebanê xelqê nasaz  
Bê perde ko bû terane perdaz

Zînê ne guneh, Memê ne sîcek  
Agah-i kirin buzurg û kûçek

Zengil bi devan gihan ve zengûl  
Meftûlê enamilan ji merxûl

Uşşaqt hêzîn û bênewa bûn  
Xel teşne Huseynê Kerbela bûn

Meclis bi newayê zîr û bem bûn  
Memlû ji hewayê Zîn û Mem bûn

Barê li cummazeyê ne bes bû  
Xemmas-i di merteba ceres bû

Ye<sup>c</sup>nî xeberê di herdu yaran  
Nemmam û hesûd û hîlekaran

Ewçend di meclisan gerandin  
Ewçend bi qemsiyan gihadin

Hetta Bekirê ji rengê iblîs  
Şâhibxeredê xebîşê telbîs

Ew jî ji wî ھالî bû xeberdar  
Rabû ji cihê xwe ew xereddar

Tenha xwe gihande xelweta mîr  
El-qışse kir ew qediyye teqrîr

Mîr hate tehewwura bi җîret  
Bû җerqeyê behrê fikr û hîret

Pirsî ji ewê xebîse salûs  
Go »ev xebera xilafê namûs

Em dê ku ھeqîqetê ےyan kin?  
Serrişteyê tuhmetê beyan kin«

Go »emir bike Memê bixûnin  
Hon herdu di xelwetê ko rûnin

Mem ےاشقê şadiq e bizan qenc  
Vê ra bileyîze tu bi setrenç

Şerşê xwe ji wî bixwaze dilxwaz  
Dê keşif bîbit ھeqîqeta raz

Gava ko ewî dikî tu mexlûb  
Bê rast bibê kî ye te metlûb

Mem fîhris û betl û sîneşaf e  
Xâşma bi te ra xwe bêxilaf e

Hubba di dilê xwe nakit inkar  
Sirra xwe dikit ji bo te iqrar

Şabitqedem e di vê evînê  
Dê bêt-i ko aşiq im li Zînê

Paşê tu yî şahibê kiyaset  
La'iq wî bibîn ci ye siyaset«

Hukkam ji cinsê şah-i mar in  
Eşhabê sumûm û mihredar in

Mihran ko didin bizan ko zehr e  
Mihrê ko dikan bizan ko qehr e

Aqil hezerê dikan ji maran  
Xafil dibine muhibb û yaran

Herçend li nik bi izz û naz î  
Herçend digel bi lu'b û baz î

Cuz'ê bibitin ji te texeyyur  
Kullê dikitin li te tedebbur

Xâşma ko hebin xebîş û xennas  
Bedxwah-i bexîl bin mine n-nas

Tehqîq-i xirabtir in ji şeytan  
Ya reb, meke wan querîbê sultan

### 43. Salarê mewakibê kewakib

Salarê mewakibê kewakib  
Serdarê țewali<sup>c</sup> û җewarib

Sulṭanê serîrê çerxê rabi<sup>c</sup>  
Weqtê weko bû ji şerqê țali<sup>c</sup>

Şetrencê mah û cundê exter  
Bi-l-cumle li ser bisațê exđer

Şehmaṭ kirin bi beydeqa nûr  
Te d'go hemî bûn di tûrî mestûr

Mîrê ko ji xîretê dilefkar  
Şêrê ji hemediyetê birîndar

Hetta şibeh xew nehate çavan  
Sakin nedibû ji rengê avan

Rojê ko ji meşriqê nema nûr  
Afaq kirin ji ȝulmetê dûr

Mîr rabû û hate şehnişînê  
Nêzîk-i serayê nazenînê

Rûnişt we gote pêşekaran:  
»Hon gazî bikin nedîm û yaran

Tenha ji mi ra Memê bixwînin  
Tacdîn û digel biran mexwînin

Îro li Memê ezê xedeb kim  
Sûcek wî heye edê edeb kim

Nabit ko ji min bibin di җafil  
Bi-l-cumle bi emrî bin di ‘acil«

J’ew paş şihande nik xwe Mem xwend  
Hađir kiribûn gulab û gulqend

Ewçend şerab û qend û şekker  
Ewçend gulab û misk û ‘enber

Înan û di meclisê gerandin  
Kêfê di xwe ser bi ser gihadin

Encam-i tekellum û xeberdan  
Kêşane bi sağırenc û nerdan

Mîr gote Memê bi kîn û kerbe  
»Îro me digel te ceng û herb e

Rabe ji mi ra were muqabil  
Bêşik bi te ra ez im mucadil

Şerî me digel te ey serefraz  
Herçî te divê ji bo me dilxwaz«

Lê mîr ji kuran hebû ciwanek  
Mehbûbê zemane niktedanek

Yûsif ji melaḥeta wî meḥcûb  
Rustem ji şeca'eta wî mexlûb

Hemşuhbet û hemdemê Memê bû  
Hemşahî û hemxemê Memê bû

Serdarê kuran bi navê Gurgîn  
Fi l-ḥali xeber gihande Tacdîn

Ew beṭil ko bû ji ḥalî waqif  
Rabûn bi wî ra Çeko û 'Arif

Şêran verisand-i qeyd û zincîr  
Hersê bi tebayî çûne nik mîr

Tacdîn ko digel biran bi meş hat  
Ke'beyn ji bo Memê duşes hat

Fîl û rux û kerkestan ko hatin  
Dîn mîr û mu'ellimê xwe mat in

Zanîn ko Memo bi bend û baz e  
Mîr gote Memê »du destê taze«

Sê dest ji mîr birin temamî  
Muṣsid fekirî ji wî meqamî

Zîn dî ko li pencerê diyar e  
Mihr e li mehê dikit nezare

Bedxwah binê ci ḥîle rakir  
Evrenge behaneyek eda kir

Go »bend û leyîz û cih bi dor in  
Hon herdu cihan bi hev bigorin

Mem dê bibitin vê carê mexlûb  
Haşil bibitin ji bo te metlûb«

Mîr rabû û çû cihê Memê jar  
Mem hate cihê ji pêş ve dildar

Çavê di Memê ko dîn ruxê Zîn  
Muft dane ji dest xwe fil û ferzin

Dil maye li pencer û şibakan  
Hespê xwe dida l' ciyê peyakan

Mîr bir ji Memê temamî şes dest  
Mem bû ji meya ji pêş ve sermest

Mîr gote Memê »me bir xwe dilxwaz«  
Wî go ko »bibê, ci ye te daxwaz«

Mîr go »me xered ne kesb-i mal e  
Meqsûd ji teyê me keşf-i hal e

Metlûb ji le'b û bend û bazan  
Qet nîne bi xeyrê keşf-i razan

Şerî min ew e bikî tu iqrar  
Kanî di dinê kî ye te dildar

Herçî periya te dil li bal e  
Horîşifet e melek müşal e

Ger la<sup>ı</sup>qê te ewê bibînim  
Malê xwe bidim ez ji bo te bînim«

Sahibxeredê di weqtê furşet  
Te<sup>c</sup>na xwe ji rengê def<sup>c</sup>-i tuhmet

Go »min diye ya Memê ھebandî  
Kûjek <sup>c</sup>ereban e lêvdeqandî

Ser ta bi piyan reş e wekî qîr  
Ne la<sup>ı</sup>qê behş û xwestina mîr«

Te<sup>c</sup>nê li Memê wereng eşer kir  
Yekcar-i ji <sup>c</sup>eqlî bêxeber kir

Behra dilî perde lê bi coş hat  
Nagam bi gazî û xuroş hat

Go »qet ne we ye wekî wî guhtî  
Mîr<sup>ı</sup>im periya dilê me şuhtî

Şehzade ye şehnişîn mekan e  
<sup>c</sup>Enqa ye bilind-i aşيان e

Mîranî ye ew ji nesl-i pak e  
Nûranî ye ew ne ab û xak e

Serdefter-i ھor û nazenîn e  
Herçend melek-i bi nav-i Zîn e«

Mîr ev xebera xilafê heybet  
Gava ko bihîst-i hate xîret

Wî gote qebîleya xulaman  
»Hon bo çi gelî nemekheraman

Vî nakesî nagirin bi zillet  
Da ez bikujim ewî bi ‘ibret«

Rabûne Memê duşed xedenfer  
Mem rabû pê bi dest-i xencer

Tacdîn û Çeko digel birayî  
Rabûn bi te‘eşşub û tebayî

Gotin »gelî cundiyan, vewestin  
Hon cumle ne serxweş û ne mest in

Hon qenc dizanin em kusan in  
Şahîbhiner ïn û pehlewan in

Panşed ji we hemle kin bi kerban  
Nadîne we nobeta çu dîrban

Gerçi we ecel bi dest me nîne  
Emma we gelek ji dest me dîne

Hetta ko bikin Memê giriftar  
Sêşed ji we dê bibin birîndar

Hetta ne me hersiyan bi ker kin  
Hon dê li Memê kusa nezer kin

Herçî kirî hakimê me ferman  
Em nabine mani‘ê çu hukman

Destê di me bestine li ber mîr  
Ha gerden û dest û pê û zincîr«

Mîr rabû û dest û pê Memê best  
Tacdîn mirina xwe wê demê xwest

Emma çi bikit ji bo ne <sup>c</sup>ar e  
Cellad ne mîr e xundikar e

Mem girt û şihande pêş-i serheng  
Go »hebs bikin di qulleya teng«

Hilgirtin û birne pêş-i dizdar  
Mehbûs kirin di qulleya tar

Dîwanî û meclisi belav bûn  
Bi-l-cumle ji bo Memê di mehzûn

Dîwane şifet bi ah û feryad  
Hemyan dikirin ji bo Memê dad

#### 44. Mihra felekê ezel ´edîm e

Mihra felekê ezel ´edîm e  
Kîna felekê ebed qedîm e

Herçî weko ew ji ´erdê rikit  
Elbette wî dê di ´erdê ra kit

Ulwê ji xwe ra ´eyan dixwazit  
Suflê ji me ra nihan dixwazit

Nabînî, hero ko afitabê  
Davête muşareya turabê

Xasma ko digel qebîlê ´aşiq  
Hem xa'in û xwar e hem munafîq

Elbette dilê me ´isqibazan  
Ewwel dibilitin bi şenc û nazan

Axir dikitin melûl û me'yûs  
Manend-i Memê zelîl û mehbûs

Davêjite mehbesê bi nakam  
Datînite merqedê serencam

Ew bextreşê leqeb li wî Mem  
Bê hemnefes û heval û hemdem

Havêtine çalekê bi zarî  
Teşbih-i bi gorê teng û tarî

Mekrûh wekî dehanê ejder  
Menkûr wekî Nekir û Munker

Rûnişt-i di wê ve 'abidane  
Zindan li wî bûye cillexane

Ew cih li wî bûye çah-i Nexşeb  
Ew Meh geriya hilal-i yekşeb

Şofî ko gihişte kuncê xelwet  
Şêxînî giha meqamê wehdet

Geh şubhetê 'aşiqan bi dilxwaz  
Geh şubhetê 'abidan bi daxwaz

Herlehze digel kela girînê  
Evrengehe wî digote Zînê

K'ey müşlê herareta xerîzî  
Îrohe di müşrê dil 'ezîz î

Şedcar hero li qelbê xemnak  
Pîrahen-i şebir min te kir çak

Geh geh ci dibit wekî Zuleyxa  
Pirsa me bikî tu ey şekerxa

Leyla tu yî ez ji bo te Mecnûn  
Gulgûn ji te ra sirişkê pîrxûn

Ferhad im ez û tu bo mi Şîrîn  
Seylab-i sirişkê coyê şîrîn

Dinya li me gerçi bûye zindan  
Îrohe tenê ez im musilman

Lewra ji devê nebiyyê mursel  
Bû ev xebere şehîh û mursel

Dinya ko bihişt-i kafiran e  
Me'wayê belayê mu'minan e

Herçend qewî muşewweş im ez  
Ewçend bi muşewweşî xweş im ez

Şed sal bigêrî min tu mehbûs  
Ma ez qe dibim ji weşlê me'yûs

Şondê dixwim ez bi sûreyê Nûr  
Dêma ko ew e kitab-i mesûtûr

Deh car-i bi heqqê bejn û balê  
Çil car-i bi heqqê zulf û xalê

Teħqîq bi afitabê ruxsar  
Teşdîq bi mahitabê dîdar

Te'kîd bi qiblegahê ebrû  
Te'zîm bi secdegahê gîsû

Sed car qeşem bi herdu nûnan  
'Ehda min ew e digel 'uyûnan

Hetta remeqek hebit ji canî  
Cana, tu di canî da nihan î

Hindî ko ji hecrê bêqerar im  
Ewçend-i ji te umîdiwar im

Herçend ko mîr li min xedeb kir  
Ev qehre li min ne bê sebeb kir

Herçend xeberê Bekir wî guh kir  
Ev cebr-i li min ewî bi cih kir

Lewra ko tu şah î ez geda bûm  
Ez bo te ne kufû û hemliqa bûm

Tu mihircemal û mehcebîn î  
Evçende leşîf û nazenîn î

Ez xar û ژelîl û xakisar im  
Evrenge deşîf-i dîlfîkar im

Perwane me ten mi daye agir  
Şuhtî me bi başin û bi zahir

Nîlûfer e dil tu afitab î  
Ten şubhê kitän tu mahitab î

Ger ten birizit we ya bîbit xerq  
Wîer dil bîbitin di behîr-i xem xerq

Heqqê min e şedîl e ژulm nîne  
Xaşiyet-i agirê evîn e

Ev çale egerçi zêde kûr e  
Emma ji ‘edaletê ne dûr e

Şofî me û şewme ‘enîşîn im  
Xweş ṭalibê nûr-i rûyê Zîn im«

Haşil qewimî meqamê »mûtû«  
Bermûcibê »qeble ‘en temûtû«

Tezkiyyeyê nefş bû mukemmel  
Teşfiyyeyê qelb bû muheşsel

Ayîneyê rûh bû mucella  
Nefş û dil û can bi hev muşeffa

Ew mu‘tekifê di dewr-i çalê  
Hêja negihiştî dewr-i salê

Belkî ne cil û ne erbe ‘înek  
Zenna di dilê wî bû yeqînek

Meşhûd bûyin li qelbî enwar  
Mekşûf bûyin li ber wî esrar

Ayîneyê dil we bû müşeyqel  
Şûret we bi me‘neyê mubeddel

Ew heykelê metleba mecazî  
Bû mel‘eb-i ṭiflê ‘îşqibazî

Ev mumkin û ma-siwa sera-ser  
Fi l-cumle ji bo wî bûne menzer

Ev dar û ber û dewab û insan  
Ev me<sup>c</sup>den û ev nebat û heywan

Herçî ko bi dil wî lê nezer kir  
Herçî bi xeyal wî lê guzer kir

Her yek dinima ji bo wî Zînek  
Meşhûd-i ji her yekê yeqînek

Goya bi xwe ew reşednişîn bû  
Ew çal-i ji bo wî dûribîn bû

#### 45. Zîna ko bi derdê hecrê xemgîn

Zîna ko bi derdê hecrê xemgîn  
Bêsebr û sukûn, qerar û temkîn

Hindî weko Mem nebûyî mehbûs  
Hêja nedibû ji weşlê me'yûs

Gava weko Mem gihişte çalê  
Umîd nema ji bo wişalê

Nezhetgeh û şehnişîn û eywan  
Lê bûne hisar û hebs û zindan

Hindî weko şerbet û te'âm bûn  
Goya ko li wê hemî heram bûn

Canî nedikir çu xwab û rahet  
Cismî nedidî çu tab û taqet

Ewreng de'if û jar-i bûbû  
Goya ko bi cismî tar-i mü bû

Ew mü geriya ye ze'feranî  
Teşbîhê bi reng û rûyê Xanî

Şeb ta bi seher seher heta şeb  
Fariş nedibû ji zikrê »ya reb«

Herlehze digote çerx-i dewwar  
K'ey ژalimê bêeman xwînxwar

Min qesd û xeredj digel te nîne  
Aya te digel min ev ci kîn e

Dewrek te nekir demek ji bo min  
Pir dî te meger Memek ji bo min

Nûrek di rûyê me kir te peyda  
Şuhtin li Memê te pê suweyda

Şewqek di ruxê Memê te hil kir  
Qelbê me bi wê te şot û kul kir

Aya te ci meşlehet di min dî  
Nîşan-i me da te yêkê cundî

Ewwel te kusan li min 'eyan kir  
Paşê te çira li min nihan kir

Şuhtîn te bi agirê firaqê  
Kuştîn te bi derdê iştayaqê

'Alem hemî bi yek ve şad û xurrem  
Dayîne min û Memê te me tem

Derdê xwe ji bo mi ra bibêje  
Jehra di dilê xwe da birêje

Yûsif te li min şihande çalê  
Hiştim te di vê xirabemalê

Ye<sup>c</sup>qûb şifet hêzîn û nalan  
Şebra dil û can te bir bi talan

Ez mayime her wekî Zuleyxa  
Bê Yûsif û bê murad û me<sup>c</sup>wa«

Geh şekwe dikir ji bo Memê jar  
K<sup>c</sup>ey Yûsifê bêguneh giriftar

Da fikir nekî ko rahet im ez  
Da zen nebirî bi taşet im ez

Wellah qeşem dikim bi barî  
Rojê di spî şevê di tarî

Nînin ji mi ra çu xwab û xwarin  
Illa ko du dîde xwîn dibarin

Bîdarî ye şen<sup>c</sup>etê du çavan  
Xwînxwarî ye xwarina hinavan

Ey qibleyê qelbê min, bi dilxwah  
Wey ke<sup>c</sup>beyê can bi Ke<sup>c</sup>betu l-lah

Herlehze ji destê firqeta te  
Herweqt-i ji derdê hesreta te

Şed ah û duşed enîn û efşan  
Bêgav-i me têñ ji nêv dil û can

Evrenge ye halê min şeb û rûz  
Halê te kusan e ey dilefrûz

Zindaniyê min te kî celîs e  
Sewda'iyê min te kî enîs e«

Ey dil tu ji qelbê min bi der kev  
Wey can tu ji bo dilî bi ber kev

Hon herdu herin Memê bibînin  
Lê yek xeberê ji bo me bînin

Ey dil tu ko lê dikî selamê  
Zû bîne ve bo mi ra peyamê

Kanîn bi çi hâl e ew giriftar  
Danîn çi xeyal e ey dilefkar

Kanî li me aş e ya ne zîz e  
Baxê wî bihar e ya peyîz e

Xweşreng û leşîf e şubhê şorgul  
Yan jar û deşîf e müşlê bulbul

Eywan li me bûye darê miğnet  
Zindan bi me bûye başê cennet

Xweziya ko li min xedeb kira mîr  
Manend-i Memê bi şull û zincîr

Ez jî bişihadima wê çalê  
Rojek veketa li min ji salê

Carek bidiya min ew giriftar  
Derman bikira min ew birîndar

“Umrê min egerçi yek remeq bû  
Heqqa ko mirin ji bo me heq bû

#### 46. Eczayê kitabê ‘işqibazî

Eczayê kitabê ‘işqibazî  
Şehhafê mucelledê mecazî

Şîraze û cuz<sup>3</sup> û bend û terkîb  
Evrenge kirin bi nezm û tertîb

Go, Zîn û Memê di naziperwerd  
Gava wehe der vebûn li wan derd

Ew derd we bûne behr-i ateş  
Ew ateşê xem we bûye serkeş

Xelqê ko hebû ji ‘işqê teşwîr  
Wî agirî kir li wan we te<sup>3</sup>şîr

Me'lûl bûyin hemî bi derdan  
Yekcar bi der ketin ji perdan

Xâşma ko muwafiqê di dêrîn  
Hemşuhbetê wan Sitî û Tacdîn

Derdan we li wan ji nû ve serdan  
Êdî nedihate jê xeberdan

Herçend ko ew ji van cuda bûn  
Dîsan bi wî derdî mubtela bûn

Derdê Sitiyê xeyal-i Zîn bû  
Tacdîn ji xema Memê we dîn bû

Herlehze digel biran bi şer bû  
Qeşda di dilê wî ev xeber bû

Rabit bi xedeb biçîte pêş Mîr  
Daxwaz bikit Memê bi teqşîr

Carek biçitin Memê reca kit  
Sûc û gunehê Memê tika kit

Da mîr ji wi ra birayî berdit  
Ya ev ser û malî tê bi der dit

‘Arif wehe gote Ristemê Zal  
»Ev emir bi min mehal e bê qal

Bê ceng û cidal û bê tehewwur  
Qeṭ vî şuχulî mekin teşewwur

Ev me<sup>c</sup>reke nabitin bi dîwan  
Em mane û şubhe şehnê meydan

Ya qenc ew e em şube siwar bin  
Hersê bi silah û kar û bar bin

Çarane û cewşenan di ber kîn  
Zendane û mexferan li ser kîn

Gurzan bihejîn riman bibazîn  
Evrenge Memê ji mîr bixwazîn

Ya dê bi kutek Memê xwe berdîn  
Ya cumle bi merdî ser bi der dîn

Ger wî bi vî rengî Mem reha kir  
Derdê di dilê me wî dewa kir

W'ær mayî müşir li ser 'inadê  
Em dê bikirîn we reng cihadê

J'ewwel ve biçîn Bekir bi ker kîn  
Wî mudbirî jê re der bi der kîn

Her berderekê gurek li ber bit  
Xeşmaneyê qenc ser bi ser bit

Mîr er ji wi ra bikit te'essub  
Rabit li me ew bikit texellub

Aşê ecelî wisa bigêrîn  
Teşbîhê heban seranbihêrîn

Buhtane bikirîne reqş û govend  
Da bêne temaşeyê şekerxend

Gava weko dest bidîne herban  
Mehbûb-i temaşe kin li ɬerban

Herlehze bibêjin ew perîzad  
Destê di we ey ciwan merîzad

Hindek bigirîn hinek şena kin  
Hindek bikenin hinek du'a kin

Dildar nezer bikin ji burcan  
Durdane bi der kevin ji durcan

Şehzade ji penceran nezer kin  
Gulpîrehenan di ber xwe ker kin

Herdem bibihêن ji nazenînan  
Şed medh û hezar aferînan«

Tacdîn xebera birayî guh kir  
Muhkem di dilê xwe da bi cih kir

## 47. Serşubhe, ko şehsiwarê efleq

Serşubhe, ko şehsiwarê efleq  
Eşheb ko kişande cayê ebleq

Edhem di tewîleyê nehîn kir  
Eşheb ji xwe ra ji nû ve zîn kir

Gurzê xwe yê ateşîn deranî  
Tîxê xwe yê zerfeşan ko danî

Dunya ji mehabeta xwe zer kir  
Tîx û kemera çiyan bi ker kir

Tacdîn û biran ji xelqê li alî  
Xwestin bi dilê xwe wan hêlalî

Kêşane derî bi reqs û bazî  
Rexşê erezî semendê tazî

Mismar kirin bedû ji xeflet  
Hişyar kirin edû bi şewlet

Meydan bi dewan kolan bi destkor  
Goya vedidan li dijminan gor

Tacdîn ji tewabi cê xwe yek pîr  
Te cîn kir û zû şihande pêş mîr

Got'ê here bêje »mîr û ayan  
Bînende venakujin çiraxan

Mîrê me egerçi dûribîn e  
Îro wî di çavî nûr-i nîne

Em çar bira hebûn di şadiq  
Herçar li xidmeta wî <sup>c</sup>aşiq

Inşaf e ko zêdetir ji salê  
Mem mayiye bêxwidan di çalê

Dijmin li me şa ne dost-i ҳemgîn  
Ferđ e mirina Çeko û Tacdîn

Mem gerçî ko zêde pîrgunah e  
Lê <sup>c</sup>aşiq e, <sup>c</sup>işiq padişah e

Hzukum tu meke li padişahan  
Zûlmê tu meke li bêgunahan

Em hêvî dikin Memê reha ket  
Derdê di dilê Memê dewa ket

Em çar bira ne çar-i dîwar  
Erkanê se<sup>c</sup>adeta wî herçar

Herçar serê di me wekî go  
Çewganê iradeta wî kaşo

Ya meşlehetê ji bo me çêkit  
Ya ne ji me ra Bekir verê kit

Da em xeberan ji bo wî bêjin  
Derdê di xwe em li wî birêjin

Rûmet me nema li rûyê <sup>c</sup>amê  
Dê neqil bikîn biçîne Şamê«

#### 48. Teqrîr-i ko kir temamî qaşid

Teqrîr-i ko kir temamî qaşid  
Waqif geriya bi ھالî ھاسد

Zanî ko ji bo wî ra xirab e  
Go »<sup>c</sup>efû ji bo Memê şewab e

Mîr'îm me nego ji bo te pêşîn  
Tacdîn û biran ji xwe meêşîn

Zînê bide wan we ya bikuj min  
Yan ew bi te ra ne xeşm û dijmin

Ya qenc ew e qeṭ nekî tekellum  
Tacdîn ji te nakitin teweħħum

Bêjê me fida kirin Mem û Zîn  
Tezwîc kirin me dane Tacdîn

Zahir meke tu vê <sup>c</sup>inadê  
Carek vekuj agirê fesadê

J'ew paş-i tu bêxe weqt-i furşet  
Zinhar medê eman û muhlet

Xeşmê ko neşî bibî muqabil  
Derman ci ye şerbeta helahil

Lew lazim e ḥakiman du fincan  
Yek xaşê xerab û êke qencan

Da yek nexweşan ji bo wî xweş kit  
Ya dî ji wi ra xweşan nexweş kit

Yek canî ji dijminan cuda kit  
Ya dî miriyan ji nû ve rakit

Kerba xwe meke tu aşikara  
Ya qenc-i ew e em bikîn mudara

Şolin hene ew bi kerbê nabin  
Lewra ko bi zor û ȳerbê nabin

Ustadî divêtin û teemmul  
Ixfa' û texaful û tehemmül

Ewqatê zemane, gûne-gûne  
Barî ji me ra kirin numûne

Ye'ñî şev û roj û şubh û şam in  
Hin rohne ne hin ji wan ȝelam in

Em jî di leyalî û neharan  
Da bêñ bi nihan û aşikaran

Hin ȝahir û hindekan bi xef kîn  
Rakîn hinekan hinan telef kîn«

Wî mulhidî şîr wisa seqa kir  
Mişrî ji xwe ra wisa bira kir

Pend û xeleş û xilaf û yalan  
Bend û seqeş û xilaf û kalan

Tesnî<sup>c</sup> kirin wî hinde teşnî<sup>c</sup>  
Bestin wî li şîrî şubhê terşî<sup>c</sup>

Ew şîr li bin serê xwe danî  
Ewreng-i veşar kes-i nezanî

Mîrê weko dil bi kerbê şotî  
Herçî ko Bekir ji bo wî gotî

Bawer kir û gote merdê qaşid  
»Ey pîr, meke tu fîkrê fasid

Ger fewt bikim cemî<sup>c</sup>ê ferđan  
Tacdîn ku didim ji dest xwe erzan?

Min şewket û şelşenet bi wî ne  
Ev şuhret û şanê min ji wî ne

Ev nam û nîşan û ev meqame  
Bê xaşirê wî li min heram e

Ew rustem-i gêw e, lendeha ye  
Gencîne me ez, ew ejdeha ye

Bêj<sup>j</sup>ê bi dilê xwe min Mem û Zîn  
Herdu bi hêlalî dane Tacdîn

Bêwec ji min tu bûyî wehşî  
Daxwaz te kir ko min nebexşî

Tacdîn û Çeko bi <sup>c</sup>izz û naz in  
Dê her we bitin wekî dixwazin«

Qaşid ko rewane bû ji pêş mîr  
Teqrîr ko kir temam-i te<sup>c</sup>bîr

Şêrê dilşer we bûn mula<sup>im</sup>  
Gotin »dem û dewleta wî da<sup>im</sup>«

#### 49.Êvarê ko asimanî menqel

Êvarê ko asimanî menqel  
Danî û li wan veşar-i meş'el

Ye'nî ko vekuşt çiraxê zerrîn  
Wergirt-i ji nû libasê rengîn

Mîrê ko hemîşe şad û xurrem  
Goya ketibû libasê me'tem

Wî bextek-i rûsiyah-i mel'ûn  
Gava ewî dî emîr-i mehzûn

Go »xem mexwe ey çiraxê dewlet  
Ger 'umir bidit ji bo me muhlet

Ev kerb û elem eger te navê  
Zînê û Memê ji dil xwe bavê

Ew herdu ne, ba'ışê fesadê  
Ew bûne sebeb ji bo 'inadê

Ger izin bidit ji bo mi ra mîr  
Ez dê bikujim Memê bi tedbîr

Tacdîn û biran bi şerbetek zehr  
Tu d'sî demekê ewan bikî qehr

Emrê ko dabit tedarik asan  
Ageh meke pê tu xelq û nasan

Mîr'im, tu here bibêje Zînê  
Mem şuhtkiye agirê evînê

Mem teşn e tu ab-i zendegan î  
Mem murd e tu canê cawidan î

Bêj'ê ko here Memê derîne  
Min dayiye te, ji bo xwe bîne

Min zaniye Mem ziyade jar e  
Perwane ye meqşeda wî nar e

Gava ko nezer bikit li Zînê  
Tehqîq e ko nakitin çu jînê

Fi l-ħali dema ko wê bibînit  
Bawer meke ew bi rûh bimînit

Mem ger bi vî rengî zû fena bit  
Dê keşmekeş û niza<sup>c</sup>-i rabbit«

Mîrin hene <sup>c</sup>aqil in, <sup>c</sup>ezîz in  
Lê sadedil in di bêtemîz in

Ew sade ji bulh û natemamî  
Dil nadine menşe<sup>a</sup> kelamî

Wan dil guh e, guh bi dil ve nîne  
Reşçav in û merdimek spî ne

Herçî ko dibêjinê xereddar  
Bawer dikan ew bi rastiyê xwar

Nabêñ »eve qenc e ya xerab e«  
Nabêñ »eve xet' e ya şewab e«

Qaşirnezer in di bêteemmul  
Hadırxedeñ in di bêtehemmul

Exleb dibil ew bi 'eqlü mexrûr  
Ekşer digerin ji danışê dûr

Bedxwah û bexîl û bedsigalan  
Bedeşl û sefh û bedfi'alan

Tînin dikine refîq û rehber  
Bednam dibil wezîr û serwer

Dispêrine van kesan umûrê  
Ew têxine dewletê quşûrê

Mîrê di bi dewlet û firaset  
Şahibşefqet-i xwidansiyaset

Ew her kesekê xwidan-i nakin  
Hetta weko imtihan-i nakin

Çil car-i dikan yekê mucerreb  
Paşê ewî dê bikin muquerreb

Ev mîr û wezîriya cihanî  
Ev begme gizîriya zemanî

Herdu bi mişal-i yek leyîz in  
Herdu di betâl û bêtemîz in

Ḩetta weko kerr nebî tu el-heq  
Kengê dibiye wezîrê muṭleq

## 50. Tedbîrkunende pîrê ‘aqil

Tedbîrkunende pîrê ‘aqil  
Evrenge he bû ji bo me naqil

Go, mîr bi müşawirî û rayê  
Weqtê weko çû ḥeremserayê

Zîn gazî kir û li ba xwe danî  
Ew perde ji ser serî hilanî

Go »bêdiliya Memê me bes kir  
Azerdenî min li wî ‘ebes kir

Cewr û sitema ko min li wî kir  
Ew cewr te kir, sitem ewî kir

‘Isqa te ji wî ‘eqil revabû  
Şeyda û cunûn û mubtela bû

Zanî ji ḥekîmekê me tedbîr  
Dîwane dewa dîbin bi zincîr

Lew min bi xedeb şihande çalê  
Ew hebis li wî gihande salê

Da ‘isq bikit kemal-i haşil  
Hubba we nekit wişal-i baṭil

El-ḥal-i dema bi qelb û canî  
Miqdar-i mehebbeta we zanî

Hon herdu di merteba kemal in  
Meqbûl in û qabilê wişal in

Mem ḋaşıqê sadiq e bi tehqîq  
Qelbê me dikit ji bo wî teşdîq

Me'mûr e bi emrê padişahî  
Me'zûr e bi ḋuzrê bêgunahî

Herçî ko li wî bikit ḋitabê  
Elbette dibînitin ḋiqabê

Ḩusna te ye ew kirî giriftar  
Ḩubba te ye ew kirî birîndar

Tîra wî li dil ketî te lê da  
Ew darûyê bêhişî te pê da

Ew surme di çavê wî te kêşa  
Hetta tu nedî wî dil neêşa

Zulfa te li dest û pê wî bestî  
‘Eqrebşifeta dilê wî gestî

Toqa te li gerdena wî danî  
Dava te veda li qelb û canî

Çawa vekirin te herdu ahû  
Berdane feqîrî herdu cadû

Dîsan tu here digel xeber de  
Qeydan tu veke ji bo xwe berde

Ey xunçeyê naşikefte'ê sorgul  
Bişkîn qefeşê derîne bulbul

Ew têhn e tu kahniya ferat î  
Ew xest e tu çeşmeya heyat î

Ew teşn e tu ab-i zindegan î  
Ew murd e tu canê cawidan î«

Ew perdegiya ko pirhewa bû  
Međbût-i di perdeya hîyea bû

Ew perde biray ko lê hilavêt  
Xwînê di dev û gepê we havêt

Zîna ko dişed birîn li cergê  
Çû halet-i fewt-i şadimergê

Beħra ko ji cunbuşa hewayê  
Meħfûz-i bi perdeya hîyeayê

Haciz ko hewa reva ji mabeyn  
Berzex ji hîyea nema di beħreyn

Ew qulzim-i xem kelî bi ser coş  
Ser coş û kelî yû perand-i serpoş

Serpoş perî ji dilê pela xûn  
Havêt-i wekî Ferat û Ceyħûn

Goya hejiya hezar-i bîşe  
Mey bû rijiya ji qelbê şîşe

Mîrê bi xeredê ketî li Zînê  
Ewreng-i reva kela girînê

Hadîr ji dûyê kebabê ulfat  
Geriya wî di çavê eşk-i şefqet

Fewwareyê merhemet bi kel hat  
Bêgav-i girî ewî digel hat

Ewçend girî bira digel wê  
Hetta şubeh her we man di xelwê

Zîn xerqe'ê xwîn-i dil wekî gul  
Mîr lê digirî mişalê bulbul

Mehrem hemî vêk ketin li ba wan  
Bi l-cumle bezîne dest û dawan

K<sup>o</sup>ey xusrewê heqşinas ê <sup>c</sup>adil  
Naheq tu ji bo ci bûyî qatil

Zîn gulbun-i baxê <sup>c</sup>işmetê bû  
Zîn serw-i riyadê <sup>c</sup>iffetê bû

Pakîzedira şedef ji her can  
La<sup>o</sup>iq te nebû bigerî mercan

Nazikbedena letîfe me<sup>c</sup>şûm  
Bêcurim bikî ji <sup>c</sup>umrî mehrûm

Evrenge di xak û xwîn tu rakî  
Bêşûc ji can beden cuda kî«

Mîr go »mekirin xeyalê baṭil  
Ew bêhiş e ez nebûme qatil

Zînê dikujim meger bi ‘emda  
Tûba ye di cenneta ḥerem da«

Ehlê ḥeremê bezîne ser wê  
Cobar rewan kirin li ser wê

Bû şîwen û şîn di xan û manan  
Feryad gihane asimanan

Yek hat ji der ve nagihanî  
Go »Mem mir û dawe zindegânî«

Zînê mirina Memê bi guh ket  
Goya miribû ji nû bi ruh ket

Rabû, fekirî di çar kenaran  
Dî mîr digirît şubhê baran

Xelqê ḥeremê xewaş û ‘amî  
Matemzede bûne bi-t-temamî

Go »ey sebebê se‘adeta min  
Bêkêf-i mebe di de‘weta min

Ey şah te daye ruhî ruxset  
Fewta xwe wî dî ji bo xwe furşet

Can çû û bi canî mutteşil bû  
Ew rûh bi rûh-i muđmehil bû

Hetta ko nebû ji dev te iqrar  
Ew mayî di hebs-i ten giriftar

Teşbîhê Memê melûl û mehbûs  
Bo hifz-i riða û nam û namûs

Ew lew nedîçû heta ve îro  
Mabû li jivaniya te gîro

Rûh' im te ji dil dema riða da  
Şah' im te di mulkê ten şela da

Cismê min î bênewa giran bû  
Rûha min e natiwan rewan bû

Derhal-i ji qalibî bi der ket  
Şewqek ji ruha Memê bi ber ket

Wan terk kirin serayê fanî  
Ew çûne cihanê cawidanî

Herçî ko qebûl nekit mekanan  
Dê seyr-i bikit di lamekanan

Hon vê seferê xelet mexûnin  
Şahid ji me ra muquerrebûn in

Gava weko can ji ten rewan bû  
Canan ewî dît û can bi can bû

Haşil ko ji paş-i ittişalê  
Ew pertew û meş'ela cemalê

Gavek sekinîn û muṭme'in bûn  
Hîna ko bi yek ve mu'temin bûn

Ew qet're di qulzima şifatan  
Ew zerre di behra muhlikatan

Dem hatine sahilê fenayê  
Geh çûne bi ser hedê beqayê

Fi l-cumle ji merkeza turabê  
Ew zerre gihane afitabê

Qet'a ne bi ittişal û tehlîl  
Mehđa ne bi infîşal û tehwîl

Wan rê ko birin bi canibê ȝat  
Baqî geriyan bi ȝatê ȝerrat

Nînin 'eceb ev xeber ji bo min  
Hon vê mekine hiner ji bo min

Şêxê we ko ez bi dil murîd im  
Ew ruhirewan e ez qedîd im

Herçend-i li ba we navê Mem bû  
Lê padişahék 'elîhîmem bû

Bû la'iq-i ferr-i padişahî  
Meqbûl-i teqerruba ilahî

Qelbê wî ye wadiya muqeddes  
Rûha wî bi nûr-i hêq muqebbes

Hilgirtim û bir'me Tûr-i Sîna  
Bînende kirim digel xwe bîna

Îname derê ji vê hicabê  
Ev zerre gihande afitabê

Hîna ko bi can min ev sefer kir  
Ev can mi ji canfiroş-i qer kir

Herçend-i ko zahir »iqli<sup>c</sup>î« got  
Hadîr wî di pey ve »irce<sup>c</sup>î« got

Lew hatime da bikim we radî  
Merdiyye bibim li pêş-i qadî

Da ez bikirim digel we tewdî<sup>c</sup>  
Da hon bikirin digel me teşyî<sup>c</sup>

Dîsan vejerim ji ba we reqqas  
Murtadî bibim bi cenneta xaş«

## 51. Zînê ko nimane wan keramat

Zînê ko nimane wan keramat  
Evçende menazil û meqamat

Rûnişt û weşiyeta xwe bo mîr  
Evrenge he kir beyan û teqrîr

K<sup>o</sup>ey padişehê ruhan û qelban  
Hemşîre bûyî fida û qurban

Qurbane te bin hero dişed Zîn  
Ez hêvî dikim nebî tu ҳemgîn

Roja weko bir me Mem ji bo xwe  
Bi l-cumle birin me ҳem ji bo xwe

Menşûr bûyim li kişwerê ҳem  
Ҳem bûne ji bo mi ra musellem

Mem bo min û merhemet ji bo te  
Ҳem bo min û seltenet ji bo te

Şahim bi mi ra mebe munazi<sup>c</sup>  
Ez bûme bi ҳışeya xwe qani<sup>c</sup>

Rûnî tu li textî, şubhê Xusrew  
Tacê xwe yê zer bigêre kecrew

Bezma terebê bidêre tertîb  
Zewq û ferehê bigêre terkîb

Serxweş bike sade û rewalan  
Çûn xweş ke ji nû ve pîr û kalan

Esbabê neşat û kamiranî  
Adabê şefa û zindeganî

Amade ke şerbet û te<sup>c</sup>aman  
Azade ke cariye û ₓulaman

Pir ke tebeqan ji bo nişarê  
Da bêñ fuqera di vê hewarê

Mecmû<sup>c</sup>-i bike muferrehatan  
Mexlût-i bike mu<sup>c</sup>eşteratan

Meclis bibitin bi wan mužehheb  
Tehniyye bibit ji nû muretteb

Da vêk bikevin li min şekerxend  
Têk ra hejînin bi reqş û govend

Eqsamê bixûr û <sup>c</sup>ûd û <sup>c</sup>enber  
Mawerd û zebad û miskê ezfer

Ev cins ji ni<sup>c</sup>metan bitir bin  
Ew qism ji heddî zêdetir bin

Heywaniyeta me bûye za<sup>ɔ</sup>il  
Rûhaniyeta me bûye kamil

Cismê me eger diçîte çalê  
Rûhê di me dê bikin wişalê

Eqda weko dawetî melek bin  
Eqşamê bixûr-i dê gelek bin

Lewra ez û Mem melekşifat in  
Em ma' il-i tîb û teyyibat in

Ursa ko fırıste dawetî ne  
Damad û 'erûs-i cennetî ne

Roja ko Sitî te daye Tacdîn  
Çawa te di şehrî bestine ayîn

Tenbîh bike dikan û sûkan  
Tezyîn bikin ji rengê bûkan

Buhtan tu bibê bila siwar bin  
Cindî tu bibêje da bi kar bin

Sergerm bibin wekî di 'îdan  
Hindî ko li hev bidin cirîdan

Roja ko te ew perî verê kir  
Çendî weko keyfxweşî te çêkir

Ez hêvî dikim bikî 'inayet  
Qanûnê bikî wisan ri'ayet

Îrohe ji bo mi ra du çendan  
Dîsan tu wisan bî şad û xendan

Ihsan ke tedarik û cihazan  
Hâdir bike muştiran û sazan

Manend-i ‘imareta Sitî tê  
Her şubhetê mehmela perî tê

Tabûteke zeringar û rengîn  
Şindoqeke xurdekare zerrîn

Serpoş ewê zemîn ḫela bit  
Sîwan ewê xwidancela bit

Zinhar me herdu bûk û zavan  
Bêqedir neke li pêş-i çavan

Gava ko dicîne nêv mezarı  
Da xelq nebêjîtin bi zarî

‘Eqda Sitî ci rojexweş bû  
Zînê ji ezel ci bextires bû

Ne şê mi bila Sitî digel bit  
Tacdîn digel Memê bedel bit

Manend-i Memê ji boyê Tacdîn  
Tacdîn bi wi ra bigêre şoşbîn

Şoşbîn bitin ew digel Memê min  
Şahî bitin ew digel xemê min

Ey ma ‘ilê xeyrê bêmukafat  
Wey bazîlê meqşed û muradat

Hetta veke salekê temamî  
Hindî ko telef dikî ḫēc̄amî

Hindî ko bi der didî libasan  
Hindî vedixwînî ḫam û xaşan

Hindî ko bi ker dikî qumaşan  
Hindî ko belav dikî mēaşan

Her roj bi niyyeta ẍezayê  
Hindî ko gelek dikî ḫetayê

Hindî weko tu li textî rûnî  
Her roj-i tu cundiyan vexûnî

Hindî ko tihî dikî xezînan  
Hindî weko şâ dikî hêzînan

Hindî ko ẍenî dikî feqîran  
Hindî ko reha dikî esîran

Hindî di һukûmetê xeber dî  
Hindî weko girtiyan tu berdî

Herçî ko ji bo xwe ra dikî xerc  
Herçî di xezîneyan dikî derc

Qehra weko dijminan dikit def  
Zecra weko ȝaliman dikit ref

Edla ko ji bo xwidê tu xaş kî  
Mezlûm ji ȝaliman xelas kî

Sazê ko di cengê da dibêjî  
Xwîna ji muxalifan dirêjî

Ḩetta xwirekê seyê şikarî  
Ḩeqqê ‘elefê kerê di barî

Şahim li te bit weşiyeta min  
Wan şerif bike bi niyyeta min

Mef'kir di ḥeqîqet û mecazê  
Bin'vîse li deftera cihazê

Da fexir bikim li pêş-i zavê  
Şermende nebim di weqt û gavê

Herçend ko min qewî dirêj kir  
Pirbêjî ye wê çira me bêj kir

Gorî te meqşeda me dûr e  
Dûr bit ji te merqedâ me gor e

Lew hinde qeder dibêm bi diqqet  
Da bite dilê te rehem û riqqet

Der heqqê min û Memê nekî ‘ar  
Gava dimirit Memê birîndar

Ez dê bi cenazeyê wi ra bim  
Ḩetta veke meqberan teba bim

Weqtê dimirim bidî tu destûr  
Da min bikirin digel wî mestûr

Min j' alê wî derbider negêrî  
Bêperde digel ewî veşêrî«

Zînê ko kirin weşiyyet axir  
Xa'ib geriya ji derd-i hađir

Mîr go »tu here Memê bibîne  
Ger dê mirî bit ewî vejîne

Bawer tu bike bi şidq û îman  
Bûme li te û Memê peşîman

Ger hon bimirin û ger ko rabin  
Nabit tu û Mem ji hev cuda bin«

## 52. Zînê ko bihîstin ev tekellum

Zînê ko bihîstin ev tekellum  
Ev mihr û wefa û ev terehhum

Rabû xemilî ji payî ta ferq  
Bû behr-i hûsin di gewheran xerq

Dayîn û Sitî û şed perestar  
Xurşîd û meh û nucûmê seyyar

Bi-l-cumle bi der ketin ji burcan  
Durdane bi der ketin ji durcan

Şed cariye û Sitî û dayîn  
Hilgirtin ewê bi resm û ayîn

Zanî ko nebû murad-i haşil  
Bê xelwet-i xaş-i şêxê kamil

Ew zuhre müşalê zerre reqqaş  
Bû mehrem-i raz-i xelweta xaş

Gava ko gihane xelwexanê  
Dergeh vekirin li hebisxanê

Ew pêk ve bi meş'el û fener çûn  
Dayîn û Sitî hinek di ber çûn

Dîtin ko di sahilê şedefwar  
Ew xerqeyê behr-i işq-i xwînxwar

Durdaneyê bêbihayê canî  
Der daye ji dest xwe rayiganî

Fanos-i qefeş we mayî bêtab  
Gulzar-i beden we mayî bêab

Wan pirs kirin ji xelqê bendî  
Halê wî feqîr û mustemendî

Xelqê ko digel Memê giriftar  
Gotin ko »me dî ji sethê dîwar

Berqek bi eceb Memê bi ser ket  
Şewqek ji serê Memê bi der ket

Yek şubhetê rojê yek heyîv bû  
Yek şubhetê zêr û yek ji zîv bû

Ew Şems û Qemer ko mutteşil bûn  
Derhal bi yek ve muđmehîl bûn

Gava weko pêk ve muqtebis bûn  
Ew herdu li ȝew'ê mun'ekis bûn

Ewreng geriyan munîr û rewşen  
Zindan li me kirine şehn-i gulşen

Mem jî bi vî rengî bêxeber bû  
Xwîna dilê wî bi der ve der bû«

Ey dîdeyê dil nebûyî meftûh  
Inkar nekî tecelliya rûh

Da fikir nekî ko ev ھulûl e  
Yan nesx e, xurûc e, yan duxûl e

Da ژen nebirî ko ev mişal e  
Ya qewl-i de<sup>c</sup>if e ya betâl e

Xewna tu dibînî ev meqam e  
Şey'ek ji şuhûd e natemam e

Hemşuhbetiya Memê mukerrem  
Agah-i kirin heval û hemdem

Wî murşidî qenc li wan nezer kir  
Qelbê wî di qelbê wan eşer kir

Hemxelwetiya Memê giriftar  
Bû perdeguşayê yar û exyar

Dayîn û Sitî ko çûn bi ser da  
Hindî ko ewan digel xeber da

Gotin ko »Memo, tu rabe Zîn hat  
Rûha te ye, bêguman, yeqîn hat«

Ew teşnelebê zelalê dîdar  
Şadab-i nebû bi navê dildar

Hindî ko reya dilî kişandin  
Hindî ko gulav-i lê reşandin

Wan seh nekirin di cismî canek  
Illa ji serî diçû duxanek

Wî murdeçiraxê nagihanî  
Dûkel ji serî diçûye banî

Zîn hat û ji pêş ve bû ھewale  
Bedrê ko veda ji ber xwe hale

Burqe<sup>c</sup> ko veda ji ber cemalê  
Xurşîd nema digel hilalê

Zînê wehe gote wî bedîhî  
»Qum ya ceseden nefextu fîhî«

Şewqa xeberê di vê şepalê  
Ber bûye serê dûyê şemalê

Wî dûyî qebes ji şewqê ragirt  
Qendîl-i qefes qebes ko dagirt

Ew xelwetiyê di i<sup>c</sup>tikafê  
Rabû ve bi niyyeta җewafê

Ewwel ewî kir bi şidq-i der dem  
Tecdîdê wuđû bi ab-i zemzem

Westa li muşella û meqamê  
Wî cebhe gihande istilamê

Tewfek du kirin li dorê beytê  
Perwaneyê per gihande zeytê

Gava weko per li wî dişotin  
Wan çend kelam-i pêk ve gotin

Perwaneyê go »tu xweş delîl î«  
Şem<sup>c</sup>ê wehe go »tu xweş xelîl î«

Perwaneyê go »tu rehnima yî«  
Şem<sup>c</sup>ê wehe go »tu canfeza yî«

Perwaneyê go »tu dîlfirûz î«  
Şem<sup>c</sup>ê wehe go »tu sînesûz î«

Perwaneyê go »tu çaresaz î«  
Şem<sup>c</sup>ê wehe go »tu dilnewaz î«

Perwaneyê go »tu padişah î«  
Şem<sup>c</sup>ê wehe go »tu qiblegah î«

Perwaneyê go »tu hûr-i zat î«  
Şem<sup>c</sup>ê wehe go »tu nûr-i zat î«

Wan teşnelebê di bêtekelluf  
Wan soxteyê di bêteşerruf

Evreng dikirin bi yek ve şuhbet  
Lêk <sup>c</sup>erdikirin kemal-i ulfet

Dayîn û Sitî û ew perestar  
Ew bendî û hebsî û giriftar

Sergerm bûyin bi guft û goyê  
Sermest bûyin ji bêhn û boyê

Wan gote Memê ko »ey cegerxûn  
Em hatine da nebî tu mecnûn

Zîn bû sebebê cunûniya te  
Mîr bû sebebê zebûniya te

Mîr bû bi te ra xwidantereħħum  
Zîn hat û digel te kir tekellum

Ger teşne yî, evehe ab-i ḥeywan  
W'er xeste yî, hate ser te Luqman

Mecnûn î, xwe hate ba te Leyla  
Ger Wamiq î, ha ji bo te Ḩ Ezra

Ger bilbil î gul ji bo te ḥađir  
Nilûfer î mihir bûye nazir

Perwane yî, şemi<sup>c</sup> wê eyîsa  
W'er murde yî, hate ser te Ḩ Isa

Dîwane mebe bi vî hewayî  
Bêgane mebe tu aşina yî

Hora ko te can û dil di des bû  
Zîna ko te da<sup>3</sup>ima hewes bû

Çawa te divê we hate ba te  
Dinya ye fena ye hat û bat e

Erzan mefiroşe umrî ḫayı<sup>c</sup>  
Bêhûde mebe li canî bayi<sup>c</sup>

Cama ecelê heta binoşî  
Nabînî ji bo xwe canfiroşî

Dîsan xwe bi <sup>c</sup>eqlî aşina ke  
Zincîr-i cunûniyê reha ke

Lewra vekirin me qeyd û zincîr  
Rabî bi me ra biçîne pêş mîr

Şahîbkerem e, xwidan <sup>c</sup>eşa ye  
Zilla wî siha perê huma ye

Vêk dane ji bo te yar û ehbab  
Hadîr kirine bisat û esbab

Şabitqedem e li de <sup>c</sup>weta te  
Rû daye te bext û dewleta te

Derhal dema biçî muqabil  
Dê bo te bikit muradê haşil

Çawa te ji wî murad e dilxwaz  
Ewrenge te dê bikit serefraz«

Weqtê ko Memêbihîstin ev pend  
Evrengehe go ewê hinermend

»Ez naçime hedreta çu mîran  
Ez nabime bendeyê esîran

Ev mîr û wezîriya mecazî  
Ev şu <sup>c</sup>bede û xeyalibazî

Bi-l-cumle beṭal û bêbeqa ne  
Bêaqibet in hemî fena ne

Mîrê ko mirin hebit ne mîr e  
Me<sup>c</sup>zûlî hebit ewî esîr e

Em çûne ھuđûr-i mîrê mîran  
Wî ھakimê ھakim û feqîran

Şahinşehê mîr û padişahan  
Bexşendeyê tuhmeta gunahan

Ê çêkirî neynika cemalê  
Tîra xwe nima bi zulf û xalê

Fanos-i beden kirî muṭella  
Tê da ji me ra kirî tecella

Ew mîr ھekîm e, zu l-celal e  
Bê<sup>c</sup>ezl û texeyyur û zewal e

Tezwîc kirin di <sup>c</sup>alema ҳeyb  
Te<sup>b</sup>bîd kirin bi emrê "lareyb"

Bakûreyê baҗê <sup>c</sup>izz û naz ïn  
Şed şukir ko bikr û serfiraz ïn

Haşa ko di vê seray-i fanî  
Bê cennetê <sup>c</sup>edn-i cawidanî

Heywansifet em bikîn zinayê  
Bêhûde di meskenê fenayê

Terdamen û sernigûn û merdûd  
Şermende biçîne pêş-i me'bûd

Me'bûd ji bo me ḥor û xilman  
Tezyîn kirine di baxê riđwan

Ew muntezir in li riħleta me  
Fexrê dikan ew bi de'weta me

Lê cennet-i 'aşıqan cuda ye  
Mi'ad-i liqayê kubriya ye

'Alîtir e ew ji baxê riđwan  
Naguncine wê çu ḥor û xilman

Hêvî dikan em ewê ji me'bûd  
Nînin me bi xeyri wî çu meqşûd«

Gava ewî kir temennî axir  
Dergah vebû li ber wî ḥadîr

Teyrê ko qefeş li ber vebûyî  
Ewreng-i firî wekî nebûyî

Destê xwe ji qeydê gil kişandin  
Çengê di dilê xwe raweşandin

Şehbaz-i ji qeydê merkeza ferş  
Perwaz-i kir û gihişte Zi l-'erş

### 53. Ew matemiyê ko baxeber bû

Ew matemiyê ko baxeber bû  
Evrenge ji bo me newheker bû

Go, can ko ji hebs-i ten cuda bû  
Feryad û fişan ji şehrî rabû

Bû welwele û fişan û zarî  
Bû zelzele û bezîn hewarî

Buhtan ji mezin heta biçûkan  
Niswan û keç û benat û bûkan

Eyan û ekabir û e' alî  
Mîrza û rewal û la' ubalî

Yek ferd nema di şehrî dilxwes  
Bi-l-cumle di serxwes û müşewwes

Vêk ra dibeşîn bi ser Memê ve  
Wan derd-i birin bi ser xemê ve

Tacdîn û Bekir bi ittifaqî  
Bûn herdu li 'erdekê mulaqî

Go »ey sebebê fesad-i 'alem  
Şeytanşifetê li şiklê adem

Ey ba'ışê fitne û fesadan  
Wey mani'ê meqşed û muradan

Ey perdedirê Memê û Zînê  
Wey daxikeşê li ser birînê

Iblîsê xebîsê pirnedamet  
Bes nîne li min te kir qiyamet

Der heqqê Memê seqeṭ xeber da  
Hetta ko li min te Mem bi der da

Evçende munafiq û neyar î  
Hêja tu bi çavê min diyar î

Mem dê bimirit tu dê bimînî  
Hêj xweş bigerî li rûy zemînî«

Hadîr wî Bekir di 'erdê ra kir  
Cismê bi bela ji can cuda kir

Gava ko gihişte ser birayî  
Nûrek wî nedît di wî cirayî

Tacdîn ji serê xwe tac û tomar  
Havêtine ser leşê Memê jar

Dîn bû ji tehessura birayî  
Herçî ko didî wî ejdehayî

Fi l-ḥal dikir ko wî fena kit  
Teşbîhê Bekir di 'erdê ra kit

Qeṭ kes nedîşî bîbit muqabil  
Bêşubhe bi wî dibûye qatil

Naçar-i xeber birin ji bo mîr  
Mîr hat û li pê wî best-i zincîr

Gava ko cenaze wan hilanîn  
Şahid ko ji meşhedê deranîn

Meşhûd bûyin li wan <sup>c</sup>elamet  
Rabû li xela <sup>i</sup>qan qiyamet

Dêwê ko vebestî wan bi tedbîr  
Bizdandî li ber xwe qeyd û zincîr

Zincîr û kemend ewî şikînan  
Derwaze û perde wî hilînan

Ejder ji meşareyê ko ber bû  
Derhal bezî di ne <sup>c</sup>ş-i wer bû

Tabût li ser serê xwe danî  
Efşan digihande asimanî

Hindî ko di şehrî ademî bûn  
Têk da bi libasê matemî bûn

Hindî ko hebûn di şehrî meşhûr  
Xatûn û muxedderat û mestûr

Gîşûvekirî bi ḥayê terpoş  
Ser ta bi qedem hemî siyehpoş

Bê me<sup>c</sup>cer û burqe<sup>c</sup> û serendaz  
Reşgirtî ji bo Memê bi dilxwaz

Neyyahe û miubreban û dayîn  
Goyende bi nale şubhê goyîn

Wan mersiye distiran bi aheng  
Zîn rabûye pê bi qameta şeng

Nahîdşifet li dengê sazê  
Reqqaş diçûye ber cenazê

Dam û ded û ademî û mûran  
Dar û ber û camid û tuyûran

Bi-l-cumle ji bo Memê dinalîn  
Her yek bi meqamekê dikalîn

Telpê reş-i wan siyahpoşan  
Reh şubhetê <sup>c</sup>ewrekê xuroşan

Ewçend-i ji <sup>c</sup>arıdê di gulgûn  
Vêk ra diwerîn sîrîşkê pîrxûn

Goya ko di feşlê nûbiharî  
Baran li gulşenan dibarî

Ev matem û ev siyahpoşî  
Ev çarşev û izar û poşî

Buhtan wî zemanî kirine <sup>c</sup>adet  
Bû resmê qedîm ta qiyamet

#### 54. Weqtê weko çûne ser mezaran

Weqtê weko çûne ser mezaran  
Wan dî miriyek di nêv du daran

Havêtine <sup>c</sup>erdê şubhê murdar  
Bênewheger û xwidan û ҳemxwar

Pirsîn »<sup>c</sup>eceb ev çi bênewa ye«  
Gotin »Bekirê xwidanceza ye

Tacdîn ji rûyê dinê fena kir  
<sup>c</sup>Alem bi fenayiya wî şâ kir«

Rawî wehe gote min riwayet  
Zînê ko bihîst-i ev hikayet

Evrengehe gote mîr û Tacdîn  
»Ey şah û wezîrê <sup>c</sup>izz û temkîn

Ez hêvî dikim nekin <sup>c</sup>inadê  
Der heqqê vî menbe<sup>c</sup>ê fesadê

Lewra ko xwidanê ins û canan  
Wî xaliqê <sup>c</sup>erd û asiman

Roja ewî ҳubb-i da ҳebîban  
Hingê ewî buxd-i da reqîban

Mewcûd kirin dema ji me<sup>c</sup>dûm  
Em pêk ve di lazim û melzûm

Em şorgul in ew ji bo me xar e  
Em genc in û ew ji bo me mar e

Gul hîfîz dîbin bi newkê xaran  
Gencîne xwidan dîbin bi maran

J'ewwel ve egerçi wî cefa kir  
Axir bi me ra ewî wefa kir

Zahir wî eger muxalefet kir  
Başin bi me ra muwafeqet kir

Ger ew nebiwa di nêv me ha<sup>z</sup>il  
İşqa me dibû betâl û za<sup>z</sup>il

Wî gerçi ji bo xwe ra xirab kir  
Der heqqê me wî qewî şewab kir

Ew bû sebebê heqîqeta me  
Daxil geriya terîqeta me

Ew jî di riya me da şehîd e  
Tehqîq bikin ko ew se<sup>c</sup>îd e

Zinhar-i ji meşheda ko Mem tê  
Elbette ji merqeda ko em tê

Mehrûm mekin Bekir emanet  
Em bûne bi wî şeyî şıyanet

Gava ko diçîne nêv şe<sup>c</sup>îdê  
Kelbê me bitin li ber weşîdê«

Inşaf ji bo xwidan-i insaf  
Ayîne dibîtin ev qeder şaf

Qeṭ mumkin e ab û abigîne  
Evrenge nekit qebûl-i kîne

Haşa ko bi xeyr-i puxteyê<sup>c</sup>işq  
Kella ko siwayê suxteyê<sup>c</sup>işq

Evçende li şahîbê cefayê  
Evrenge kesek bikit wefayê

Ev ta<sup>c</sup>ife merhemetsirişt in  
Lew la<sup>c</sup>iqê ni<sup>c</sup>meta bihişt in

## 55. El-qışşe şehîdê ‘ısq-i cellad

El-qışşe şehîdê ‘ısq-i cellad  
Meqtûlê sitem qetîlê bêdad

Ew kuşteyê curmê bêgunahî  
Teşbîhê beratê padişahî

Menşûr kirin bi nûr-i pakî  
Mestûr di nêv qubûr-i xakî

Ew dir bi xezîneyê siparin  
Ew mar li ber piyan veşarin

Daynandine ber serî ‘elamet  
Ye ‘nî »ev e serwerê qiyamet

Serxeylê qebîlê pakibazan  
Serdarê cemî‘ê serfirazan«

Zîn hat û bi qameta şenewber  
Bû serw-i li ser wî sayeguster

Bêperde mişalê ney dinalî  
Hêstir diwerîn ‘ele t-tewalî

‘Eynî te digo di feşl-i nîsan  
Derya rijiya ji ‘ewr-i dîsan

Baran ko li tirkbeyê dibarî  
Her dane dibûne deh mirarî

Herdem ko dikir ji derdê dil ah  
Wan matemîyan ne<sup>c</sup>ûzu bi-l-lah

Vê ra bi newa digirtin aheng  
Herneh felekan bi ser dikit deng

Cundî û sipahî û emîran  
Derwêş û re<sup>c</sup>iyye û feqîran

Dildar û şepal û nazenînan  
Horî û perî û xemrevînan

Vêk ra dikirin hewar-i herkes  
Efşan digihane çerx-i eñles

Zînê ko nema qewam û quwwet  
Nalî biriyan û ket ji qudret

Rûnişt li ber serê Memê jar  
Mem kir bi tekellumê xeberdar

K<sup>c</sup>ey malikê mulkê cism û canî  
Ez baxçe me û tu baxiban î

Baxê te gihadî bêxwidan e  
Bê riwê te ew ji bo ci ra ne

Ev xal û xet û <sup>c</sup>izar-i gulzar  
Ev hûsn û cemal û bax-i ruxsar

Badam-i siyah û çesm-i şehla  
Nar û bih û sêbê şaxê bala

Xweşreng û bi lezzet û bi tam in  
Bêşubhe li xeyri te heram in

Nexla bedena xwe raweşînim  
Vê meyweyê cumle daweşînim

Van sinbil û laleyê di xerra  
Reyhan û binefşeyê muṭerra

Ye<sup>c</sup>nî ko izar û zulf û xalan  
Ya qenc ew e ez bidim bi talan

Manend-i gulan libas-i ker kim  
Ax û xweliyê bi ser xwe wer kim

Zulfan hemî ta bi ta bikêşim  
Heqqê min e ca bi ca biêşim

Ev baş û bihar û berg û eşmar  
Enwar û şikûfe cem<sup>c</sup>-i ezhar

Nuzra nezera te bûn bi carek  
Weqfa besera te bûn mubarek

Talan bikim ez ewan temamî  
Da behre nexwin ji wan cu amî

Lêkin xwe bi xwe dikim teşewwur  
Belkî tu li min bibî texeyyur

Ev cuz<sup>c</sup>e nebit li ba te meqbûl  
Tirsim ko tu min bigêrî mes'ûl

Terkîb-i wucûd-i cism û can in  
Mulkê di te ne, ne bêxwidan in

Nuqşan bibitin ji ھusnê mûyek  
Belkî ko bikî li min tu sûyek

Gava ko li min bikî <sup>c</sup>itabê  
Zanim ko neşêm bidim cewabê

Nêzîk e bibim wekî te medhûş  
Ha weqt e digel te bim hemaxûş

La<sup>ı</sup>q ew e ھey bikim bisa<sup>t</sup>ê  
Pakîze bibim ji ixtila<sup>t</sup>ê

Ya qenc ew e her bi vê cemalê  
Azurde nekim qe zulf û xalê

Teslîm bikim emanetê ھeq  
Tefwîdê te bim bi xeml û rewneq«

Evrenge eda kirin ھeqa<sup>ı</sup>q  
Bizdand-i ji <sup>c</sup>alemê <sup>c</sup>ela<sup>ı</sup>q

Hembêz di merqedê weranî  
Bêzarê nema beden ji canî

Destê xwe bi dil ji canî şûştin  
Goya ko şemal-i bû vekuştin

Rûha xwe şihande pêş-i barî  
Cismê xwe sipare wî mezarî

Wan matemiyê di dilbirîndar  
Tekrar ji nû ve kirine hawar

Efşan ji canê hâdirînan  
Feryadê nihadê nażirînan

Sê roj û şevan ji ferşê xebra  
Peyweste diçûne 'erşê e'la

Hetta weko Zîn bi resm û ayîn  
Techîz-i kirin wekî dizanîn

Lehda ko Memê meleknezer tê  
Ye'nî şedefa ko ew guher tê

Ewçend-i li ser girîn bi zarî  
Baran-i sirişkê lê dibarî

Ewçend li ser bûyin guherbar  
Ser lê vekirin ji nû ve tekrar

Ew herdu guher di durcekê da  
Ew şems û qemer di burcekê da

Bê wasîte wan kirin muqarin  
Bê faşile ew bi hev siparin

Haşil vekirin ji nû ve şundûq  
Mîr gote »Memê ji bo te me'sûq«

Sê car-i ji qalibî şeda hat  
Awaz bi lefzê merheba hat

Hemyan kobihist-i surrê tehqîq  
Bi-l-cumle kirin bi ‘isqê teşdîq

Tehsîn û şed aferîn ji wan ra  
Qeṭ meyl-i dinê nebû ji wan ra

Alûde nebûn bi xak û xaşak  
Ev bû eşera mehebbeta pak

Pakîze û pakibaz ew çûn  
Dûşîze û serfiraz ew çûn

Lebteşne û ber ji hev nexwarî  
Hesretzede çûne pêş-i barî

Xweş ‘eyş kirin bi ‘isqê wellah  
Xweş pêk ve mirin tebareke l-lah

Herçî bi ciwanî, şubhê Zînê  
Tebdîl-i bikit bi ‘isqê jînê

Ya müşlê Memê bi ‘isqê ser det  
‘Eyş û xweşiyê li rê bi der det

Elbette muradê dê hilînit  
Herçî ko irade dê bibînit

Ya reb bi kelal-i ‘isq-i şadiq  
Ya reb bi kemal-i şidq-i ‘aşiq

Ya reb bi şirîniya cemalê  
Ya reb bi evîniya celalê

Ya reb bi derdê hecr-i cangah  
Ya reb bi zewq-i weşl-i dilxwah

Ya reb bi ḥelaweta ḥebîban  
Ya reb bi ḡedaweta reqîban

Ya reb bi nazê nazenînan  
Ya reb bi niyazê ḥemguzînan

Ya reb bi av-i çavê bulbul  
Ya reb bi xwinav-i nav-i şorgul

Ya reb bi eşkê al-i Mecnûn  
Ya reb bi rûyê Leyl-i gulgûn

Ya reb bi Memê û wê evînê  
Ya reb bi teħessura li Zînê

Weqtê ko cuda dikî ji canî  
Bêbehre nekî ji ḡisqê Xanî

Ye ḡenî ji wilayeta Muhemmed  
Meħrûm-i nekî tu ya reb Eħmed

Çawa ji nubuwetê bi qal e  
Metħleb ji wilayetê wî hal e

Da ȝim ewi guft û go wela ye  
Lêkin ewi cust û co bela ye

Qewlê di wî serserî guzaf in  
Fi'lê di wî cumleten xilaf in

Zahir ji wi ra selîs e guftar  
Baṭin bi wi ra xebîş e kirdar

Manend-i Memê ewê merencan  
Teşbîhê Bekir bibexşe qencan

## 56. Hikmet ew e ew ji darê dunya

Hikmet ew e ew ji darê dunya  
Çûn, seyr-i kirin serayê <sup>c</sup>uqba

Wan terk neda cibilleta xwe  
Her yek xuliqîn li xilqeta xwe

Ye<sup>c</sup>nî ko li ser Memê û Zînê  
Şîn bû ji zira<sup>c</sup>eta evînê

Reskîn du <sup>c</sup>eded nihal-i serkes  
Rabûn bi hewa ve herdu serxweş

Yek serw-i sehî û yek şenewber  
Sersebz û leťif û sayeguster

Wan dest di gerdenê di yek ra  
Qedda xwe dirêj kirin bi yek ra

Şîn bû ji ewî berê ji xêrê  
Darek li qiyafeta kinêrê

Ew dar ji rahetî berî bû  
Manend-i xwidanî bi istirî bû

Rabû xwe gihande herdu daran  
Bû mani<sup>c</sup>ê weşl-i herdu yaran

Rahet wî neşî bikit midara  
Xesmaneyî kir wî aşikara

Dîsan xwe gihande wan hebîban  
Ew lê piçiya wekî reqîban

Haşil li furû<sup>c</sup> egeruşulan  
Ew lê fitilî wekî fuđulan

Xelqê ko bi eşl-i bedsiriştin  
Ew eşil ji wan qe tête şıştin

Çil sal-i tu henzelê biçînî  
Şed av-i bidî bi hingivînî

Perwerde bikî bi afitabê  
Herdem biresînî lê gulabê

Her-roj reha wê lê bi ker kî  
Wê faşileyê tejî şeker kî

Xizmet bikirî tu hind-i wane  
Ew bo te dibîte hindiwane

Da fikir nekî dema ko ber dit  
Ew xeyr-i ji tehliyê şemer dit

## 57. Agah ji halê dewrê eyyam

Agah ji halê dewrê eyyam  
Evrengehe gote min serencam

Go pîrekê mihridar-i <sup>c</sup>aşiq  
Qewlê wî ji rengê şubh-i şadiq

Weqtê weko ew dibû muraqib  
Rûha wî dibû li cismî ҳalib

Esrar dibûn li wî diyarî  
Nêçîr dikir li <sup>c</sup>erşê barî

Xâ'ib ko dibû ji <sup>c</sup>alema gil  
Xalib ko dibû li <sup>c</sup>alema dil

Qelbê wî ji sirrê lewî-i mehfûz  
Herlehze dibû bi keşf-i mehzûz

Zahir ko dibûn ji wî keramat  
Ageh dikirin xwidanmeqamat

Wî pîrî bi xewn eger bi ilham  
Evrengehe kir heqîqet i<sup>c</sup>lam

Go çûme diyarê baxê riðwan  
Min dî du hezar û hor û xilman

Bi-l-cumle di qeşrekê <sup>c</sup>emeldar  
Ew qeşir bitûn ji durrê şehwar

Yek şubhê Bekir bi tac û binper  
Westayî li ber derî muqerrer

Çewganekê heyzeran di des bû  
Emma me nezanî ew çi kes bû

Min gote wî »ey xwidanmeratib  
Aya tu xwidan î ya ne hacib«

Go »şêx tu ma nizanî kî me  
Ez ew Bekirê ko qapûçî me

Ez müşterekê Memê û Zîn im  
Lew lêre he asitannişîn im

Ev qeşre ko heşt tebeq <sup>c</sup>eyan in  
Yek ya min e heft tebeq di wan in

Ez lêre emîn û destbidar im  
Lêkin di vî mulkî hîşşedar im

Herçend bi şikil pasiban im  
Emma bi mekan şirîkê wan im«

Min gote wî »ey nikûserencam  
Wađih bike halî bo min i<sup>c</sup>lam

Herçend kerema kerîmî <sup>c</sup>am e  
Barî bi ci da te ev meqame«

Go »şêx tu hêj nebûyî ‘arif  
Emma di dinê tu bûyî waqif

Ez ger bi xeber reqîbê wan bûm  
Lêkin bi nezer hebîbê wan bûm

Min ew ji dinê bi paş ve kêşan  
Mu‘tad kirin bi derd û êşan

Xweşî di dinê li wan bi der dan  
Munqad-i kirin bi daş û derdan

Ewçend me dane wan siyaset  
Hetta weko bûn xwidanriyaset

Lewra me li ḫerrê wan xeber da  
Hetta ko serê xwe tê bi der da

Ev herdu cihan bi hev hewî ne  
Ev ḫerre li ḫerrê hev qewî ne

Hetta weko bernedî tu yêkê  
Nabînî cu lezzetê ji yêkê

Ew ḫerre bi wan me daye berdan  
Kêşane bi asiman ji ‘erdan

Min dayiye wan bitûn bihiştek  
Wan dayiye min ji baxî xiştek«

Şêx mayî li guhtina wî guhdêr  
Go »ey şeqiyê te ‘aqibetxêr

Tacdîn ko tu kuştî bê cinayet  
Barî bi wi ra ci kir ‘inayet?«

Go »‘efû kir ew cenabê barî  
Bû cennetî û neçûye narî

Xellaq, xirabî û xebîsî  
Bexşîne wî, cennetî nivîsî

‘Alem ko bi dest xerabiya min  
‘Aciz kirîbû fesadiya min

Kuştım wî ji bo niżam-i ‘alem  
Bo raḥetiya ‘ewam-i ‘alem

Zahir wî egerçi kir qebahet  
Baṭin biwe raḥet ew qebahet

Şolin hene zahiren xirab in  
Fi‘lin hene şûreten şewab in

Yek ‘edl e li şûretê cefayê  
Yek qehr e di kiswetê wefayê

Yê perdekeşê rumûz-i ḥikmet  
Bê sir nekir ew kunûz-i qismet

Tewzî‘ nekir li ‘amê nasan  
Mexşûş-i wî da nedîm û nasan

Ew sir wî nekir ji bo me meclûm  
Hin muhrem in û hinek di mehrûm

Şed şukir ezê xirab û Tacdîn  
Mehđa bi te<sup>c</sup>elluqa Mem û Zîn

Mehrûm nebûn bi pırgunahî  
Bûn mezherê rehmeta ilahî«

Ey dost bi dil be yarê qencan  
Ya qenc bibe neyarê qencan

Ew qenc in û qenciyê dizanin  
Ew xeyr-i ji qenciyê nizanin

Hindî ko bi wan bikî cefayê  
Ew dê bikirin bi dil wefayê

Zinhar mebe muhib xiraban  
Ne dost-i ne dijminê kilaban

Ger dost bî dê bikin te murdar  
W'er dijmin î dê bikin birîndar

Ev himmete xas-i<sup>c</sup> aşiqan e  
Ev mertebe-i rah-i şadiqan e

Xelqê ko wekî Bekir şeqî ne  
Fi'lê di wî cumle naheqî ne

Yan şubhetê Tacdîn di cebbar  
Qettal û dilawer û cegerdar

Me<sup>c</sup>fû bikitin kerameta wan  
Mexfûr bibin ji himmeta wan

Teqewiyyet wan babit mededkar  
Tebe<sup>c</sup>iyyet wan bikit sezawar

Ev remze heqîqeten leťif e  
Iz<sup>c</sup>an bike nukteyê zerîf e

Iz<sup>c</sup>an bike mes'elê, muderris  
Texmîn-i mesahetê muhendis

Dijmin ko ji <sup>c</sup>işqê behrewer bin  
Bes dost-i ne dê di mu<sup>c</sup>teber bin

Evrenge te<sup>c</sup>elluqa reqîban  
Bes çend e tefewwuqa hebîban

Xâşma ko muhibb bibîte mehbûb  
Ew ṭalibê heq bibîte metlûb

Heqqâ ko tenê wî heq dizanit  
Qeṭ ҳeyr-i wî kes bi heq nizanit

## 58. Ey mustemi'ê mişal û teswîl

Ey mustemi'ê mişal û teswîl  
Wey muctehidê qiyas û te'wil

Xanî ko ji cam-i işqê dîn bû  
Ew şoreşerab pê şîrîn bû

Ewçend vexwar-i ewê nehişyar  
Agahî nema ewî ji guftar

Mestanî ye ew bi kîf-i me'mûr  
Dîwanî ye ew bi ıurf-i me'zûr

Mexmûr e û badenoş û serxwes  
Lew badefiroş e û muşewwes

Herçî ko dibêjîtin hewa ye  
Ger guh bidinê newayê nay e

Ew ney ne ھelal û ne ھeram e  
Bêperde ye lê ne bêmeqam e

Kurdî, ırebî, derî û tazî  
Terkîb kirin bi hezl û bazî

Hindek ji fesaneyê di Buhtan  
Hindek di behane heyin di buhtan

Buhtî û mehmedî û silîvî  
Hin le'l û hinek ji zêr û zîvî

Xermuhre û morik û mirarî  
Hindek di şefaf û hin di tarî

Tersî<sup>c</sup> kirin wekî biçûkan  
Înane bi qeyserî û sûkan

Hin qışşe û hin ji wan mişal in  
Hindek di ḫeram û hin ḫelal in

Her qışşe ji hişşe behremend in  
Her emşile ger bizanî pend in

Lêkin wî ḫered ji guft û goyê  
Meqşûd ji hinde cust û coyê

Zahirkirina cemalê <sup>c</sup>işq e  
Şabitkirina kemalê <sup>c</sup>işq e

<sup>c</sup>işq ayîneyê xwidanima ye  
Xurşîdşifet xwidandîya ye

Xafil mebe <sup>c</sup>işq-i fi l-ḥeqîqe  
Ey rahirewê eqrebu t-ṭerîqe

Xweş cewher e cinsê kîmiya ye  
Qedrê wê bizan giranbiha ye

Teb<sup>c</sup>ê weko şifr û bêcela ne  
Qelbê weko qelb û ya qela ne

Ev cewhere wan dikit muṭella  
Ev şeyqele wan dikit mucella

Herçî ko kesek bikit irade  
Ya ḫışq murîd e ya murad e

Ayîneyê ḫeks-i bêmişal e  
Gencîneyê sirr-i bêzewal e

Kes nîne ji ḫışqê bêeşer bit  
Mumkin ko ji ȝewqê bêxeber bit

Her kes bi qiyas-i himmeta xwe  
Dê şerf bikit iradeta xwe

Lê ekşerê ḫamiyan nezan in  
Nefsa xwe ji bo xwe ra nizanin

Nabâliş û ebleh û sefîh in  
Ya zahid û şofî û feqîh in

Ew cahil û ummî û sefîl in  
Bêmurşîd û rehber û delîl in

Naçar dibin li ḫışqê bayîc  
Neqdê xwe didin bi ȝusnê ȝayıc

Hin şerf dikin bi ḫeyşê dunya  
Hin pê dikirin serayê ḫuqba

Ev herdu celeb dibin ziyan kar  
Meħrûm dibin ji ȝewq-i dîdar

## 59. Saqî were bêje mîn ci lewn e

Saqî were bêje mîn ci lewn e  
Ev kewne xeyal e ya ne xewn e

Te'bîr meke ko ew betal e  
Teşwîr meke ko ew xeyal e

Axaz egerçi rengheyat e  
Encam-i høyat-i wê memat e

Ye'nî ko wucûd e bêwucûd e  
Xweşxilqet e høyf-i bêxulûd e

Eflak û 'enaşir û mewalîd  
Exlaç û ȝebayîc û meqalîd

Vêk ra di bedî'i l-iştirak in  
Têk da di serî'i l-infikak in

Serrişteyê gewhera beqa ne  
Sermayeyê 'illeta fena ne

Hindek di şeqîl û hin xefîf in  
Hindek di xefî û hin letîf in

Herçend ji bo me eşl û bîx in  
Herçar ji bo me ax-i şîx in

Agir vemirit hewa hewa ye  
Av er çikiya heba heba ye

Eflak müşalê asiyab in  
Hemware bi çerx û inqilab in

Dexlê li wî aşî ademî ne  
Meṭmûreyê erdê ardelîn e

Ew dane bi nobet û tewalî  
Da'im dirijin ji dev cuwalî

Herçî rijiya dabit mucezza  
Jêk ra dabit û dabin muherra

Texmîr dikin ji nû ve tekrar  
Ew qalibê qelb e qabili n-nar

Ewçend dikêşin ew siyaset  
Rađî ne bi merteба necaset

Fi l-cumle ne murd e û ne ehya  
Bermucibê »la yemûtu we yehya«

Illa ko nefîs û pakiṭînet  
Ye'ni ko nufûs-i nîkisîret

Dehqan bi xuşûsiyet hilînit  
Wê daneyê xaşşeten biçînit

Hetta nerizit helak-i nabit  
Nariskit û qenc pak-i nabit

Weqtê resiya û bûye xûşe  
Wê dê biquşin ji boyê tûş

Aşê dev û çeqçeqa zebanan  
Ava dehen û berê didanan

Ewçend ewê deq didin dihêrin  
Ewçend di şehrê ten digêrin

Ewçend diqutin wê ev <sup>c</sup>emeldar  
Hetta weko hûr bibit wekî ar

Haşil ko ji paş-i wan cefayan  
Dê bête teşerrufa qewayan

Geh cazibe başinî vekêşit  
Geh masike bigivişit biêşit

Dem hadime bêt ewê bikit hedm  
Dem dafi<sup>c</sup>e bêt ewê bikit kezm

Tennûr-i me<sup>c</sup>de wê bipêjit  
Herçî ko xirab e jê birêjit

Teş<sup>c</sup>id bikin heçî leşîf e  
Tenzîl bikin heçî keşîf e

Paşê ji wê elşefê cuda kin  
Temyîz bikin ji hev bela kin

Tebbaxê herareta xerîzî  
Şebbaş û mumeyyizê temîzî

Tewzî<sup>c</sup> bikit li cism û e<sup>c</sup>dan  
Me<sup>c</sup>mûr bibin cihat û erkan

Dîza ceger û dilê zucacî  
Teqtîr bikin meya muzacî

Haşil <sup>c</sup>ereqa meya heyatê  
Teqtîr ko bû wekî nebatê

Hêja ji zuhûr-i van şu<sup>o</sup>ûnan  
Bû qabilê <sup>c</sup>alema buṭûnan

Geh xewt dixwit di behrê ma<sup>o</sup>i  
Rengîn dibilit demek dima<sup>o</sup>i

Dem <sup>c</sup>eqid dabit ji boyê terkîb  
Teşwîr dabit bi nezm û tertîb

Terkîb ko bû mişalê mercan  
Bû <sup>c</sup>eks-i pezîr-i pertewa can

Ew can ci ye muhceya nebatê  
Ew muhce ye menşe<sup>a</sup> a heyatê

Hindî weko sakinê buṭûn e  
Xamûş e û xwarina wê xûn e

Weqtê ko ji mezre<sup>c</sup>ê xefayê  
Ew sebzeyê ter bikit nimayê

Wê sebzeyê dem bi dem bi xûnê  
Dê av bidin ji paş-i bûnê

Baran ne ji feyđê bit mededkar  
Ew dane dibîte nexlê bêbar

Sersebze dabit ji berg û baran  
Ger lê biwerit ji feyđ-i baran

Ew sebze ko bû nihalê serkeş  
Serxweş geriya ji meyweyê xweş

Ew meywe dema giha kemalê  
Bû mežherê pertewa cemalê

Ger la'iqê izzeta emîr e  
W'er derxurê hedefreta qedîr e

Wê hildigirin ji bo diyarî  
Bê waşite wê dibin diyarî

Fi l-ħal ko çû dibîte meħbûb  
Navê wê li wê dibîte meczûb

Ev nexline wafiri l-furû<sup>c</sup> in  
Lê zêde di nadiri l-wuqu<sup>c</sup> in

W'er mayî wisan li ber hewayê  
Ew dê çite meşera cefayê

Lazim ew e perweriş bibînit  
Terbiyyet-i derxûriş hilînit

Geh puxte bi afitab-i şer<sup>c</sup>ê  
Geh suxte bi mahitab-i wer<sup>c</sup>ê

Gava pijiya giha kemalê  
Weqta rijiya ji ser nehalê

Ḥetta nekevit ji ewc-i izzet  
Ḥetta negihîte xak-i zillet

Ew nabite salikê ṭerîqî  
Wê nabine meşera heqîqî

Evrengehe dest bi dest bi rê ve  
Ew mertebe mertebe bi wê ve

Ew meywe bixwit kemal-i xerbet  
Ew luqmeyê xweş bibîte şerbet

Ew şerbet eger şirîn e xam e  
Wêr tehl e û tîrş e natemam e

Ḥetta ne bi destê pîrê meyxwer  
Ew hilkelitin di xummê ekber

Gava ko di wê ve kel bi ser ket  
Weqtê ji xumê mezin bi der ket

Yeñî ko ji keşreta şifatan  
Ew ṭey bikitin tecelliyyatan

El-qışse ji germiya cemalê  
Haşil ko bi şewketa celalê

Cewher ko temam muđmehîl bit  
Teşbîhê erez ko munfe il bit

Germiyyet-i wan tecelliyyatan  
Wan muhriq û wan muqewwiyatan

Tenzîl bikin ji wê xubarê  
Teş'îd bikin ji wê buxarê

Xalis ko bîbit ji paş-i teş'îd  
Hêja diçite meqamê tecrîd

Cewher ji 'ered ko bû mucerred  
Datînine bûteyê mucended

Ew bûte egerçi tengina ye  
Şehrayê fena yê dilguşa ye

Hemrengê şurahî û peyal e  
Hindî weko şor e ya ne al e

Hêja nebûye rehîqê mextûm  
Hêja neçûye meqamê me'lûm

Hindî ji xwe wê hebit wucûdek  
Nînin ji xwidê ewê nimûdek

Bê meşrebeyê wefayê şahî  
Ew naçite meşreba ilahî

Fanî nebitin fenayê muṭleq  
Nabînitin ew beqayê bi l-heq

Fanîti ji bo wi ra beqa ye  
Baqîti ji bo wi ra liqa ye

Emma ne bi ittişal û ilhaq  
Belkî ne bi infîşal û itlaq

Evrenge dikit muradê hasil  
Anca dibite murîdê wasil

Ya reb çi dabit ji ber me koran  
Carek tu vedî hicab û toran

Bînende bikî emê di ‘aciz  
Bê perde û bê hicab û haciz

Deryayê yeqîn bikit temewwuc  
Em jî bikirîn demek teferruc

Ev zenn û guman û ‘ilm û teqlîd  
Tebdîl bibin bi ‘eyn-i tewhîd

Esbab û wesîle qeṭ nemînin  
Carek te musebbibî bibînin

Îman me heye bi zat-i wacib  
Imkaniyeta me bûye hacib

Dîsan ji me her tu me xelaş ke  
Ya reb me ji bo xwe ra xwenas ke

Ev seyr û sulûk û teyy-i menzil  
Mexşûş e ji bo murîdê muqbil

Kengê ji me ra dabit tuyesser  
Xaliq ji ezel nekit muqedder

Lewra ko xirabî û qebûlî  
Nînin bi feda'îl û fuđûlî

‘Abid bi riyayekê helak in  
‘Asî bi di ‘ayekê di pak in

‘Alem ko wekî xeyal-i ȝill e  
Şani ‘bi xwe hadî û muȝill e

Ew tînite menzera xeyalê  
Ew têxite perdeya ȳelalê

Lê daye me cuz’ê ixtiyarî  
Nefsa me bi lîp û hîlekari

Ew jî biriye ji dest me naçar  
Em mane û luđf-i heq mededkar

Bes qenc ji bo me ‘amiyan ra  
Her ev bes e bo me ‘asiyan ra

J’ewwel ve xwidê bi heq binasîn  
Herçend quşûr û kêm û kas ïn

Paşê bi dilê xwe jê bitirsîn  
Dînê xwe ji ‘aliman bipirsîn

Çawa ko dibêjin em wisa bîn  
Hetta ko ji rû dinê fena bîn

Pala xwe bidîne luđf-i barî  
Belkî me bibexşitin ji narî

## 60. Ey rakibê waqî'ê peyade

Ey rakibê waqî'ê peyade  
Wey 'aşiqê şefheyê di sade

Ey şâ'irê şaxir û nigûnser  
Wey sahirê saxir û fisûnker

Ey ha'imê wadiya ȳelalê  
Wey ȳawiyê de'wela kemalê

Ey xameyê serteras-i bedreng  
Bes nameyê xweşqumaş-i xweşreng

Rûres ke bi navê xeṭṭ û xalan  
Bednam bike bi »bê« û »dal«-an

Hindî weko xeṭ ȳubar û hûr e  
Ew xeṭ ji leṭafetê ne dûr e

Gava ko ji rengê meşqê pir bû  
Ya şubhetê nesx û şuluşê gir bû

Ew nasixê nusxeya cemal e  
Bêrewneq û rohnî û kemal e

Lazim ew e dilberê di sade  
Xeṭ lê nebitin wekî qilade

Xweş zînet e xet li mah-i ruxsar  
Hindî li rûyan nebûye hevsar

Ey xame te jî gelek dirêj kir  
Ev name bes e te pir qirêj kir

Herçend-i kelam şubhê dir bit  
Bêqedir dabit dema ko pir bit

Nabînî bi qîmet in cewahir  
Lewra ko di hindik in di nadir

Sehw û xeleş û xeta û nisyan  
Mecmû<sup>c</sup>eyê napesend-i <sup>c</sup>isyan

Tehrîr kirin te, bê teemmul  
Kî dê bikitin ji te tehemmul

Kes nîne bikit ji bo te tehsîn  
Goyendeyê aferîn û nefrîn

Ey bêedeba xirabe bê<sup>c</sup>ar  
Gustax û sitemger û siyehkar

Hindî ko serê te min qelem kir  
Ewçend te xetê xeta reqem kir

Hindî ko serê te min teraşî  
Ewçend te kir gunehtelâşî

Fehhaşî te kir ji rengê Xanî  
Neqqaşî te kir mişalê Manî

Meşxûlî bes e bi lu<sup>c</sup>b û lehwan  
Toba xwe bike j' xet<sup>c</sup> û sehwan

Carek were ser terîq-i tobe  
Hindî negihiştiye te nobe

Nobet ko gihişte xeşim xame  
Tey kir li me ev niza<sup>c</sup> name

Ew betl-i dilawerê zeberdest  
Ewwel kemera tehewwurê best

Bû rakibê duldulê enamil  
Derhal-i digel me bû muqabil

Kêşa ji zebanî zulfiqarek  
Bû xeşim digel me şehsiwarek

Sil bû rikiya ji wan<sup>c</sup> itaban  
Ezman geriya bi van cewaban

Go »Ehmed eger tu ney xebîş î  
Herçî ko te go min ew nivîsî

Qewlê di te qenc eger xerab in  
Fi'lê di te xeṭe<sup>c</sup> eger şewab in

Ey bed<sup>c</sup>emelo tu qenc dizanî  
Tu qa<sup>c</sup>il û fa<sup>c</sup>il û xwidan î

Ney bûm di<sup>c</sup> alema nepestan  
Mey bûm ne bi destê meyperestan

Gava ko te ez birim ji sazî  
Ne deng-i di min hebû ne gazî

Te dûr kirim ji nik hevalan  
Mehcûr kirim ji mulk û malan

Bend û weşilê di min sera-bun  
Ewwel te kirin bi emrê kun kun

Paşê ko te kir di baxê ‘ışqê  
Kun kir dilê min bi daxê ‘ışqê

Te pif kire cismê min dema can  
Hatin ji dilê min ah û efşan

Nefxa te li min dil û ceger şot  
Herçî ko te pif kirî min ew got

Ez lal im û bêzeban û xamûş  
Bênefs û nefes ji qismê qamûş

Bezma terebê bi min te xweş kir  
Dîwan-i guneh bi min te reş kir

Herçend ko zahirî heyim ez  
Sazende tu yî wekî ney im ez

Ma ney bi xwe tiştekê dibêjit  
Xame bi xwe reşhekê dirêjet

Katib qelemê dikit siyehkar  
Sazende ye ney ji dest bi hawar

Nay û qelem û kitab û nîşan  
Tîr û hedef û keman û kîşan

Mehkûmi<sup>c</sup>eleyhî bûn di teqdîr  
Hêj ismê guneh nebûyî testîr«

Ya reb tu dizanî Xaniyê jar  
Teşbîh-i bi xameya giriftar

Qelbê wî di dest te da ye el-heq  
Destê wî destê xwe nîne muşleq

Gava ko li wî te ser qelem kir  
Herçî te irade kir reqem kir

Amir tu yî, ew bi emrî me<sup>3</sup>mûr  
Me<sup>3</sup>mûr dîbin hemîşe me<sup>c</sup>zûr

Ger dayiye wî te ixtiyarek  
Ew jî wî sipare te bi carek

Ew ger<sup>c</sup>ilim û ger qelem bû  
Peyweste di dest te ser-qedem bû

Nef<sup>c</sup> û derabad xwe ew nizanit  
Ya qenc-i ji bo xwe ra çi zanit

Çawa ko ji bo te ra riða ye  
Ew ney şifet e wî ew hewa ye

Wellah ji sefidî û siyahî  
Wî qesd û xered tu yî ilahî

Emma bi murekkeba qeba'ih  
Rûreş kirine gelek şefa'ih

Xeṭṭê te ye serniwişt û sermesq  
Sih sal e xeṭṭe xeta dikit meşq

Lewra ko dema ji ҳeybê fek bû  
Tarîx hezar û şêst û yek bû

Îsal gihişte çill û çaran  
Wî pêşrewê gunahikaran

Vêk da ji menahiyan gelek mal  
Yek pol nehin ji ҳusn-i e<sup>c</sup>mal

Ewwel ko te da ji <sup>c</sup>işq-i meṭle<sup>c</sup>  
Axir bide wî tu ҳusn-i meqte<sup>c</sup>

– DAWÍ –



## مه موزین



... 1 ...



دهنگای چاپ و بلاوکردن‌وهی



زنگیره‌ی روش‌نبیری

\*

ناوه‌نی ئىمپاراز: شەوکەت شىخ يەزدىن  
سەرنووسىار: بەدران ئەھمەد ئەبىب

\*\*\*

ناونىشان: دهنگای چاپ و بلاوکردن‌وهی ئاراس، شەقامى گۈلان، ھەولىر



ئەممەدى خانى

# مەمۇزىن



ترانسکریپسیون  
عارف زیرەقان

... 3 ...





ناوی کتیب: مه‌موزین - ئەحمدەدی خانى  
ترانسکریپسیون: عارف زیرەقان  
بلاوکراوهی ئاراس - ژماره: 579  
دەھینانى ھونەريي ناوەوە و بەرگ: نەفەل  
سەرپەرشتىي چاپ: ئاۋەرەھمان حاجى مەممۇد  
چاپى يەكەم، ھەولىر - 2007  
لە كتىبخانەي گشتىي ھەولىر ژمارە (496)اي سالى 2007 دراوەتى



ھېچ كەس بەبى نوسراوى رەزامەندى بۆى نىيە  
ئەم كتىبە دووبارە چاپ بىكاتەوە يان كۆپى بىكات  
يان لە مالپەرى ئەنتەرنېتدا بلاوى بىكاتەوە.





## مه موزینی ئە حمەدی خانى

میرى كرمانجىي مۇدۇرن مير جەلادەت ئالى بەدرخان سەبارەت بە ئە حمەدی خانى دەلى، ئەو نە تەنیا پىغەمبەرە، بەلكو خاونى كىتىپىشە. پىغەمبەرى ئايىنى نەزىدى و نەتەوھىي كوردە و خاونى كىتىپى (مه موزين) ھ.

ئەو پەسەندانىكى بەرزە و كورد (مه موزين) وەك قورئانىكى كوردەوارى لەزىر سەرى خۆى دادەنى و هەتا هەندىك كورد و رۇزىھەلاتناس دەلىن بىرى دەولەتى نەتەوھىي و نەتەوھەرەرە پىش ئەوھى لە ئەورۇپا بلاوبىتەو، زۆر بە كراوهىي لەلاي ئە حمەدی خانى ھەبوو.

## ژيان و بەرھەمە كانى ئە حمەدی خانى

لەبارەي لە دايىكبوونى ئە حمەدی خانى قەناعەتىكى ھاوېش ھەيە كە ئەو لە سالى 1061 ى كۆچىي (1650-51 زاينى) لە دايىك بىوو، لە بەر ئەوھى ئە حمەدی خانى بە خۆى لە (مه موزين) دا نۇرسىيەتى:

لەورا كو دەما ژ غەيبي فەك بىوو  
تارىخ ھەزار و شىست و يەك بىوو

ئىسال گەشتە چل و چاران  
وى پىشەرە ئە گوناھكاران

لە بەيتى دووهەدا دەردەكەۋى كە ئە حمەدی خانى (مه موزين) ى لە تەمنى 44 سالىي خۆيدا تەواو كردوو، كە دەكاتە سالى 1105 كۆچى و، زايىيەكەي دەبىتە 1693-94. ئە حمەدی خانى كەي مردوو، ديار نىيە و تا ئىستا ھىچ بەلكەي پشتراست نىن بۇ رىكەوتى مردنەكەي، بەلام عەلائەدين سەجادى لە كىتىبەكەيدا (مېزرووي ئەدەبى كوردى) دەننوسى كە ئە حمەدی خانى سالى 1118 ى كۆچى مردوو، كە دەكاتە 7-1706 ى زاينى.

ئە حمەدی خانى، جاريکى تر بە گۈرەي ھەموو سەرچاوهكان، لە ناوجەي ھەكارى لە دايىك بىوو و لە عەشىرەتى خانىيانە. بەھۆى پىوندىيە عەشىرەتىيەكەي بە عەشىرەتى خانىيانەو نازناوى خۆى كردووته (خانى). هەندىك كەس دەلىن ناوى گوندەكەشى (خان) بىوو و پىيى دەلىن (خانا سى گوندان). لە زمانى كوردىدا ناوى ھەموو عەشىرەتە كان بە پاشگەرى "ئان" كۆتايى دىن و لە بەر ئەوھە ئە گەر بنەچەي دەستەوازەي (خان) يش بەناوى عەشىرەتى (خانىيان). بۇ نىمۇنە مەرۋەقىك كە سەر بە عەشىرەتى (بۇتان)، (بەھدىنان)، (زىبارىيان) و (بارزانىيان) بى مەرۋەق



پی دهلى (بۇتى)، (بەھدىنى)، (زېبارى) و (بارزانى) ئىنجا ئەگەر ئەحمدى خانى لە عەشىرەتى خانىييان بى يانىش خەلکى ناوجەرى خانىييان بى (ئەو شويىنەى عەشىرەتكەرى لى دەزى)، لە ھەردوو باردا دەسى پاشناوهكەرى بىتىھ (خانى) كە نىسبەتكە بۇ عەشىرەت يانىش پىوهندىيەكەرى بە شويىنى عەشىرەتەوە دەردەخات.

ئەحمدى خانى لەشارى جىزىرى ژياوە ئەۋىش وەك مەلايەكانى سەرددەمى خۆى و مەلايەكانى دواى خۆى لە بەرھەمە نووسراوەكانىدا — بەھەندى ئىستىسناوە شىۋەزارى بۇتانى بەكارھىنناوە. ھەرچەندە مەلا مەحمودى بايەزىدى، سەرحدى بۇو لە دەقەكانى خۆيدا شىۋەزارى بۇتانى بەكارھىنناوە لەبەر ئەۋە زمانى ئەدەبىي كوردى بەو شىۋەزارە دەنۇرسا.

ئەحمدى خانى چوار بەرھەمى ناسراوى ھەن: 1) مەمۇزىن 2) نوبهارا بېچۈوكان 3) عەقىدا ئىمانى 4) عەقىدا ئىسلامى.

جىڭە لەو چوار بەرھەمە، بەرایى مەلا مەحمودى بايەزىدى و ئەلىكساندر ژابا نزىكەى 25 ھۆنراوە ئەحمدى خانى ھەنە كە لە سان پىترسborگ، لە روسىيا پارىزراون. جەلادەت ئالى بەدرخان لە گۆڤارى (هاوار) دا دەنۇسى كە كىتىبىكى ئەحمدى خانى لە سەر جوگرافياش ھەيە، بەلام ئەو بەخۆى نەبىينىوە.

### ناوى كىتىبەكە ئەحمدى خانى (مەمۇزىن)

تا ئىستا زۆربەى كوردى، بەخۆشىم يەك لەوان، ناوى كىتىبەكە ئەحمدى خانى بە ھەلە دەنۇسەم. جەلادەت ئالى بەدرخان سالى 1942 لەزمارە 45 كۆفارى (هاوار) دا باسى ناوى كىتىبى ئەحمدى خانىي كردووە و نووسىيويەتى كە ناوهكەى (مەمۇزىن) اه و نەك (مەم و زىن).

"بە بەرھەمەكە ئەحمدى دەلىن مەمۇزىن. ئەو دەستەوازھى دوو وشەى تىكەلە. مەم و زىن، ناوى قارەمانەكانى چىرۇكەكەيە. بەلام مەلايەكانى كوردى ئەۋيان كردووەتە شىۋە مەمۇزىن و ئەمرۇ لەجياتى (مەم و زىن) زىاتر پىي دەگۇترى (مەمۇزىن)." .

ھۆى ئەو ھەلەيە بەرفراوانە ئەۋەيە كە لە چىرۇكى زۆربەى گەلاندا، كە لە دوو ناۋ پىيىك دىن، ناوى بەرھەم و ھەردوو قارەمانە سەرەكىيەكە بەرھەمەكە وەك يەك دەنۇسرىن. بۇ نمونە (فەرھاد و شىرىن)، (لەيلا و مەجنون) و ھەتىد. ئەز لەو بىرۋايەدام كە بەھەمان ئەو لۇزىكە زۆربەى كوردى ناوى كىتىبەكە ئەحمدى خانى وەك (مەم و زىن) دەنۇسەن. راستىش ئەۋەيە كە (مەم) و (زىن) دوو قارەمانى چىرۇكى (مەم مى ئالان) ان و لە ھەمان كاتدا قارەمانەكانى كىتىبى ئەحمدى خانى (مەمۇزىن) ان. ناوى چىرۇكە فۇلكلۇرىيەكەش (مەم مى ئالان) نەك (مەم و زىن). وەك جەلادەت ئالى بەدرخانىش دەلى هەمۇ مەلاكانى كوردى ناوى كىتىبەكە ئەحمدى خانى بە شىۋە



(مهموzin) دهلىن و چون ئەحمدەدى خانى بەرھەمیکى سەربەخۆى لە چىرۇكىيکى فۇلكلۇرى كوردى داھىناوه بە هەمان شىيە ناوىيکى سەربەخۆشى بۇ بەرھەمەكەى كە (مهموzin) داھىناوه.

### بۆچى بە ئەلفەبای ترانسکریپسىون

ئەلفەبای كورديي لاتينى لە 31 پىت پىك دى و لەو خشتهى خوارەودا بەرامبەرەكانيان بە ئەلفەبای كورديي عەربى نووسراون. ئەو پىته عەربىييانە كە لە ئەلفەبای لاتينيشدا نىن بە پىتى ترانسکریپسىون نووسراون.

kurdî	erebî		kurdî	erebî		kurdî	erebî
a	ا		â	ى		s	س
b	ب		j	ژ		ş	ش
c	ج		k	ك		t	ت
ç	چ		l	ل		u	و
d	د		m	م		û	و
e	ه		n	ن		v	ف
ê	ئ		o	و		w	و
f	ف		p	پ		x	خ
g	گ		q	ق		y	ى
h	ھ		r	ر		z	ز
i	-						
Ekstra							
ء	ء						
ş	ث		ş	ص		ż	ظ
ħ	ح		ħ	ض		‘	ع
ż	ذ		ť	ط		χ	غ

(مهموzin) ئەحمدەدى خانى تا ئىستا بە ئەلفەبا و قەكىتەك (بىرگە كردن، تقطىع) اى راست نەنووسراوەتەوە و ئەو ئەلفەبایانە كە كورد بەكاريان دەھىن بەشى راستنۇوسىنى (مهموzin) ناكەن.

ئەلفەبای عەربى كىشە زۇر گەورە لە قەكىتدا دروست دەكى و هىچ جارىك رى نادات كە مروقى كوردى بە گوئىرە بىنەما رىزمانىيەكانى كوردى راست بنووسى.



بە ئەلfebای عەرەبى کار(فرمان)، ئاودلناو و ئامرازەكانى كوردى راست نانووسرين  
و ئەوش سەقەتىيەكى زۆر گەورەيە. زۆر دەنگى جياواز لە ئەلfebای عەرەبىدا نىنە  
يانىش دووسى دەنگ بە يەك پىت دەنۋەسىن.

نهبوونى گىدەك و هوردەكەكان(كاپىتەل و سموٽل) وادەكات كە مروف بە ئەلfebای  
عەرەبى يان كوردى - عەرەبى نەتوانى ناوه تايىبەتكان و ناوى جىنگە و ولاتەكان لە<sup>1</sup>  
وشە ئاسايىيەكان جىابكاتەوە لەبەر ئەوەي ھەردووكىيان وەك يەك دەنۋەسىن. بۇ نموونە  
ئەگەر بىنۇسىن (ئەو ئازادە) ئايا ئېمە چۈن دەزانىن كە مەبەستمان كەسىكە كە ناوى  
ئازادە يانىش مەبەستمان كەسىكە كە ئەو بەخۆى (ئازادە)، واتە سەربەستە.

بۇ دەستنىشانكىرىنى كىشىمى قەكىت (تقطىع) لىرەدا تەنیا ھەندىيەك نموونە  
دەھىنەمەوە. ئەز پىش ھەموو شتىك بەپىي قەكىتى لاتىنى راست دەياننۇسەم و پاشان  
جارىكى دىكە بە ئەلfebای لاتىنى، بەلام بەپىي قەكىتى عەرەبى دەياننۇسەم:

نمواونەي يەكەم :

قەكىتى راست بەپىي رىنۇسى ئەلfebای لاتىنى



Saqî tu ji bo Xwidê kerem ke  
Yek cur'e'ê mey di cam-i Cem ke



قەكىتى ھەلە بە ئەلfebای عەرەبى:

saqî tujibo xwidê keremke  
yek cur'e'êmey dicam-i cemke

نمواونە دووەم:

قەكىتى راست بە گۈرە ئەلfebای لاتىنى:

Sersal ko bû ji nû ve me'mûr  
Mîr daye gerê di taze destûr

قەكىتى ھەلە بە گۈرە ئەلfebای عەرەبى:

sersal kobû jinûve me'mûr  
mîrdaye gerê ditaze destûr



له زمانی کوردیدا دهستهوازهکانی (توژبۇ)، (دجام) و (جهمکە) نینه و ۋەكىتى ئەو وشانە بە پىي ئەلۋەبائى عەرەبى لە کوردیدا بەشىپەيدەك دەنۈوسىرىن كە ھېچ بىنچىنەيەكى رىزمانىي نىيە. لە نمۇونە دووهەمدا (Mîr daye) بەپىي ۋەكىتى زمانى عەرەبى بودته (mîrdaye) و ئىدى مەرۆڤ نازانى كە ناو چىيە و كار (فرمان) چىيە. ھەر دووكىيان تىكەللى يەكتىر بۇونە و بۇونەتە يەك وشە كە ھېچ مانا يەكى نىيە.

له ئەلەفھەبای عەرەبىدا 12 پىتى كوردى (ç, e, ê, g, i, î, j, o, p, u, û, v) نىن. واتە سى لە سەھتاي دەنگە كوردىيەكان بە ئەلەفھەبای عەرەبىي ئاسايى ناتوانرى بنووسرىن. فارسەكان هەندىيەك پىتىيان بۇ نووسىينى زمانى خۆيان لە ئەلەفھەبای عەرەبى زىاد كردوون كە دىسان ئەوانىش بەشىي كوردى ناكەن.

له باشوار و روژه‌لاتی کورستان کورد ئەلله‌بای عهربی دهستکاری کراویان  
ئاماده کردوه، بەلام له ئەلله‌بای کوردى—عهربیدا شەش پیتى عهربی (ث، ذ، ص،  
ض، ط، ظ) نىنە لەبەر ئەوه مروق ناتوانى (مەمۇزىن) تەنیا بە ئەلله‌بای کوردى—  
عهربىش بنووسىتەوه. كىشىي هەرە گەورە ئەلله‌بای کوردى—عهربى ئەوهىي كە  
پیتى (أ) تىدا نىيە و هەروەها له ئەلله‌بای کوردى—عهربیدا سى پیتى کوردى (ا،  
ب، ۋ، ڭ) بە يەك پیتى عهربى دەنۈسىرىن. واتە بە (و) دەنۈسىرىن، دوو پیتى دىكەش  
(ي، ڭ) بە يەك پیتى عهربى دەنۈسىرىن واتە بە (ى).



مرۆڤ ناتوانی کوردی به ڤه کیتی راست، به ئەللهبای کوردی-عه‌رهبی بنووسی، لەبەر ئەوهی ئەللهبای عه‌رهبی یان کوردی-عه‌رهبی رى ناداتە مرۆڤ کە دەستەوازەکان بەپیّی بنەماکانی ریزمانی کوردی برگە بکات.

هەزار موکریانی (عەبدولرەحمانی کوری حاجی مەلا مەھمەد) لە پیشەکی وەرگیپ و شەرھی (مەموزین) دا بە شیوهزاري سۆرانى، باسى نارپەوابۇنى ئەلەفبای كوردى-لاتينى بۇ كتىبە كلاسيكە كوردىيەكان دەكا و دەلى لەبەر نەبۇنى ھەندىك پىتى عەرەبى لە ئەلەفبای كوردى-لاتينىدا دەبى مروڤ (مەموزين)، (ديوان)اي مەلاي جزىرى و كتىبەكانى دىكەي وەك ئەوان بە ئەلەفبای كوردى-لاتينى نەنۇرسىتەوە و ھەروەھا ئەگەر مروڤ بىاننۇرسىتەوەش دەبى مروڤ ھەندى نىشان بۇ پىتى عەرەبىيەكان پەيدا بکات.

سەرتا ئەوە تەنیا کیشەی ئەلھەبای کوردى - لاتینى نىيە. وەك لە سەرەتەش گوتەم لە ئەلھەبای کوردى - عەربىشدا شەش پىتى عەربى نىنە و ھەزار مۇكريانى بۇ راستنۇوسىنى (مەمۇزىن) ئەو شەش پىتەيى بەكارھىنماون. بە پىتە ترانسکرېپسىۋەنە كان ئىمە دەتوانىن لە ئەلھەبای کوردى - لاتىنيدا کیشەي پىتە عەربىيە كان چارەسەر بکەين، بەلام لە ئەلھەبای کوردى - عەربىدا مەرۆڤ ھىچ كات ناتوانى كىشەي قەكىت چارەسەر بکات و لەبەر ئەوە مومكىن نىيە، بە بەكارھىنمانى ئەو شەش




پیته عهربییهش، مرۆڤ بتوانی (مهموzin) به ئەلfebای کوردى-عهربى راست  
بنووسیتەوه.

لەوانھى لەبەر دەستى ئىمەدان ئەلfebای کوردى- لاتىنى ئەلfebای ھەرە دروست  
و تەواوه بۆ زمانى کوردى. بەلام لەبەر ئەوهى لە (مهموzin) دا زۆر وشهى عهربى  
بەكارھىندرارون و ئەو وشانە پیویستە بەپىي فۆنھتىك و دەنگئانى زمانى عهربى  
بنووسىرین، ئەوکاتىش پیویستىمان بە ھەندىك پیتى عهربىش ھەيە و ئىمە دەتوانىن ئەو  
پىتانە بە پیته لاتىنييە ترانسکرېپسىۋە كان بنووسىن. پیته ترانسکرېپسىۋە كانىش بە  
دانانى ھەندىك نىشانە لە ژىرەوهى ھەندىك پیتى لاتىنى ئاسايى چى دەن.

ئىنجا ئەگەر ئىمە (مهموzin) بە ئەلfebای کوردى- لاتىنى و بەھاواکارى ئەو  
پیته ترانسکرېپسىۋە نانە بنووسىن، ئەو كات ھەم دەتوانىن ھەموو دەنگەكانى ئەلfebای  
کوردى و ھەموو دەنگەكانى ئەلfebای عهربى راست بنووسىن و ھەمېش دەتوانىن  
ۋەكىتى راست بەكارىننۇن و دەستەوازە راستەكان لەيەك جىا يان پىكەوه بنووسىن.  
لىردا ئامانجى من ئەوه نىيە كە ئىمە ھەندىك پیتى نوى لە ئەلfebای کوردىيى  
لاتىنى زىاد بىكەين و بىكەينە ستانداردىك. ئەز ئەو بەكارھىننانە تەنبا بۆ راستىرىدەوهى  
كلاسيكە کوردىيەكان بە پیویست دەزانم.

ستۆكھۆلم 15ى گولانى 2007



عارف زىرەقان